AERODROME, n. : balafirgeh.
AERODYNAMICS, n. : (zanîna) dinamîka bayî, aerodînamîk.
AEROGRAM(ME), n. : nameya hewayî.
AEROGRAPHY, n. = METEOROLOGY.
AEROLITE DR AEROLITH, n. : nêzeya esmanî.
AEROLOGY, n. = METEOROLOGY. **AEROMECHANIC, n., adj.** : pîspor yan endazyarê firînê, mekanîka bayî.
AEROMECHANICS, n. : mekanîka bayî, ba hevsengî yan livînzani, aeromekanîk.
AEROMEDECINE, n. : pijîşkiya firînê.
AERDMETER, n. : bapîv.
AERONAUT, n. : firînzani.
AERONAUTIC(AL), adj. : firînî.
AERONAUTICS, n. : firînzani, aeromekanîk.
AERONEURDSIS, n. : hêrîsa esmanî.
AEROPLANE, n. : balafir, firoke.
AEROSOL, n. : toza esmanî, dûkêl, mij.
AEROSPACE, n. : valatiya li dor erdî, aerosfer.
AEROSPHERE, n. : bayê li dor erdê. **AERO-TAT, n.** : keştiya bayî.
AEROSTATICS, n. : zanîna hevsengiya ba û gazên dî, azrostatîk.
AERY, adj., n. = AERIE = AERIAL. **AESCULAPIAN, adj., n.** : pijîşkî, pijîşk. **AESTHETE, n.** : ciwanîxwaz, ciwanînas. **AESTHETIC(AI), adj.** : ci.wanxwaz, ci.wanperist. **AESTHETICISM, n.** : ciwanîtî, huner û mûzîqe û helbest peristin, ciwanîzani, estetîzm.
AESTHETICS, n. : ciwanîzani (zanîna ciwanîyê), estetîk.
AESTHO-PHYSIOLOGY, n. : hişzanî.

AESTIVAL, *adj.* : havînî.
 AESTIVATE, *vi.* : havîn borandin. AESTIVATION,
n. : havîn borandin, şitil çan-
 din, rêzika belgan di nav bişkujê de.
 AETIOLOGY, *n.* : nexweşîzanî, nesaxîzanî.
 AFAR, *adv.* : ji dor (ve).
 AFFABILITY, *n.* : sernermî, nermî.
 AFFABLE, *adj.* : nerm, sernerm, nazik.
 AFFABLENESS, *n.* : sernerm, nerm, nazik.
 AFFABLY, *adj.* : bi nermî, nermekî. AFFAIR(S),
n. : kar, pîrs, kar û bar. AFFAIRE DE CCIUR :
 evînkarî.
 AFFECT, *vt.* : kar têkirin, livandin, êrîş kirin,
 diyar kirin, helbijartin, hiş livandin.
 AFFECT, *n.* : hiş, viyan, sozyarî.
 AFFECTABILITY, *n.* : karîgerbarî.
 AFFECTABLE, *adj.* : karîbar.
 AFFECTATION, *n.* : diyarkirin.
 AFFECTED, *adj.* : karîger,
 - WITH FEVER : ta wî.
 AFFECTING, *adj.* : karîger.
 AFFECTINGLY, *adv.* : bi karîgerî, karîgerkî.
 AFFECTION, *n.* : hiş, delalî, dilovanî, hest,
 kartêkirin, evînî, wijdan, nesaxî, nişan.
 AFFECTIONAL, *adj.* : dilovanî. AFFECTIONATE,
adj. : evîndar, cergsoz,
 sozmend, dilovan, mihirvan.
 AFFECTIONLESS, *adj.* : bê dilovanî. AFFECTIVE,
adj. : hişî, sozyar, karîger. AFFERENT, *adj.* :
 guhêz (bo nîveka demari). AFFIANCE, *n.* :
 bawerî, dilsozî, dezgîran,
 dezgîrî.
 AFFIANCE, *vt.* : dezgîr kirin, keçek xwastin.
 AFFIANCED, *adj.* : dezgîrkirî.

AFFIANT, *n.* : gewah (sondxwarî). AFFIDAVIT,
n. : gotina nivîsî, sond xwarî (bo dadgehê).
 AFFILIATE, *vt.i.* : bûn endam, gehîştin
 civatekê yan partiyekê.
 AFFILIATED, *adj.* : endarnbûyî, AFFILIATING,
n. : endambûn, balvedan. AFFINED, *adj.* :
 pêwend.
 AFFINITY, *n.* : pêwendî, hogirî, tebayi,
 gordan, xwazî.
 AFFIRM, *vt.* : diyar kirin, selmandin, eşkera
 kirin, dupat kirin.
 AFFIRMABLE, *adj.* : selmênbar. AFFIRMATION, *n.* :
 diyarkirin, selmandin,
 piştgîrî, eşkerakirin.
 AFFIRMATIVE, *adj.* : erêyî.
 AFFIRMATIVELY, *adv.* : bi erêyi, erêki.
 AFFIX, *vt.* : pêve girtin.
 AFFIX, *n.* : zêdekirin, gîrek.
 AFFIXED, *adj.* : nûskandî.
 AFFIXING, *n.* : nûskandin.
 AFFIXTURE, *n.* : pêvegirtin.
 AFFLATUS, *adj.* : sirûş.
 AFFLICT, *vt.* : derd girtin.
 AFFLICTED, *adj.* : derd girtî, belengaz, dil-
 kovan, malkambax, bar ketî,
 dilşewatkirî, derd mend, şewitî.
 AFFLICTION, *n.* : peta, hicran, derd, perjeng,
 gird av, so, azarî, rencîn, xidok, dilşewatî.
 AFFLICTIVE, *adj.* : derdî.
 AFFLUENCE, *n.* : reha, dewlemendî, bex-
 tiyarî, dewlet.
 AFFLUENT, *adj.* : dewlemend, destfireh.
 AFFLUENT, *n.* : celal, çem, zê.
 AFFLUENTLY, *adv.* : bi dewlemendî, dewle-
 mendkî.

AFFLUX, *n.* : rewani bo xalkekê.
 AFFORD, *vt.* : dişêr bikirit yan bikit.
 AFFORDABLE, *adj.* : kirinbar.
 AFFOREST, *vt.* : daristan kirin.
 AFFORESTATION, *n.* : daristan kirin.
 AFFRANCHISE, *vt.* : serbest kirin, rizgar kirin, aza kirin, " ji bendewariyê ..
 AFFRAY, *n.* : qerqeşe, lêketin.
 AFFREIGHTMENT, *n.* : girtina keştî bo barî.
 AFFRIGHT, *n.* : tirs, bizdihin.
 AFFRIGHT, *vi.* : tirsandin, bizdihandin.
 AFFRONT, *n.* : kirêtkirin, riswakirin.
 AFFRONT, *nt.* : kirêt kirin.
 AFFUSION, *n.* : riştin.
 AFGHAN, *i.* : welatî û zimanê Afxanistanê.
 AFIELD, *adu.* : li zeviyê.
 AFFIRE, *adj., adv.* : sotî, gurigirtî.
 AFLAME, *adj., adv.* : gurî, agirgirtî, dagîr-saw.
 AFLOAT, *adj., adv.* : serav.
 AFFLUNER, *adj.* : firî, arhayî.
 AFOOT, *adv.* : "-li serpêyî.
 AFORE, *adv., prep., conj.* : li berahiyê, berî.
 AFORE-, *pref.* : pêşgir e ko berî yan bera-hî ye.
 AFOREMENTIONED, *adj.* : berê navbirî.
 AFORESAID, *adj.* : berî navkirî yan gotî.
 AFORE THOUGHT, *adj.* : pîlankirî, qestî.
 AFORE TIME, *adv., adj.* : berê.
 A FORTIORI, *i.* : çêtir e ko.
 AFR(O)-, *pref.* : pêşgir e ko Efrîqa ye. AFRAID, *adj.* : tirsayî, hejivandî, tirsinok, bizdihî.
 AFREET, *n.* : dêw.
 AFRESH, *adj.* : ji nû ve.

AFRICA, *n.* : Efrîqa.
 AFRICAN, *adj.* : Efrîqayî, welatîyê Efrîqa.
 - RUE : espender.
 AFRICA(A)N, *n.* : welatîyê Efrîqaya başûr.
 AFRICANIST, *n.* : efrîqazan.
 AFRIKANER, *n.* : Ewropiyê Başûra Efrîqa.
 AFRO-AMERICAN, *n.* : Emerîkanê ji Efrîqayî, reş.
 AFT, *adv.* : di nav yan pêşiya keştî de.
 AFTER, *adv., adj., prep.* : piştî, paşî, paş, pişt, şûnde, piştire, hîngê.
 - ALL" : axir.
 - HE WAS NAMED •• HIS FATHER : bi navê babê navkirî.
 - TO TAKE" : wekî (babê, dayê).
 AFTERBIRTH, *n.* : biçûk, heval, pizdan.
 AFTERBRAIN, *n.* = METENCEPHALON. AFTER-CARE, *n.* : sexbîrî yan guhdana piştî çarekirinê.
 AFTER CLAP, *n.* : paşqewmîn.
 AFTER DAMP, *n.* : paş gaza jehrî.
 AFTEREFFECT, *n.* : encam, dawî, akam, dûmalû.
 AFTERGLow, *n.* : geşatî li rojavayê (piştî avabûna rojê).
 AFTER-GRASS : giyayê şîn dibit piştî birrinê.
 AFTER-IMAGE, *n.* : paşwêne ..
 AFTERLIFE, *n.* : jiyana piştî mirinê, dawî, pîrîtî,
 AFTERMATH, *n.* : dawî, dû ma lû, akam, encam, paş.
 AFTERMOST, *adj.* : nêziktirê pêşiyê.
 AFTERNOON, *n., adj.* : nîvrokî, êvar, piştîrûvro. AFTERPAINS, *n. pl.* : jana paş biçûkbûnê. AFTERPART, *n.* : paşparçe.
 AFTERPIECE, *n.* : tiraneya piştî şanoyê.

AFTERSHAVE, *n.* : paştıraşîn : gulav.
 AFTERTASTE, *n.* : paştam yan çêjtinê.
 AFTERTHOUGHT, *n.* : hizra piştî karî.
 AFTERTIME, *n.* : paşroj.
 AFTERWARO(S), *adv.* : paşî.
 AFTERWORLO, *n.* : paşjiyan, cîhana dî.
 AGA, *n.* : serdar, serok, axa.
 AGAIN, *adv.* : dîsa, dîsan, car dî, carek dî. -
 AND" : gelek caran, car li dûv car.
 - NOW AND" : caran.
 - AS MUCH (MANY) .. : ducar.
 AGAINST, *prep.* : dij, beramber, bo, li ser.
 AGAMA, *n.* kimkimê Efrîqa û Hindistanê.
 AGAMETE, *n.* : xaneyek neregezî berhemdar.

 AGAMI~ ?RA AGAMOUS, *adj.* : bê za û zêyî, bê şokirinî.
 AGAMOGENY, *n.* : zorbûna naregezî bê şokirinî.
 AGAMOGENESIS, *n.* : bergirtina bêregezî yan şokirinî.
 AGAMOUS, *adj.* : bê endamên zayendeyî.
 AGAPANTHUS, *n.* : gulevîn, helezek zebatî.
 AGA'E, *adj., adi.* : devbeş, devvekirî. AGAPE,
n. : evîniya birayetî, ahenga evînî.
 AGAPEMONE, *n.* : warê evîniyê.
 AGAR, *n.* : madeyek cêla tînî ye ji kevza deryayî diînine der.
 AGARIC, *n.* : qarçik.
 AGASTRIC, *adj.* : bê cok.
 AGATE, *n.* : şîlan.
 - LINE : hêl yan zêza agehdarî.
 - WARE : kalota şîianî,
 AGAVE, *n.* : ageyv yê Emerîkanî (kaktus: avdar).

AGE, *n.* : jî, te~en, dem, serdem. rojgar, çax, çerx, sere.
 - OF CONSENT : berbextî, herze.
 - OF REASON : berbextî, herze.
 - OF .. : berbext.
 - OLO : bêqamkevin, rojgarî.
 - TO COME OF .. : berbext bûn, gehiştin.
 - UN DER .. : pispör, ne berbext.
 AGE, *vi.t.* : ' pîr bûn, pîr kirin.
 AGED, *adj.* : pîr, pîrbûyî, navsere. AGELESS,
adj. : nemir, her law, bêpîrî,
 êkcar pîr nebûyî.
 AGELESSLY, *adt.* : bi bêpîrî.
 AGELESSNESS, *n.* : bê pîrî.
 AGELONG, *adj.* ; nemir, jî, rojgar.
 AGENCY, *n.* : pêşkarî, nokerî.
 AGENDA, *n.* : karname.
 AGENOALESS, *adj.* : bê karname.
 AGENOUM, *n.* : agenda.
 AGENT, *n.* : noker, nuwêner, ho hokar kirêgirtî, pêşkar, nimînde/
 - PROVOCATEUR : nokerê arhandinê.
 AGENTIAL, *adj.* : nuwênerî, nokerî. AGERATUM,
n. : giya yek Emerîkanî ye "êcratum".
 AGGLOMERATE, *oi.i.* : kom bûn, kom kirin.
 AGGLOMERATE, *adj.* : kornbûyî, kombûn, topel, baristayî, barist.
 AGGLOMERATED, *adj.* : gomçikbûyî.
 AGGLOMERATING, *n.* : gomçikbûn.
 AGGLOMERATION, *n.* : laperîn, gomçikbûn, kombûn, baristbûn, topel, baristayî.
 AGGLUTINATE, *adj.* : venûsyayî, resandî.
 AGGLUTINATE, *vi.i.* : risikandin venûsan-

gî.

- AGGLUTINATED, *adj.* : nûsikandî, venû-siyayî.
- AGGLUTINATION, *n.* : venûsîn, nûsikandin,
- AGGLUTINATIVE, *adj.* : risikî, risikdar.
- AGGLUTININ, *n.* : risikîn : madeyek risikî ye.
- AGGRADATION, *n.* : rastkirina TÛyê zemî-nê.
- AGGRANDIZE, *vt.* : mezin kirin.
- AGGRANDIZED, *adj.* : mezin kirî.
- AGGRANDIZING, *n.* : mezin kirin.
- AGGRAVATE, *vt.* : dijar kirin.
- AGGRAVATED, *adj.* : dijar kirî.
- AGGRAVATING CIRCUMSTANCES, *n.* : mercên dijar kirina sizayî.
- A-GRAVATION, *n.* : dijarbûn.
- AGGREGATE, *adj., n.* : yekbûyî, sercem, tamamî.
- AGGREGATE, *vt. i.* : yek kirin, ko kirin, kom kirin.
- AGGREGATEDLY, *adv.* : bi kokirî.
- AGGREGATENESS, *n.* : kokirîfî.
- AGGREGATION, *n.* : civar.
- AGGRESS, *vi.* : şerf dest pê kirin. AGGRESSION, *n.* : destdirêjî, dijminkarî. AGGRESSIVE, *adj.* : dirr, miqers, dijminkar, şerok, şerker, sert, êrîşker.
- AGGRESSIVENESS, *n.* : destdirejîfî.
- AGGRESSIVITY, *n.* : dijarîfî. AGGRESSOR, *n.* : dijminkar, destdirêj. AGGRIEVE, *vt.* : xemdar bûn, qehirîn. AGGRIEVED, *adj.* : xemdarkirî. AGGRIEVEDLY, *adv.* : bi xemdarî. AGGRIEVEMENT, *n.* : xemdarîfî.
- AGGRIEVING, *n.* : xemdarkirin.
- AGHAST, *adj.* : bizdihî, sehmgirtî.
- AGILE, *adj.* : çalak, çeleng.
- AGILELY, *adv.* : bi çalakî.
- AGILITY, *n.* : çalakîfî.
- AGING, (*pres. part of age*) : pîrbûn.
- AGIO, *n.* : sediya pêk guhartina pare yan diravî.
- AGIOTAGE, *n.* : bazarê beşên darayî, karê diravgehî.
- AGIST, *n.* : birina terşî bo alikê.
- AGITATE, *vt. i.* : leqandin, livandin, hejandin, han dan, har kirin, arand in.
- AGITATED, *adj.* : leqandî, arandî, har, quto, girgîn, rûzer, hêç, handayî, hejandî, levan dî, peşok.
- AGITATING, *n.* : harkirin, arand in, belqitîn, keyandin, harî tî, harî, helçûn, hêç, şepirzeyî.
- AGITATION, *n.* : leqandin, hejandin, livandin, cefa, handana giştî.
- AGITATIVE, *adj.* : arand ar.
- AGITATOR, *n.* : livok, bizavker, harker, hander. keyandek.
- AGLEAM, *adj.* : çirisî, teyisî.
- AGLET, *n.* : metalê ciwan yê li ser kirasî.
- AGLITTER, *ndj.* : çirisî, teyisî,
- AGLOW, *adj.* : geş.
- AGLOSSA, *n.* : bêziman.
- AGNAI, *n.* : kulbûna dor nînokê "çermê dirrhayî li bin rihên nînokê".
- AGNATE, *n., adj.* : nevî, mirovê babî.
- AGNATIC, *adj.* : miroviya ji layê babê ve.
- AGNOMEN, *n.* : naznav.
- AGNOSIA, *n.* : neşiya na naskirinê. AGNOSTIC, *adj.* : kesnezanî, nezanimkar, nezanimkar, agnostîk.
- AGNOSTICISM, *n.* : nezanimkarî.
- AGO, *adv., adj.* : berî, berê, pêş.

AGOG, *adj.*, *adv.* :hîvîdar, gerok.
 AGONIA, *n.* : bermirinê, kêferata mirinê.
 AGONIC, *adj.* : negoşekî, neladayî serye-
 kî, rêza neladana magnetîzî.
 - LINE : hêl yan rêza seryekî.
 AGONIST, *n.* : beşdarê kêşeyê yan xebatê,
 bizavker.
 AGONISTIC, *adj.* : tingijî, kêşe yan berhev-
 danxwaz, pêşbirkeyî (werzişî).
 AGONISTICALLY, *adv.* :bi berhevdanî. AGONIZE,
vt.i. : nalîn, êşîn, hizra sext
 kirin.
 AGONIZED, *adj.* : nalî, êşayi.
 AGONIZING, *n.* : nalîn.
 AGONIZINGLY, *adv.* :bi nalînî, nalînkî. AGONY,
n. : eşkence, êş, azar, jan, nal,
 kefteleft, hêç, arhan, derdmendî.
 - OF COLUMN : karî teyê agedariyên kesî (di
 nav rojnameyê de).
 - OF DEATH : kêferata mirinê, xemûr, AGORA,
n. : meydana giştiya bajêrê grekî (yonanî).
 AGORAPHOBIA, *n.* : tîrsa derên giştî. AGOUTI,
n. : agûtî : canewerek Emerîkanî kirinde,
 mû û guh kurt, wekî dî wek kêvrûşkê ye.
 AGRAF(F)E, *n.* : sinceqek xemlandina cilan.
 AGRARIAN, *adj.* : çandinî, kiştî,
 AGRARIAN REFORM, *n.* : kiştîsazî, başkirina
 çandinê, zevîsazî.
 AGRARIANISM, *n.* : tevgera çakirina çandi-
 nê yan kiştûkalî.
 AGREE, *vt.i.* : pêk hatin, qayil bûn.
 AGREEABILITY, *n.* : pesendbarî.
 AGREEABLE, *adj.* : pesendbar, xweşmirov,
 sazkar, bi cih.
 AGREEABLY, *adv.* :bi sazkarî.

AGREED, *adj.* : pêkhatî, pesenkirî.
 AGREEING, *n.* : pêkhatin.
 AGREEMENT, *n.* : pêkhatin, hevhatin,
 guzîdan, rêketin, qîm, tebayî.
 - VIOLATOR : pêkhatinşikên.
 AGRESTIC, *adj.* : zivir, gundî, nevemiştî.
 AGRIBUSINESS, *n.* : çandîkar, AGRICULTURAL,
adj. : kiştûkalî, çandinî,
 çandinzanî.
 - COOPERATIVE : herewezî yan zibareyên
 çandinê.
 AGRICULTURALLY, *adv.* :bi çandinî.
 AGRICULTURE, *n.* : çandin, kiştûkal,
 AGRICULTURIST OR AGRICULTURALIST, *n.*
 çandinzan, çandiyar.
 AGRIMONY, *n.* : şîna tî, nexasme gul.
 AGRIMOTOR, *n.* : bizwêna çandinê, makî-
 neya çandinê.
 AGRIOLOGY, *n.* ; xwendina gelên seretayî.
 AGROINDUSTRIAL, *adj.* : çandin pîşesazî.
 AGROLOGY, *n.* ax çandinzanî. AGRONOMIST, *n.*
 : çandinzan, endazyarê
 çandinê, pisporê çandina gundî.
 AGRONOMY, *n.* : çandinzanî, zanîna çandinê,
 endaziyariya çandinê.
 AGROUND, *adj.*, *adv.* :li ser erdê, bi erdê ketî.
 - THE SHIP RAN ** : gemî wergera ser erdê.
 AGUE, *n.* : lertz, ta (li gel sarê, germê û
 xuhdanê).
 AGUISH, *adj.* : tayî.
 AH, *interj.* : nîşan yan derbirrîna şadî,
 pêşmanî, kotî yan xemê.
 A.H., *abbr.* After Hegira or Hijira : sala
 koçî,
 A.H., *abbr.* : amper-hour : amperdemjimêr.

AHA, *interj.* : nîşan yan derbirrîna tira-neyê, serketinê yan guhişînê.

AHEAD, *adv.* .li berahiyê.

AHRIMAN, *n.* : Xudayê bediyê.

AHURA MAZDA, *n.* : Xudayê pendiyar, Bona Bala : Xudayê qenciyê û ronahiyê zerdeştî.

AID, *vt.i.* : harî kirin, yarmetî dan.

AIO, *n.* : harîkarî, harîkirin, fîrya, fîrya-guzarî, yarmetî, hawar, komek, pîtak, fîryager, hevarî, yaridedan.
- AP.ST": harîkariya berahî, fuyay berayî.

AIDE, *n.* : yawer, hariker, hevpişt. AIDE-DE-CAMP (A.D.C.), *n.* : yawer. AIDE-MEMOIRE, *n.* : bîrname, yadname. AIGRETTE, *n.* : çek yan xişilê serî (ji per yan gewherî çêkirî).

AIGUILLE, *n.* : qulker yan simtokê kevî, kevrê ser tîj.

AIL, *vt.i.* ; nexweş bûn, nesax bûn.

AILANTHUS, *n.* : darê esmanî : darek devera yeksanekeî (nîv qad birrî),

AILERON, *n.* : çengik : parçeyek livek ji çengê balafirê bo hevsengiyê.

AILING, *n.* : nes ax, nexweş.

AILMENT, *n.* : nesaxî, nexweşî.

AILUROPHILE, *n.* : hezkerê kitikan.

AILUROPHOBE, *n.* : nehezê kitikan.

AIM, *vt.i.* : stêrk girtin, armanc kirin. AIM, *n.* : armanc, kam, merem, daxwaz, serdil, mebest, amanc.

AIMED, *adj.* : raçavkirî.

AIMING, *n.* : raçavkirin, armanckirin, stêrkgirtin.

AIMLESS, *adj.* : bê armanc, gevc, mehbiran, bê amanc.

AIMLESSLY, *adv.* .bi bê a (rlmancî, got re, bê armanckî.

AIMLESSNESS, *n.* : bê armancî.

AIR, *vi.* : dan ber bayî, zuha kirin, derbirrîn, nişa xelkê dan.

AIR, *n.* : ba, hewa, keş, vala tî, awaz (radyo û televizyon).
- BASE: binikê bayî yan hewayî.
- BLADDER : mîzdanka bayî, bator.
- BORNE : veguhaztina esmanî.
- BRIDGE : pîrd) a esmanî (balafirî).
- COOLER : ba sark.
- CURRENT : rew teka bayî.
- EXPRESS : veguhaztina esmamiya gurzeyan.
- FORCE : hêza esmanî.
- HOSTESS : mêvandara firokeyê yan balafirê.
- LIFT : hêla azoqekirina esmanî, pira esmanî.
- MAIL: posteya esmanî.
- MASS : baristeyê bayî.

AIR CONDITION, *n.* : baguhêrk, baxoşik, basark.

AIR CONDITIONER, *n.* : basark, baguhêr. AIR CONDITIONING, *n.* : basarkirin, baguhartin.

AIRCRAFT, *n.* : balafir, firoke.

AIR CREW, *n.* : balafirvan yan karkerên balafirê.

AIRDROME, *n.* : firgeh.

AIRFIELD, *n.* : firgeh.

AIRFLOW, *n.* : rewteka bayê balafirê.

AIRING, *n.* : bakirin, nîşandan. AIRLESS, *adj.* : bê ba.

AIRLETTER, *n.* : nameya posteya esmanî.

AIRLINE, *n.* : hêla esmanî.

AIRMAN, *n.* : firokeyan, balafirvan.

AIRPLANE, *n.* : firoke, balafir.
 AIR POCKET, *n.* : berîka bayî.
 AIR POST, *n.* = AIR MAIL.
 AIRPORT, *n.* : balafirgeh, firge, firokexane.

 AIRPROOF, *ll.* : babergir, dijba.
 AIR PUMP, *n.* batêker.
 AIR SAC, *n.* : baxane, kisikê bayî, mîzdanka bayî ya masiyê.
 AIRSCREW, *n.* : perwaneya balafirê.
 AIR SHAFT, *n.* : karîteyê bayî (bo bagu-hartinê).
 AIRSHIP, *n.* .. balona bizwênkirî yan mekînekirî.
 AIRSIC, (*n.* : gêjê esmanî (di nav balafirê *de*).
 AIRSPACE, *n.* : mewdayê esmanî (bo dewletekê).
 AIRSPEED, *n.* : leza dînamiya bayî.
 AIR STEWARDESS, *n.* : mêvandara firokeyê.

 AIR STREAM, *n.* = AIR FLOW.
 AIRSTRIP, *n.* : dahatingeha balafiran. AIRTIGHT, *adj.* : babergir. dijba (bê kun). AIR-TO-AIR : ji esmanî bo esmanî (çekrnoşek).
 AIRWAYS, *n.* : hêlên bayî (hewayî), barê.
 AIRWOMAN, *n.* : balafirvan yan firokevan (mê).
 AIRWORTHY, *adj.* : kêrhatî bo firînê.
 AIRY, *adj.* : bayî, hewayî, bilind, li esmanî, berpekirî, aşopî, şad, law, nazik, bakirî, vekirî, qapan.
 AISLE, *n.* : dabeşkirina dêrê, rarew, rêka li navbera kursîkan de.
 AITCH BONE, *n.* : goştê ranê golî (li ser hestî).
 AJAR, *adv., adj.* : piçekê vekirî.

AKIMBO, *adj., adv.* : dest li ser kêlekê.
 AKIN, *adj.* : wek xizim, mirov.
 ALA, *n.* : çeng, bal.
 ALABASTER, *n.* : gêç, mermer.
 ALABASTERINE, *adj.* : mermerî.
 A LA CARTE, *adj., adv.* : xwarina biha bi aman.
 ALACRITY, *n.* : çalakî, lêkdana xweş.
 A LA MODE, *adj.* : modedar, bawdar, baw.
 ALAR, *adj.* : çengî.
 ALARM, *n.* : hejvin, tirs, dêli, agehiya sehmiyê.
 -CLOCK : demjimêra agehkirinê.
 ALARM, *vt.* : agehdar kirin, hişyar kirin.
 ALARMED, *adj.* : hejivandî, hejivî. ALARMING, *n.* : tirsîner, tirsinak, toqandin.
 ALARMISM, *n.* : tirsandinîfî.
 ALARMIST, *n.* : tirsinok.
 ALARY, *adj.* = ALAR.
 ALAS! : wax! way! wey!.
 ALA SPURRA, *n.* : zirçeng, zirbale.
 ALASTOR, *n.* : dêwê tolkar.
 ALATE(D), *adj.* : çengdar. baldar.
 ALB, *n.* : kirasê dirêjê oldaran.
 ALBATA, *n.* : zîvê Elmanî, metalê spî.
 ALBACORE, *n.* : albakor : masiyek deryayî mezm e.
 ALBANIAN, *n.* : albanî : welatîyê Albaniya, arnawût.
 ALBATROSS, *n.* : tuxmek balind e (li deryayê hedar).
 ALBEIT, *conj.* : herçend.
 -I.BESCENT, *adj.* : spîbûyî, ber spî ve. ALB'ON, *n.* : Înglîzstan (helbestî an kevin).

ALBIHE, *n.* : belek, qole.
 ALBITE, *n.* : elbayt : fêldspara soda yan spî.
 ALBUM, *n.* : albûm: deftera înzayan, pol yan wêne, qawin, helbijêrên torî yan mûzîqeyê.
 ALBUMEN, *n.* : spêne, spîlk, spîlkeya hêkê.

 ALBUMIN, *n.* : spîlk.
 ALBUMINOUS OR ALBUMINOSE, *adj.* : spîlkî.
 ALBURNUM, *n.* = SAPWOOD.
 ALCHEMIC(AL), *adj.* : kîmyayiya kevin, sîmya.
 ALCHEMIST, *n.* : kîmyavan, sîmyager.
 ALCHEMIZE, *vt.* : guhorîn (bi kevneki-myayê).
 ALCHEMIZED, *adj.* : guhartî.
 ALCHEMIZING, *n.* : guhartin (bi simyayê).
 ALCHEMY, *n.* : kîmyaya kevin (da ko kanên erzan bikin zêr û jiyê dirêj bikin), sîmya.
 ALCOHOL, *n.* : alkuhol, mey, alkohol.
 ALCOHOLIC, *adj.* : meyvexwar, mest, serxoş, meybeng.
 ALCOHOLISM, *n.* : meybengî, meyvexwarinî.
 ALCOHOLIZE, *vt.* : alkuhol kirin.
 ALCOHOL METER, *n.* : alkuholpiv, meypîv.
 ALCOHOLMETRY, *n.* : alkuholpîvî (pîvana alkuholî).
 AL CORAN, *n.* : Qoran.
 ALCOVE, *n.* : şikeftok.
 ALCYONE, *n.* : neyrê şemedanê.
 ALDEHYDE, *n.* : aldehîd : avekiyek firînî bêreng bêhn xeniqîn e (ji oksîdbûna alkuholî çêdibit).
 ALDER, *n.* : dar (wek belokê), teraşê avxwaz.

ALDERMAN, *n.* : civatvan, cêgirê kevnê şahê inglîzan.
 ALE, *n.* : bîreya sivik.
 - WIFE : xudana bîrexaneyê.
 ALEATORY, *adj.* : li ser bextî yan helketinê (dorandin yan feydekirin).
 ALEE, *n.* : li ser rexê gemiyê (dor ji bayî).
 ALEHOUSE, *n.* : bîrexane.
 ALEMBIC, *n.* : alava kîmyayiya dilopandinê, alambîk.
 ALEGAR, *n.* : bîr eya sivika tîrş.
 ALERT, *vt.* : wurya kirin, hişyar kirin, ageh kirin.
 ALERT, *adj., n.* : haydar, hişyar, çavvekirî, gurc, wurya, lêkdayî,
 - ON THE" : hay ji xwe heye.
 ALERTED, *adj.* : haydarkirî, hişyar kirî, wuryakirî.
 ALERTING, *n.* : hişyarkirin, haydan, wuryakirin.
 ALERTNESS, *n.* : hişyarî, agehî, agehbûn.
 ALEURONE, *n.* : alûron : madeyek dëndikî piro tînî di nav tovê hindek helezan de.
 ALEXIA, *n.* : kûratiya xwendinê.
 ALEXIN, *n.* : bakteryakuj.
 ALFALFA, *n.* : helezek wek sêper yan sêpelê ye (alife),
 ALFA PARTICLE, *n.* : pir tika alfa.
 ALFA RAY : tîşk yan tîrêja alfa.
 ALG(O), *pref.* : pêşgir e ko êş e.
 ALGA, *n.* : kevz, kevzer, qewze.
 ALGEBRA, *n.* : elcebîrzanî, cebîr.
 ALGABRAIC(AL), *adj.* : cebîrî.
 - EQUATION : hevkeşeya cebîrî.
 - EXPRESSION : derbîrîna cebîrî.
 - FUNCTION : hokarê cebîrî.

ALGABRAIST, *n.* : cebîrzan, zanayê cebîrê.
 ALGERIAN, *n., adj.* : welatîyê Cezaîr, cezaîrî.
 - ALGIA, *Suff.* : paşgir e ko êş e, jan e.
 ALGID, *adj.* : sar.
 ALGOID, *adj.* : kevwî.
 ALGOLAGINA, *n.* : xweşiya êşandinê yan êşanê.
 ALGOLOGY, *n.* : zanîna kevwazan. ALGOMETER, *n.* : janpîv (bi hişa jana pestênê).
 ALGOPHOBIA, *n.* ; tîrsa ^{eşê}.
 ALGORISM OR ALGORITY, *n.* : hejmar, algarîzm.
 ALI^l, *pref.* : pêşgir e ko çeng e, bal e.
 ALIAS, *n., adj.* : zirnav, paçnav.
 ALIBI, *n.* : behane yan dirûva bê tawaniyê.
 ALI BI, *vt.* : berdan (bi behaneyê bê tawaniyê).
 ALIEN, *adj., n.* : biyanî.
 ALIENABLE, *adj.* : guhêzbar.
 ALIENATE, *vt.* ; sil kirin, dor êxistin (xudaniya samanî) guhorîn yan guhaztin.
 ALIENATED, *adj.* : enirandî, darkirî.
 ALIENATING, *n.* : enirandin.
 ALIENATION, *adj.* : damalîn, dilhêlan, tarek, dorkirin, guhaztina xudaniya samanî, şaşiya hişê, cudabûn.
 ALIENEE, *n.* : bo guhaztî.
 ALIENIST, *n.* : pijîşkê hişê.
 ALIENOR, *n.* : guhêz : (xudaniya samanî). ALI FORM, *adj.* : wek çengî, şikil çeng yan bal.
 ALIGHT, *vi.* : peya dibe.
 ALIGHT, *adj., adv.* .soti, şewitî, helkirî.

ALIGHTED, *adj.* : peyabûyi, veniştî, lûsyayî.
 ALIGHTING, *n.* : dahiştin, lîsîn, veniştin, peyabûn.
 ALIGN, *vt. i.* : hel kirin, rêz bûn.
 ALIGNED, *ndj.* : reqifandî, alîgir, hevaldar, algir, alîkar, reqif kirî, layengir, lagîr.
 ALIGNING, *n.* ; lagirî, rêzkirin, hevaldarî.
 ALIGNMENT, *n.* ; lagirî, tagirî. ALIGNMENTAL, *adj.* : lagiriyî.
 ALIKE, *adj., adv.* : wek hev, wek yek.
 ALIMENT, *n.* : xorak, xwardemenî.
 ALIMENTARY, *ndj.* : xora kî.
 ALIMENTATION, *n.* : xwarandin.
 ALIMENTATIVE, *adj.* = NUTRITIVE.
 ALIMONY, *n.* : pareyên xudankirinê (pişti berdanê).
 ALIPHATIC, *adj.* : bez dar.
 ALIQUANT, *adj.* : dabeşê ne tamam.
 ALIQUOT, *n.* : dabeşê tamam.
 ALIVE, *adj.* : zindî, zîndewer, zîndar, jîndar, giyandar, rendek, sax, saxesaz, çeleng.
 ALIZARIN, *n.* : boyeyek sor e.
 ALKALI, *n., adj.* : tift, qilê.
 ALKALIMETER, *n.* : qilêpîv, tiftpîv.
 ALKALINE, *adj.* : qilêyî, tif tî.
 ALKALINITY, *n.* : qilêtî, tiftî.
 ALKALANIZATION, *n.* : qilêkirin, tiftkirin.
 ALKALANIZE, *vt.* : qilê kirin.
 ALKANET, *n.* : gewtîz, gozirwan, gûriz. ALL, *adj., adv.* : hemû, hemî, giş, gişk, gişt, tev, tamam, têkda.
 - ALONE : bi tenê, bê harîker.
 - ALONG : herdem, ji.

- AROUND : hemûkî, gişt, têt, şehreza.
 - BUT : nêzîk.
 - CLEAR : nîşana nemana metirsiyê.
 - DAY LONG : hemî rojê.
 - IN - : hemiyê, hertişt
 - - IN - : serhevda.
 - ONE TO ME : yek tiştê bo min.
 - OVER ASI~ : li hemî Asiya.
 - RIGHT : baş e! li gel te me.
 - ABOVE : berî hemiyê, berî her tiştî.
 - AFTER " : piştî hemiyê.
 - AT - : êkcar.
 - FOR " THAT : **li** gel hindê.
 - FOR GOOD AND - : heta heta,
 - IN - : têkra.
 - NOT AT - : êkcar, ser çava.
 - TO BE - OVER : tamam bûn.
 - TO BE - OVER WITH : wêran bûn, li ber mirinêye.
 ALLAH, *n.* : navê Xudayî (bi erebî).
 ALAY, *vt.* : hedar kirin, wêve bûn. ALLAYING, *n.* : hedar kirin, wêvebirin. ALLEGATION, *n.* : dawakarî, gotina bê dirûv.
 ALLEGE, *vt.* : gotin (bê binyat).
 ALLEGIANCE, *n.* : rajêrbûn, dilsozî.
 ALLEGIANT, *adj.* : emekdar, dilsoz.
 ALLEGORIC(AL), *adj.* : xwazekî.
 ALLEGORIZE, *ot.* : xwazeyî derbirîn.
 ALLEGORY, *n.* : xwazeçîroka hêmayê.
 ALEGRETTO, *adj., n.* : lezîn, livîna lezîn (mûzîqe).
 ALLEGRO, *!adj., n.* : leztir, zûtir.
 ALLELUIA, *n.* : Xudamezinkirin.

ALLEMANDE, *n.* : mûzîqe yan semayek Elmanî ye.
 ALLERGEN, *n.* : madeyê hestiyarî yan lênehatinî.
 ALLERGIC, *adj.* : lênehatinî.
 ALLERGY, *n.* : lênehatin.
 ALLEVIATE, *vt.* : wêve bûn, hedar kirin.
 ALLEVIATION, *n.* : hedar kirin, wêve birin.
 ALL-OR-NONE-LAW : qanûna hemî yan ne.
 ALLEY, *n.* : kolank, kuçe.
 ALLEYWAY, *n.* : alûle, kolank.
 ALL FOOL'S DAY, *n.* : roja yekî nîsanê.
 ALL FOURS, *n. pi.* : her çîwar : dest û pêyên mirovî, lingên dewarî.
 ALLHALLOWS, *n.* : cejna hemî pîrozan.
 ALL HEAL, *ll.* : giyayên pijîşkiyên gelêrî.
 ALLIACEOUS, *adj.* : sîrî, pîvazî (wek sîr yan pîvazê).
 ALLIANCE, *n.* : hevalbendî, peyman. ALLIED, *adj.* : hevalbend, hevpeymankirî.
 ALLIGATOR, *it.* : tîmsahê Emerîkanî, kevlê vî tîmsahî.
 ALLITERATE, *vt.i.* : peyivên bi heman tîpan dest pê dikin bi kar hînan.
 ALLITERATION, *n.* : bikarînana peyivên bi heman tîpan dest pê dikin.
 ALLOCATE, *vt.* : dabeş kirin, danan, behir kirin.
 ALLOCATION, *n.* : behir, danan, dabeş kirin.
 ALLOCUTION, *n.* : gotara mîrî.
 ALLOGAMOUS, *adj.* : pêwendidarê peyînkirina têkil.
 ALLOGAMY, *n.* : peyînkirina têkil. ALLOMERIC GROWTH, *n.* : werara binyatguhor.
 ALLOMERISM, *n.* : guhorînbariya binyata kîmyayî bê guhorîna şiklê tovî.

ALLOMORPHISM, *n.* = ALLOTROPY.

ALLOT, *vt.* : dabeş kirin, belav kirin.

ALLOTMENT, *n.* : dabeşkirin, behir.

ALLOTROPE, *n.* : şikllê guhorîna leş taybexuyan bê guhorîna madeyî.

ALLOTROPIC, *adj.* : pêwendîdarê şiklê guhorînê.

ALLOTROPY, *n.* : guhorîna taybexuyên leşî bê guhorîna madeyî.

ALLOTEE, *n.* : xudanbehir, bo dabeşkirî.

ALLOUT, *adj.* : hemûkî.

ALLOVER, *adj., n.* : li ser hemû mYl, hemûkî, tevnê li ser hemû ruyî çapkirî.

ALLOW, *vt.i.* : helin, rê dan, destûr dan.

ALLOWABLE, *adj.* :rewa.

ALLOWANCE, *n.* : dermale, rêdan, hêlan, hiştin.

ALLOY, *n.* : darişte, metalên têkil.

ALLOY, *vt.* : (METALAN) têkil kirin.

ALL RIGHT, *adv., adj.* : baş e, gelekî baş e.

ALL-ROUND = ALL ARCUND.

ALL SAINTS' DAY : cejna hemî pîrozan (yekî çiriya duwem).

ALLSEED, *n.* ; tovdar : helezek têrtove.

ALLSET, *adj.* : lêkdayî, amade.

ALL SOULS'S DAY : cejna giyanên miriyan.

ALLSPICE, *n.* : bîbera şîrîn.

ALL THEISM, *n.* : peristina gêrexudayan.

ALLUDE, *vi.* : nîşan kirin.

ALLURE, *vt.* : qayil kirin (fêtkarî), fêt kirin.

ALLURIEMENT, *n.* : fêtkarî.

ALLURING, *n., adj.* : fêtkirin, daylav.

ALLUSION, *n.* : nîşan, serinc. ALLUSIVE, *adj.* : nîşankirî.

ALLUVIAL, *adj., n.* : sêlax, sêlak, sonik, tilol, nîşteyî, lîm.

ALLUVION, *n.* : lîm, lîte, avrabûn, leyî.

ALLUVIUM, *n.* : lite, lim, tilol, sonik, sêlax, sêlak.

ALLY, *vt.i.* : yek girtin, hevalbend bûn.

ALLY, *n.* : peymanker, heval, dost, hevalbend, hevpeyman, hevsond, sondxwarî.

ALLYING, *n.* : hevpeymankirin.

ALMANAC, *n.* : salname.

ALMIGHTY, *n., adj.* : xuda, xudê, êkcar hêzdar.

ALMOND, *n.* : bahîv, behîv, badem.

- EYED : çavbahîv.

ALMONER, *n.* : erkdarê belavkirina xêran.

ALMOST, *at/v.* ; hema, nêzîk.

ALMS, *n.* ; xêr.

ALMSGIVER, *adj.* : xêr kar.

ALMSGIVING, *n.* : xêrdarî.

ALMSHOUSE, *n.* : mala xêran, pena geh, penaxane.

ALMSMAN, *n.* : hejarê li ser xêran dijît.

ALOE, *n.* ; elo : helezek şîrêztal e dibêjin ko dermane bo zikçûnê.

ALOFT, *adv.* : bilind, bala.

ALOHA, *interj.* : gaziya xêrhatinê yan oxirê.

ALOIN, *n.* : elowîn : dermanê zikçûnê ji heleza „elo „derdikêvit.

ALONE, *adj., adv.* : tenê, tenya, tek, bêkes, yekta, tinê.

ALONG, *prep.* : bi dirêjayî.

ALONGSHORE, *adv.* : nik beravê.

ALONGSIDE, *adv.* ; di ber re.

ALODF, *adj.* : cuda, veder.

ALOPECIA, *n.* : keçelî.

ALORY MUSCLES, *n.* . ' zeblekên çengdar, masûlkeyên baldar.

ALLOUD, *adv.* . ' bilindikî.

ALOW, *adv.* = BELOW.

ALP, *n.* . ' çiyayêk Alp, gopîtka çiyayî, benar. ALPACA, *n.* . ' alpaka : canewerek başûra Emerîka, lamayê hirî dirêj û nerm.

ALPEGLOW, *n.* . ' rivina ber sorî ve ko li serê çiyayan diyar dibe demê derketin û avabûna rojê.

ALP(EN) HORN, *n.* : borîzan yan totîka şivanên çiyayê Alpê.

ALPEN STOCK, *n.* . ' darî Alpê (serek tîje bo serketina çiyayî).

ALPESTRINE, *adj.* : alpi (ji çiyayê Alpi).

ALPH : elfit: *ra A n.*

ALPHA, *n.* . alfa : tîpa grekî *ra A n.* destpêk, stêra serekî yan geştira komêk stêran.

- DECAY : alfaneman.

- EMITTER : alfaderperên.

- PARTICLE : pirtika alfa.

- RAYS : rîşk yan tîrêjên alfa.

- SOURCE : jêdera alfa.

- AND OMEGA : destpêk û dûmahî.

ALPHABET, *n.* : elfabe.

ALPHABETIC(AL), *adj.* : elfabeyî.

ALPHABETICALLY, *adv.* : bi elfabeyî, elfabekî.

ALPHABETIZATION, *n.* . ' elfabekirin.

ALPHABETIZE, *vt.* : elfabe kirin.

ALPHA IRON, *n.* : asinê alfa (germî ji 910° ne pitire).

ALPINE, *adj.*, *n.* : alpî {ji çiyayê Alpê}; bilind.

ALPINISM, *n.* . ' serketina çiyayî (nexasme çiyayê Alpê).

ALPINIST, *n.* . ' serketiyê çiyayî (nemaze çiyayê Alpê).

ALREADY, *adv.* . ' hêşnoke, êdî, pêşan, diha, daha.

ALSATIAN, *adj.*, *n.* . Alsazî (ji Alsazê, ostana Fransî).

ALRIGHT = ALLRIGHT.

ALSO, *adv.* . dîsatn), jî, li ser re, herwesa, herweha.

- RAN : ew jî bezî (ser neke tî, hema bo navî).

ALT, *n.* : awaza bilind.

ALTAIC, *adj.* : Altayî : ji çiyayê Altayê Asiya navîn yan xêzana zimanên vê deverê.

ALTAIR, *n.* : heloyê firinde.

AL TAR, *n.* . ' qorbangeh.

ALTERPIECE, *n.* . ' neqşê li ser Û pišta qorbangeha dêrê.

ALTAZIMUTH, *n.* : bilindpîv. ALTER,

vt.i. . ' guhorîn. ALTERABILITY, *n.* :

guhorbartî). ALTERABLE, *adj.* :

guhorbar.

ALTERABLY, *adv.* : bi guhorbarî, guhorbarrekî.

ALTERATION, *n.* . ' guhartin, guhoran.

ALTERATIVE, *adj.* : guhork, guhêr. ALTERCATE,

vi. : serkêşî kirin, şerî kirin. ALTERCATION, *n.*

. ' serkêşîkirin, gelc. ALTERED, *adj.* :

guhartî.

ALTER EGO, *n.* : kesiya diya mirovî.

ALTERER, *n.* : guhorker.

ALTERING, *n.* : guhartin.

ALTERNANT, *n.*, *adj.* : nobetî.

ALTERNATE, *n.*, *adj.*, *vt.i.* : nobetî kirin, yedek, hevgel.

ALTERNATED, *adj.* : noiekîkirî.

ALTERNATELY, *adv.* : bi norekî.

ALTERNATING, *adj.* ; norekî.
 ALTERNATION, *n.* : nobetdarî, guhartin, hevgelî.
 ALTERNATIVE, *adj., n.* : hevgel, şûnî, guharto.
 ALTERNATOR, *n.* : guhêrk.
 ALTHORN, *n.* : alavek mûzîqeyî wek borî-zanê.
 ALTHOUGH, *conj.* : herçend.
 ALTIMETER, *n.* : bilindîpîv.
 ALTIMETERV, *n.* : bilindîpîvî.
 ALTITUDE, *n.* : berzayî, berzî, bilindî. ALTO, *n., adj.* : dengê bilind tirê nêr.
 ALTOCUMULUS, *n.* : ewrê gogî yê ber spî ve.
 ALTOGETHER, *adv.* : têkra, berhev, hemî. AL TO RELIEVE, *n.* : neqşê berz. ALTOSTRATUS, ewrê tarî.
 AL TRUISM, *n.* : qencîtî, hezkirin ji mirovên dî.
 ALTRUIST, *adj.* ; qencîxwaz.
 ALTRUISTIC, *adj.* : pêwendîdarê qencîxwazî.
 ALUM, *n.* : şeb.
 - SOLUTION : zax, gîrava zaxî.
 ALUMINA, *n.* : alumîna ; oksîdê alumînyom.
 ALUMINATE, *n.* : alumînêt.
 ALUMINIFEROUS, *adj.* ; aluminyomî ; aluminyom têdaye.
 ALUMINIUM, *n.* : aluminum (kane). ALUMINIZE, *vi.* : aluminyom kirin, bi aluminyomî çare kirin.
 ALUMINOUS, *adj.* : zaxî,
 ALUMINIUM, *n.* : aluminyom, metalek spî ye.
 - BRONZE, *n.* : dariştaya mis û aluminyomî.

ALUMNA, *n.* : derketiya zanistgeh yan zankoyê.
 ALUMNUS, *n.* : derketiyê zanistgeh yan zankoyê.
 ALUMROOT, *n.* : rihzax, texlîtek helez e.
 ALUNITE, *n.* : alûnît ; şeba xav.
 ALVEOLAR, *adj.* : wek xaneyâ hingvînî.
 ALVEOLATE, *adj.* : kunkî : wek xaneyâ hingvînî.
 ALVELUS, *n.* : kunik, xaneka pişa bayî.
 ALVEOLUS, *n.* : kunka didanî.
 ALWAYS, *adv.* : her, herdem, hergav, hercar, hemî, caran, hemîşe, tim.
 ALYSSUM, *n.* : gula alîsom.
 AM, *v.* : dibim.
 A.M. (ante meridiem) : berî nîvro.
 AMADOU, *n.* : pîşê beristeyî.
 AMA, *n., adv.* : bi xurtî, bi pele, bi lez, bêqam, ji nişkî.
 AMALGAM, *n.* : têkiliya metalekê wek zêrî li gel cîweyî.
 AMALGAMATE, *adj.* : têkilbûyî, yekbûyî,
 AMALGAMATE, *V.t.i.* : têkil kirin, yek kirin.
 AMALGAMATED, *adj.* : yekbûyî.
 AMALGAMATING, *n.* : yekkirin. AMALGAMATION, *n.* : têkilkirin, yekxistin, yekitî, yekgirtin.
 AMALGAMATOR, *n.* : têkilker.
 AMANITA, *n.* : amanîta ; texlîtek kivareka jehrî ye.
 AMANUENSIS, *n.* : veketin, nivîs, razgir, rûnivîser.
 AMARANTH, *n.* : hele za aşopa bêqurmiçîn, rengê qerenfeliyê ber erxiwanî ve, marîgold, mexmork, gulzêrîn.
 AMARANTHINE, *adj.* : mexmorî, gulzêrînî, marîgoldî.

AMARELLE, n. : hermiya gêlasî.
AMARYLLIS, n. : texlîtek nêrgiz e.
AMASS, vi. : kom kirin.
AMASSED, adj. : komkirî, qerpoL
AMATEUR, n. : xulya, xwaza. **AMATEURISH, adj.** : neşehreza, nepispor. **AMATIVE, adj.** : evînbaz.
AMATIVENESS, n. : evînbazîtî, fêtkarîtî, regez xwazîtî.
AMATOL, n. : ama tol : madeyek teqemenî.
AMATORY, adj. : evînbazî.
AMAUROSIS, n. : koreyî (parçekî yan hemûkî).
AMAZE, vt. : guhişandin.
AMAZED, adj. : guhişî, guhişandî, ecêbgirtî, ecêbmayî.
AMAZEMENT, n. : guhişîn, sersorman, heyholan.
AMAZING, n. : bizdihin, sersorin, gêre, seyr.
AMAZONIAN, adj. : jina şerkerê efsaneyî, jina xurta dirêja zelamî.
AMBASSADOR, n. : balyoz, êlçî.
AMBASSADORIAL, adj. : balyozî.
AMBASSADRESS, n. : balyoz (jin).
AMBER, n. : kehreman, rengê kehremanî (zerê- ber sorî ve), kehremanî (madeyê berdîneyê zerê ron).
AMBERGRIS, n. : ember : madeyê morniyê xavê serayê derya yê yeksanekerî.
AMBIDEXTER, adj. : durû, rûbaz, dudedestî (çep û rast).
AMBIDEXTERITY, n. : durû yî, rûbazî, dudedestî.
AMBIENCE, n. : ba, avûba, jîngeh, dorûber.
AMBIENT, adj. : pêwendîdarê dor û beran.
AMBIGUITY, n. : derbirrîna duwateyî yan şêlî.

AMBIGUOUS, adj. : lêl, şêlî, aloz, duwateyî, gong.
AMBIGUOUSLY, adv. : bi du wateyî, bi lêlî, şêliyeki.
AMBIGUOUSNESS, n. : duwateyîtî, lêlêtî.
AMBISEXUAL, adj. : du regez.
AMBISEXUALITY, n. : duregezîtî.
AMBIT, n. : dir, mewd.
AMBITION, n. : berzîxwazî, têkorkî, bilindbînî.
AMBITIONLESS, adj. : bê berzîxwazî.
AMBITIOUS, adj. : berzîxwaz, ezwer, az, azwer, bilindbîn, têkork.
AMBITIOUSLY, adv. : bi berzîxwazî, berzîxwazkî.
AMBIVALENCE, n. : dubehavi, nakokî, hev-dijî.
AMBIVALENT, adj. : du heha, hevdij, nakok.
AMBIVERSION, n. : hevheziya cudaxwazî û civakxwazî.
AMBIVERT, n. : hevta van hevheza cudaxwaz û civakxwai.
AMBLE, vt. : çargav kirin.
AMBLE, n. : çargavî, çarbazî.
AMBLER, n. : hespê rehwan, peyarê ko hêdî diçit.
AMBLYOPIA, n. : kêmdîtin.
AMBROSIA, n. : xureka Xudayan.
AMBROSIAL, adj. : Xudayî, xurekxudayî.
AMBRY, n. : jor yan dolaba azoqeyî.
AMBULACRAL, adj. : kungehî.
AMBULACRUM, n. : kun geh : bo derketina pêyên lûlekiyên masiya stêrî.
AMBULANCE, n. : guhêzoka nexweşan, harî- kirin, yarmetî, nexweşxaneya meydanê, nexweşxaneya geroka leşkerî.
AMBULANT, adj. : guhêz, gerok, nexweşiya di leşî de digerit.

AMBULATE, *vi.* : guhêzîn, gerîn.
AMBULATED, *adj.* : gerayî.
AMBULATING, *n.* : geran.
AMBULATORY, *adj., n.* : gerok.
AMBUSCADE, *vt.i.* : bose vedan. **AMBUSCADE**,
n. : bose, melaş, pûs, melas-
vedan, berehek.
AMBUSH, *vt.i.* : bose vedan.
AMBUSH, *n.* : bose, melaş, pûs, berehek,
melasvedan.
AMBUSHED, *adj.* : bosekirî, melaskirî.
AMBUSHMENT, *n.* : bose, melas.
AMEBA OR AMEBIC = AMOEBIA, AMOEBIC.
AMEBIOSIS, *n.* : amibîti : nesaxiya amî-
bya.
AMELIORATE, *vt.i.* : baştir kirin.
AMELIORATED, *adj.* : başkirî.
AMELIORATING, *n.* : başkirin.
"M~LIQUON, *n.* : başkirin, çakirin.
AMELIORATIVE, *adj.* : baştirkirî, baştirdar.
AMEN : amîn, vêca, bila we bit. **AMENABILITY**,
n. : berpirsyaîtî.
AMENABLE, *adj.* : berbirsyar.
AMEND, *vt.i.* : rast kirin, baş bûn, (bediyê)
berdan.
AMENDABLE, *adj.* : bijarbar, başkirinbar,
rastbar.
AMENDATORY, *adj.* : bijarî, rastkirinî.
AMENDER, *n.* : rastker, bijarker. **AMENDMENT**,
n. : bijarkirin, başkirin, rast-
kirin.
AMENDS, *n.* : şûndan.
AMENITY, *n.* : xweş rê û rêbaz. **AMENORRHEA**,
n. : çikbûna xwîn dîtîne
yan mehikê.
AMENT, *n.* : işiyê guliyê gul genimî.

AMENTIA, *n.* : dînan. **AMERICAN**,
adj. : Emerîkanî.
AMERICANA, *n.* : belgenome, kitêb yan rastî li
ser Emerîka.
AMERICANISM, *n.* : zaravê Emerîkanî, nerîtê
Emerîkanî, seretayên çandana
Emerîkanî.
AMERICANIST, *n.* : emerîkanzan.
AMERICANIZATION, *n.* : emerîkanikirin.
AMERICANIZE, *vt.i.* : emerîkanî kirin.
AMERICIUM, *n.* : amerîkyom : hêmanek
metalî tîrêjdar.
AMERIND, *n.* : Hindokê sorê emerîkanî.
AMETHYST, *n., adj.* : cemşet : berek bihagiran
erxiwanî yan binefşî ye, rengê erxiwanî
yan binefşî.
AMETIYSTINE, *adj.* : pêwendîdarê berê
bihagiran cemşetî, erxiwanî yan binefşî.
AMETROPIA, *n.* : şaxiya dîtîne.
AMHERIC, *n., adj.* : amheri zimanê mîriyê
Hebeşistanê ye.
AMIABILITY, *n.* : sernermî, nazik, ser-
nerm, [am, mihrivan, nazenîn.
AMIALE, *adj.* : dost.
AMIABLY, *adj.* : bi ser nermî, sernermekî.
AMICABILITY, *n.* : aştiyanîtî.
AMICABLE, *adj.* : hevalî, ram, dostî. **AMICABLY**,
adv. : bi dostî, bi şalozî, dostane,
dostkî.
AMICE, *n.* : kirasê sermiliyê oldarî. **AMID**
OR AMIDST, *prep.* : li nav, navber. **AMIDE**,
n. : amîdî, amîni (kîmya). **AMIDE**, *adj.* :
amid.
AMIDOL, *n.* : amîdol : xwêyek belûrî bêreng
e.
AMIDSHIP, *adv.* : di nîva keştî de.

AMIDST, *prep.* = **AMID**.
AMINO, *adj.* : amînî.
 • **ACIDS**, *n.* : tirşiyên emînî,
AMISS, *adj., adv.* : çewt.
 - **TO TAKE A** - : enirîn.
AMITOSIS, *n.* : kerbûna yekser.
AMITOTIC, *adj.* : dabeşbûna nefitîlî.
AMITY, *n.* : hevalî, dostî.
AMMCOETE, *n.* : kirmikê devxir.
AMMETER, *n.* : lozewpîv, lozewpêw, rewtekpîv.
 - **SHUNT** : lozew dabeşker, rewtek dabeşker.
AMMINE, *n.* : amîn gerdika nişadirê, pêkhatiyek amînî.
AMMINO, *adj.* : amînî.
AMMONIA, *n.* : nişadir : gazek bêreng û bêhntîj.
 - **SULPHATE** : zaxa nişadirê.
AMMONIAC, *n., adj.* : amonyak, nişadirî.
AMMONIACAL, *adj.* : nişadirî.
AMMONIATE, *vt.* : nişadir kirin, çare yan têkil kirin bi nişadirî,
AMMONIFY, *vt.* : nişadir kirin : têkil yan têrnişadir kirin.
AMMONITE, *n.* : berdîneyê hindek şey tanokan.
AMMONITE, *n., adj.* : amonî : ji gelê kevnê samî.
AMMUNITION, *n.* : "ammo" cibexane, posat, cebe, cebilxane.
AMNESIA, *n.* : bêbîrî.
AMNESTY, *n., vt.* : lêborîn, bexşandin, pexşîna giştî, bexşîn.
AMNION, *n.* : perdeya hunduriya li dor pizî.
AMNIOTIC CAVITY, *n.* : vala tiya avekiya li dor pizî,

AMNIOTIC FLUID : avekiya li dor pizî.
AMNIOTIC SAC : seravok.
AMO EBA, *n.* : amîba : canewerkê yek xane ko berdewam şiklî diguhorit.
AMOEBIASIS, *n.* = **AMEBIASIS**. **AMOEBIC**
OR AMOEBAN, *adj.* : amîbî. **AMOEBOID**,
adj. : wek amîba.
AMOK, *n., adj., adv.* : hariya kuştinxwazî, bi hariya êrîşê.
 - **TO RUN** - : har bezîn.
AMOLE, *n.* : amol : riha heleza wek sabûnê.
AMONG, *prep.* : têkil, nêwan, navber, li nav, di nav.
AM ORAL, *adj.* : ne sincî.
AMORALISM, *n.* : nesincîtî, serserîtî.
AMORALIST, *n.* : serserî.
AMORIST, *n.* : jinbaz.
AMORITE, *n., adj.* : Amorî : yek ji gelên kevnên samî.
AMOROUS, *adj.* : evîndar, evînbaz.
AMOUROUSNESS, *n.* : evîndarî, evînbazî.
AMORPHISM, *n.* : bêşiklîti, bêbelûrîtî, bêserûberî.
AMORPHOUS, *adj.* : bê şikil, bê şêwe.
AMORTIZATION, *n.* : deyndan, vekuştin.
AMORTIZE, *vt.* : vekuştin.
AMORTIZED, *adj.* : vekuştî.
AMORTIZEMENT, *n.* = **AMORTIZATION**.
AMORTIZING, *n.* : vekuştin.
AMOUNT, *n.* : tibab, qas çendte), maye.
AMOUR, *n.* : evînkari, evînbazî. **AMOURETTE**,
n. : evînkari, evînbazî. **AMPERAGE**, *n.* :
 hêza lozewa kehrebî (bi ampêran pivayî), hêza rewteka.
AMPERE, *n.* : amper : yek lozew ko yek

- volt dişêt di nav bergiriya yek omê re biborînit.
- AMPERE-HOUR (*a.h.*), *n.* : empêdemjimêr.
- AMPERE-TURN, *n.* : empêrpêç.
- AMPHI, *pref.* : pêşgir e ko du texlît e.
- AMPHIBIA, *n.* : canewerên bejayî.
- AMPHIBIAN, *n.*, *adj.* : bejayî.
- AMPHIBIOLOGY, *n.* : bejavîzanî. AMPHIBIOTIC, *adj.* : avî li qonaxekê û bejî li qonaxek dî.
- AMPHIBIOUS, *adj.* : beja vî, teroşkî.
- AMPHIBIOUSNESS, *n.* : bejavîfî.
- AMPHIBOLES, *n.* : emphîbol : xavên silikatên kalisyom û asin û megnîsyom
- AMPHIBOLIC, *adj.* : şêlî, aloz, nepîştrast.
- AMPHIBOLOGY, *n.* : alozî, hevoka aloz yan şêlî.
- AMPHIBOLOUS, *adj.* : şêlî, aloz.
- AMPHICARPIC, *adj.* : deber.
- AMPHIGAM, *n.* : zayend nediyar, regeznezan.
- AMPHIPOD, *ll.*, *adj.* : pêçot
- AMPHISTYLAR, *adj.* : (ji her du rexan) karî-tekirî.
- AMPHITHEATRE, *n.* : pêpikirî, erdê nişîvê pêpikirî.
- AMPHITHEATRIC, *adj.* : pêpikiriya.
- AMPHORA, *n.* : kemoreyê kevnê mey yan zeytê.
- AMPLE, *adj.* : zor, fire, boş, firawan, gelek, pir, zehf, pelising.
- AMPLENESS, *n.* : boşayi, têr hatî, zehfî, pelesingî.
- AMPLEXICAUL, *adj.* : basik girtî yan alayî.
- AMPLIATION, *n.* : firehkirin, firawankirdin.
- AMPLIFICATION, *n.* : mezinkirin, firehkirin.
- AMPLIFACTORY, *adj.* : mezinî, fireyî, dirêjî.
- AMPLIFIER, *n.* : mezinker, gewreker. AMPLIFY, *vt.i.* : mezin kirin, gewre kirin. AMPLITUDE, *n.* : mewda, firehiya pêlê, firewanî, fireyî, bihayê serî (gopitkî). -MODULATION, *n.* : fireyî, şeqîn.
- AMPUL OR AMPOULE, *n.* : ampûl : şûşeya qurtek dermanî bo derzî lêdanê (li bin çermî).
- AMPULLA, *n.* : şûşe (gulav, mey yan zeyta pîroz), heban.
- AMPUTATE, *vt.* : birrîn (destî, pêyî).
- AMPUTATED, *adj.* : hilbirrandî, pekandî, raqetandî, birrî, torkirî,
- AMPUTATION, *n.* : hilbirrandin, pêkîn, raqetandin, jêkirin, torkirin.
- AMPUTE, *n.* : dest yan pê birrî.
- AMUCK OR AMOK, *n.* : bezma bêserûber.
- AMULET, *n.* : nûşte, destbend, bazbend. AMUSE, *vt.* : keyf xweş kirin, keyfê kirin.
- AMUSEMENT, *n.* : keyfxweşî, vesihîn, vesihandin. -PARK : baxçeyê keyfê yan vesihînê.
- AMUSING, *n.* : keyf, seyr, gêre.
- AMYGDALA, *n.* : ' bahîv.
- AMYGDALATE, *adj.* : bahîvî,
- AMYGDALIN, *n.* : amigdaiin : gilokosîdê di nav bahîva tal de.
- AMYGDALIC, *adj.* : bahîvî.
- AMYGDALOID, *n.*, *adj.* : bahîvî, kevrek kun kunî tejî nişteyê kanan.
- AMYL, *n.* : amîl, giroyek amîlî (rihdarên alkuholên têvel),
- AMYL(O)-, *pref.* : pêşgir e ko nişa ye.
- AMYLACEOUS, *adj.* : nişayî.
- AMYLASE, *n.* : amîlas : haveyn nişayî kirin, şekir (di nav şêlay û gilîzî de).

AMYLOID(AL), *adj.* : nişayî.

AMYLOLYSIS, *n.* : guhorîna nişayê bo şekirê.

AMYLOPSIN, *n.* : amilopsin : haveyna givaşa şêlavî ko nişayê dikit şekir.

AMYLOSE, *n.* : şekira beramber wek nişa û silolozî.

AMYLUM, *n.* : nişa.

AN, *ind. ariic., conj.* : amraza nenaskirinê. AN-
. *pref.* : pêşgir e ko ne-, bê- ye.

ANA, *adv., n.* : wek yek, ji her tiştî.

ANABAPTISM, *n.* : şuştinveyî : ola filehiya (dîsan dişût).

ANABAPTIST, *n.* : bawermendê ola şuştinveyî.

ANABAS, *n.* : tuxmê masiya ko ji avê derdikevin û bi ser daran dikevin.

ANABASIS, *n.* : pêşveçûna leşkerî nexasme ewa korişî ko Ksenofoni vegêrayî,

ANABATIC, *11dj.* : ser evrazbûyî.

ANABOLIC, *adj.* : ava kirinî (zindewerî).

ANABOLISM, *n.* : avakirin (piştî herifînê, li kird ara guhartina xurekî bo tevnê canewerî yan heiezî).

ANACHRONIC, *adj.* : kevin.

ANACHRONISM, *n.* : kevnîfî.

ANACHRONISTIC, *adj.* : kevnî.

ANACONDA, *n.* : anakonda : marek mezinê başûra Emerîka.

ANADEM, *n.* : gulbend.

ANADROMOUS, *adj.* : ji deryayî serketî rûbarî da ko hêkan bikit.

ANAEMIA, *n.* = ANEMIA.

ANAEROBE, *n.* : zîndewerê bê ba yan nebayî.

ANAEROBIC, *adj.* : pêwendîdarê zîndewerê nebayî.

ANAESTHETIC, *n., adj.* : penc, sirker.

ANAESTHETIZATION, *n.* : penckirin, bêhişk-
kirin.

ANAESTHETIZED, *adj.* : penckirî, bêhişkîrî.

ANAGLYPH, *n.* : neqşê kê m derhatî. ANAGOGE
OR ANAGOGY, *n.* : raveya hindurî
yan giyaniya deqek ayîni.

ANAGRAM, *n.* : guhartina peyhatiya tîpên
peyivekê bo çêkirina peyivek nû, tîpên
peyivê hosa diguhorin.

ANAGRAMMATIZE, *vt.* = ANAGRAM.

ANAL, *adj.* : qanî.
- BLEEDING : risîna qonê.
- CANAL : kunika qonê.
- VESICLES PLATE : depê qonê.

ANALGESIA, *n.* : hedarî, bêjanî.

ANALGESIC, *adj., n.* : jankûj, bêjanker,
hedarker.

ANALOGIC, *adj.* : hevtayî, pîvanî. ANALOGOUS,
adj. : hevta, hawta, hevrû, wek.

ANALOGUE, *n.* : berdêl, hevrû, hev ta, hara,
qam, hawta.
- COMPUTER, *n.* : xwejimêra pîvanî.

ANALOGY, *n.* : hawtayî, wekyekî (parçekî).

ANALPHABET, *n.* : nexwenda, nexwendî,
nexwendewar.

ANALYSAND, *n.* : derûnî şitelkirî.

ANALYSE, *vt.* = ANALYZE.

ANALYSIS, *n.* : şitel, şikirin, hevoksazî, şikarî,
kurtî, şikirdin, şitelkirin, şitelkirdin,
jêkvekirin.

ANALYST, *n.* : şivan, şikar, şiker, şitelkar,
şitelkarê derunî,

ANALYTIC, *adj.* : 'rêzimanî, şitelî, şehreza (bi
şitelkirinê).

ANALYTICAL, *adj.* : jimartinî.

ANALYSIS, n. : jimartina şîtelîzanî. **ANALYTICS,**

n. ; şîtelîya jîrbêj, endazyariya şîtelî,

ANALYZABLE, adj. : şîtelbar.

ANALYZATION, n. ; şîtel(kirin).

ANALYZE, vt. : şîtel kirin, şîkirin, rêzimana şîkirin.

ANAMMESIS, n. : bîrkinin, dîroka nesaxî.

ANAMORPHA, n. : sihpê, sîpê.

ANAMORPHOSIS, n. : werar, fîrajo.

ANANAS, n. = PINEAPPLE.

ANANDROUS, adj. : bènêrik.

ANANIAS, n. : derewker.

ANATHOUS, adj. : bêgul, negulî.

ANAPEST, n. : pîvek helbestê ye. **ANAPHASE,**

n. : qonaxa cudabûnî (nafika xaneyê).

ANAPHORA, n. : dubarekirina bêjeyekê li serê du hevok yan malikên peyhatî.

ANAPHRODISIA, n. : bêhewes yan kêmhewesa gankirinê (dakutanê).

ANAPHRODISIAC, adj., n. : nehêlan yan kêmkêrê hewesa gankirinê yan dakutanê.

ANAPHYLAXIS, n. : hestiyariya bêqam dijî pirotîna biyanî.

ANAPLASTY, n. = PLASTIC SURGERY.

ANAPSID, n. : kiloxê bêlacan.

ANARCH, n. : ajawegêr, rêberê ajawegêr.

ANARCHIC, adj. : bêqanûnî, ajawegêrî.

ANARCHISM, n. : ajawegêrî : dîtaneya ko her desthelatiya hikumetê xirab e.

ANARCHIST, n., adj. : ajawegêr, bê qanûnxwaz.

ANARCHISTIC, adj. : ajawegêrî.

ANARCHY, n. : ajawe, şêlû bêl, bêdesthelatiya hikumetê.

ANASARCA, n. : avbenda leşî.

ANASTIGMAT, n. : nîskeya rastker (dîtin).

ANASTIGMATIC, (adj.) : rastkerî. **ANASTOMOSIS, n.**

: tor yekbûna demarên

xwînê, têkalîna çiq yan rihan, vêketin yan torbûna du hêlan yan rûbaran.

ANASTROPHE, n. : vajî: vajîkirina rêkxistina asayiya peyivên hevokî.

ANATHEMA, n., adj. : kambax, nifrîn, nifrînkirî.

ANATHEMATIZE, vt. : nifrîn kirin, kambax kirin.

ANATIDAE, n. : qaze kî.

ANATOLIAN, n., adj. : Anadolî.

ANATOMIC(AL), adj. : kelişînî. **ANATOMIST,**

n. : neşterbaz, kelşînkêr, **ANATOMIZE, vt.**

: şirove kirin.

ANATOMY, n. : kelişînzani, neşterbazî, keliştin, vekeliştin, anatomî.

ANATROPOUS, adj. : vajiya hêkê.

• **ANCE, Suff.** : paşgir e ko kar e, kirdar e.

ANBURY, n. : pufiya nerm ya hesp û gayan.

ANCESTOR(S), n. : bapîr, babûbapîr, bapalkalk, îcax, pêsîne.

ANCESTRAL, adj. : bapîrî, babikî. **ANCESTRY,**

n. : babik, pêsîn, pêsînan, bapîr, binemalte).

ANCHOR, vt. i. : lenger kirin. -

AT - : lengerkirî.

- TO CAST OR DROP - : lenger kirin.

- TO WEIGH - : lenger rakirin (bo derketinê).

ANCHORAGE, n. : bender, lengergeh, lenger girtin.

ANCHORED, adj. : lengerhavêtî.

ANCHORESS, n. : reben (mê).

ANCHORET, *n.* : reben.

ANCHORING, *n.* : lengergirtin.

ANCHOVY, *n.* : ankovî: masiyek biçûk e.

ANCIENT, *adj.*, *n.* : kevin, kevnare. ANCIENTLY, *adv.* : bi kevnî, berê, kevinî. ANCIENTNESS, *n.* : kevnatî.

ANCILLA, *n.* : bermalî, harîker.

ANCILLARY, *adj.* : harîker.

ANCIPITAL, *ad.* : duserik.

ANCLE, *n.* = ANKLE.

ANCODONTA, *n.* : dusim.

ANCON, *n.* : enîşk.

• ANCY, *suff.* : paşgir e ko bar e.

ANCYLOSTOMA, *n.* : momare. ANCYLOSTOMIASIS, *n.* : kêmxwîniya dijar. AND, *conj.* : û.

-SO ON : û herwesa.

-SO FORTH : û herwesa.

ANDALUSIAN, *ad.*, *n.* : andelûsî.

ANDANTE, *adv.*, *ad.*, *n.* : hêdiya navî, livîn yan birgeha hêdiya navîn.

ANDIRON, *n.* : asinê berpalkê darên agirî.

ANDR(O)-, *pref.* : pêşgir e ko mirove, nêr e.

ANDRADITE, *n.* : berek hêja ye. ANDROECIUM, *n.* : endamên nêrikên helezî.

ANDROGENE, *ad.* : nêr(e)mok.

ANDROGENOUS, *ad.* : jinane.

ANDROID, *adj.*, *n.* : mirovê amêrger, mirovî.

ANECDOTAGE, *n.* : çîrokbêjî.

ANECDOTAL, *ad.* : çîrokî.

ANECOOTE, *n.* : çîrok, çîvanok.

ANELECTRIC, *ad.* : nekehrebî.

ANEM(oh) *pref.* : pêşgir e ko ba ye.

ANEMIA, *n.* : kêmxwînî.

ANEMIC, *adj.* : kêmxwîn.

ANEMOGRAPH, *n.* : bapîv.

ANEMOGRAPHY, *n.* : bapîvî.

ANEMOLOGY, *n.* : bazanî.

ANEMOMETER, *n.* : bapîv.

ANEMONE, *n.* : nîsanî, gongilok, bûk û zava.

ANEMOPHILOUS, *adj.* : ba peyînî.

ANEMOPHILY, *n.* : peyîna bayî.

ANEMOSCOPE, *n.* : babîn.

ANET, *prep.* : ji, sebare, **li** ser, li babetê.

ANEROID, *n.* : pestanpîva bayî. ANESTHESIA, *n.* : sirbûn, bêhi şî, penc. ANESTHETIC, *adj.*, *n.* : sirker, bêhişker, tezandin, penckirin.

ANESTHETIST, *n.* : bêhişker, pencker.

ANESTHETIZE, *vt.* : bêhişkirin, penc kirin.

ANESTHETIZED, *ad.* : bêhişkirî, penckirî.

ANEUNYSM OR ANEUNISM, *n.* : dirêjbûna demarên xwîne.

ANEW, *cd.* : ji nû.

ANFRACTUOUS, *ad.* : badayî, çep û çîrî.

ANGARY, *n.* : mafê dewleta şerker ko samanê dewletên nêtar dagîr bikir û bi kar bînit.

ANGEL, *n.* : firîşte, melek.

- OF PUNISHMENT : zebanî.

ANGELFISH, *n.* : masiya firîşteyî.

ANGELIC(AL), *adj.* : firîşteyî.

ANGELICA, *n.* : giyayê firîşteyî.

ANGELUS, *n.* : nivêja mizgîniyê, zengila mizgîniyê.

ANGER, *vt. i.* : enirîn, enirandin.

ANGER, *n.* : enirîn, xişim, engirî, xwîn, enir, gerûse, hêrisî, xeyidîn.

ANGEREO, *adj.* : enirandî,
 ANGERING, *n.* : enirandin, turan din, silki-
 rin.
 ANGI(O)-, *pref.* : pêş gir e ko aman e.
 ANGINA, *n.* : dilêş, dilrencî, janedil. -
 PECTORIS : sîngkutan.
 ANGIOLOGY, *n.* : xwîn yan limf demarza-
 nî, anjiolojî.
 ANGIOMA, *n.* : pejbûna demarî. ANGIOSPERM,
n. : tovqepûçkî. ANGIOSPERMOUS, *adj.* :
 pêwendidarê tov-
 qepûçkî.
 ANGLE, *n.* : goşe, kunc, kaş, qilçik, şoka
 maslyan.
 - OF ATTACK : goşeya hatinê.
 - OF CONTACT : goşeya lêketinê.
 - OF DEPRESSION : goşeya nîzmbûnê.
 - OF ELEVATION : goşeya bilindbûnê.
 - OF FRICTION : goşeya lêkxişanê.
 - OF INCIDENCE : goşeya ketinê.
 - OF REFLECTION : goşeya helgeranê.
 - OF REFRACTION : goşeya şikandinê,
 ANGLED, *adj.* : goşekirî.
 ANGLE IRON, *n.* : asinê goşeyî.
 ANGLER, *n.* : masîgir, masîvan.
 ANGLEWORM, *n.* = EARTHWORM.
 ANGLICAN, *adj., n.* : anglikanî : endamê dêra
 înglîzî, înglîz.
 ANGLICISM, *n.* : seretayên ramyarî yên
 înglîzî, zaraviya înglîzî.
 ANGLICIST, *n.* : zanayê ziman û torê
 înglîzî.
 ANGLICISE, *vt.i.* : înglîzî kirin.
 ANGLICIZATION, *n.* : înglîz kirin.
 ANGLICIZED, *adj.* : înglîz kirî.
 ANGLICIZING, *n.* : înglîz kirin.

ANGLIFY, *vt.* = ANGLICIZE.
 ANGLING, *n.* : masîgirtin (bi şokê). ANGLO-,
pref. : pêşgir e ko înglîz e. ANGLOMANIA, *n.* :
 înglîzxwazî, înglîzhizî. ANGLOPHIL(E), *n.* :
 înglîzxwazî, înglîzhiz. ANGLOPHOBE, *n.* :
 kîndarê înglîzî (dijyan
 nehezê înglîzî).
 ANGLOPHOBIA, *n.* : kîndariya înglîzî.
 ANGORA, *n.* : keş.
 - KID : kehrik.
 ANGOSTURA, *n.* : tivilê talê darek başûra
 Emerîka wek qayimkerî bi kar dihêt.
 ANGRILY, *adv.* : bi enirînî, enirînekî.
 ANGRINESS, *n.* : enirîn.
 ANGRY, *adj.* : enirî, dilmayi, dilpir, rûtirş,
 ture, sil, xeyidî.
 ANGST, *n.* : hejivîn, perîşanî, tirs, bizdihîn.
 ANGSTROM UNIT, *n.* : yekeya angstrom :
 parçeyek ji 100 milyon ji sentîmetrê .
 ANGUILLIFORM, *adj.* : wek marmasî.
 ANGUINE, *adj.* : wek marî.
 ANGUISH, *n.* : cefa, êşa dijwar, jan, arhan,
 azarî, derdmendî, dilgirani, şikenc,
 rnirûç, mirûs, mirûz.
 ANGUISHO, *adj.* : xemdar. ANGULAR,
adj. : goşeyî, goşedar.
 - ACCELERATION : lezdan yan tawdana
 goşeyî.
IMPRECATORY, *adi.* : nifrînî.

IMPRECISE, *adi.* : nerast, şêlî, nehûr.

IMPRECISELY, *adi.* : bi nerastî yan hûrî, nerastekî, nehûrîkî.

IMPRECISENESS, *n.* : nerastîfî, nehûrîfî.

IMPRECISION, *ll.* : nerastî, nehûrî.

IMPREGNABILITY, *ll.* : asêbarîfî, bergirîfî, berhelîfî.

IMPREGNABLE, *adi.* : asêfbar). IMPEGNABLY, *adv.* : bi asêbarî, asêbarkî.

IMPREGNATABLE, *adi.* : avisbar.

IMPREGNATE, *adj.* : delandî, avis, bi tişt, bi zik.

IMPREGNATE, *vt.* : avis kirin, têra çûn.

IMPREGNATED, *arfj.* : aviskirî, asêkirî.

IMPREGNATING, *n.* : avîskirin, têraçûn.

IMPREGNATION, *ll.* : aviskirin, têraçûn.

IMPRESSARIO, *n.* : kardarê tîpê yan tofê (mûziqe), derhêner, berhên, berhemkar.

IMPREScriptible, *adj.* : binya tî, cuda ji qanûn yan nerîfî, nahêt standin.

IMPRESS, *vt.* : dax kirin, kotekî kirin, mohr kirin, çap kirin, kar têkirin.

IMPRESSIBILITY, *ll.* : kartêkirinbarî (tî), têçespanîfî.

IMPRESSIBLE, *adj.* : kartêkirinbar, têçespanbar.

IMPRESSIBLY, *adv.* : bi kartêkirinbarî, kartêkirinbarkî, têçespankî.

IMPRESSION, *ll.* : têçespan, çap, şeqil, kaxeza çapkîrî, çap: hemî daneyên çapkiryên pirtûkê, hizir yan bira şêlî, hinin ya yekem.

IMPRESSIONABILITY, *ll.* : têçespanbarîfî.

IMPRESSIONABLE, *adj.* : têtêspanbar, hestiyar, nerm.

IMPRESSIONISM, *n.* : têtêspanîtî.

IMPRESSIONIST, *n., adj.* : têtêspankar, pêlî-nayî.

IMPRESSIONISTIC, *adj.* : têtêspanî. IMPRESSIVE,

adj. : nayab, hestiyar. IMPRESSMENT, *n.* :

destbiserdegirtin (bo b.erjewendiya gelemperî), serbazkinn.

IMPREST, *n.* : deyn, pêşîne.

IMPRIMATUR, *n.* : rêdan, destûr (bo çapkîrinê yan belavkirinê).

IMPRINT, *n.* : nîşan, şeqil, (besme).

IMPRINT, *vi.* : dax kirin, mohr kirin, tillêdan, (besme) kirin.

IMPRINTER, *n.* : nîşan.

IMPRISON, *vt.* : zîndan kirin, bend kirin, hebs kirin.

IMPRISONABLE, *adj.* : bendkirinbar, zîndankirinbar, girtinbar.

IMPRISONED, *adj.* : bend/kirî, zîndankirî, girtî.

IMPRISONMENT, *n.* : zîndankirin, bendkirin, girtin, hebskirin.

IMPROBABILITY, *n.* : neçêbûnbarîtî, doreçêbûn.

IMPROBABLE, *adj.* : neçêbûnbar, doreçêbûnî.

IMPROBABLY, *adv.* : bi dore çêbûnî, doreçêbûnkî.

IMPROBITY, *n.* : nepakî.

IMPROMPTU, *adv., adj., n.* : serpêkî, serpêyî, serpilkî.

IMPROPER, *adj.* : çewt, nerast, kêrnehâtî, nehêja.

• FRACTION : şikestika nerast.

IMPROPERLY, *adv.* : bi çewtî, çewtîkî.

IMPROPRIATE, *vt.* : rapêç kirin.

IMPROPRIATION, *n.* : rapêçkirin.

IMPROPRIATOR, *n.* : rapêçvan.

IMPROPRIETY, *n.* : kêrnehatin, bêşermî, nehêja yî, çewtî.

IMPROVABILITY, *n.* : başkirinbarîtî, çakirinbarîtî.

IMPROVABLE, *adj.* : başkirinbarî, çakirinbarî.

IMPROVABLENESS, *ll.* : başkirinbarîtî, çakirinbarîtî.

IMPROVABLY, *adv.* : bi başkirinbarî, başkirinbar kî.

IMPROVE, *oti.* : baş kirin, çak kirin.

IMPROVED, *adj.* : başkirî, çakirî.

IMPROVEMENT, *n.* : başkirin, çakirin, pêşvebirin, pêşveçûn.

IMPROVER, *ll.* : başkar, çakar, baş ker.

IMPROVIDENCE, *n.* : destberdan.

IMPROVIDENT, *adj.* : destberdayî.

IMPROVING, *n.* : başkirin.

IMPROVISATION, *ll.* : çêkirin (serpilkî).

IMPROVISATIONAL, *adj.* : çêkirinî (serpilkî).

IMPROVISATIONALLY, *adv.* : bi çêkirinî (serpilkî), çêkirinkî,

IMPROVISATOR, *ll.* : serpilkîdar.

IMPROVISATORY, *n.* : serpilkî.

IMPROVISE, *vt.i.* : (serpilkî) çêkirin, (serpilkî) pêşkêş kirin.

IMPROVISED, *adj.* : (serpilkî) çêkirî.

IMROVISOR, *n.* : (serpilkî) çêker.

IMPROVISING, *n.* : (serpilkî) çêkirin.

IMPRUDENCE, *n.* : holî, gewd.

IMPRUDENT, *adj.* : hol, gewc, rûqayim, rûreş, zimandirêj.

IMPRUDENTLY, *adv.* : bi holî, bi gewcî, gewcîkî, holîkî.

IMPUOENCE	■ ■ ■ ■ ■	INACTIVELY
IMPUOENCE, <i>n.</i> : sîtarî, holî, gewd, bêarî.		IMPUTED, <i>adj.</i> : sûcdarkirî, berpirsyarkirî.
IMPUDENT, <i>adj.</i> : ziman tal, rûqayim.		IMPUTING, <i>n.</i> : sûcdarkirin, berpirsyarkirin.
IMPUDENTLY, <i>adv.</i> : bi rûqayimî, rûqayimîkî,		IN, <i>prep.</i> : li, nav, di nav de, têde, bi.
IMPUOICITY, <i>n.</i> : bê şermîtî, rûqayimîtî, holîtî.		• A HURRY : bi lez û bez. ..
IMPUGN, <i>vt.</i> : derew hînan der, derewîn kirin.		BRIEF : bi kurtî.
IMPUGNABLE, <i>adj.</i> : derewbar.		„CASH : nextine, diravîne.
IMPUGNMENT, <i>n.</i> : derewdarî.		• COMMON : vêkra, têkra, berhev. ..
IMPUISANCE, <i>n.</i> : lawazî.		DEBT : deyndar.
IMPUISANT, <i>adj.</i> : lawaz.		- GEAR : nêr û mêkirî, gêrkirî.
IMPULSE, <i>n.</i> : pil, tewjîm, pildan.		- GENERAL : bi gelemperî, bi giştî.
IMPULSED, <i>adj.</i> : tewjîmkirî, pildayî.		- IT : têde.
IMPULSING, <i>n.</i> : tewjîmkirin, pildan.		- KINO : çavî, malîne.
IMPULSION, <i>n.</i> : tewjîm.		- MESH : nêr û mê.
IMPULSIVE, <i>adj.</i> : hol, paldanî, livinbar, tewjîmdar.		- NO WAY : çî car, tu car, êkcar.
IMPULSIVELY, <i>adv.</i> : bi paldani, paldankî, holîkî.		„ORDER THAT : da ko, da. -
IMPULSIVENESS, <i>n.</i> : livinbarîtî.		PAIRS : cot cot.
IMPUNITY, <i>n.</i> : parêzîtî.		- SPITE OF : li dijî.
IMPURE, <i>adj.</i> : mirdar, dawpîs, nebîjîn, pîs.		- SPECIE : çavî.
IMPURELY, <i>adv.</i> : bi nebîjînî, bi mirdarî, nebîjînekî, mirdarekî.		„THE PAST : berê.
IMPURENESS, <i>n.</i> : nebîjînîtî.		INABILITY, <i>n.</i> : neşyanîtî, nikarîbûn.
IMPURITY, <i>n.</i> : nebîjînî, xewşîtî, nepakî, napakî, pîs bûn.		IN ABSENTIA : li piştê.
IMPUTABILITY, <i>n.</i> : sûcbarîtî.		INACCESSIBILITY, <i>n.</i> : sextîtî, asêbarîtî.
IMPUTABLE, <i>adj.</i> : sûcbar.		INACCESSIBLE, <i>adj.</i> : sext, asêbar.
IMPUTATION, <i>n.</i> : sûckirin.		INACCESSIBLY, <i>adv.</i> : bi sextî, bi asêbarî, asêbarkî.
IMPUTATIVE, <i>adj.</i> : sûcdar.		INACCURACY, <i>n.</i> : çewtî, nerastî. INACCURATE, <i>adj.</i> : çewt, nerast. INACCURATELY, <i>adv.</i> : bi çewtî, bi nerastî, çewtîkî, nerastîkî.
IMPUTATIVELY, <i>adv.</i> : bi sûcdarî, sûcdarkî.		INACTION, <i>n.</i> : bêkarî, bêçalakî, tembelî.
IMPUTE, <i>vt.</i> : sûcdar kirin, berpirsyar kirin.		INACTIVATE, <i>vt.</i> : sist kirin, neçalak kirin.
		INACTIVE, <i>adj.</i> : neçalak.
		INACTIVELY, <i>adv.</i> : bisistî, bi neçalakî, lawazkî.

INACTIVITY

- INACTIVITY, *n.* : neçalakitî, bapîvanîtî.
 INADAPTIBILITY, *n.* : bêrahatinbarîtî.
 INADEQUACY, *ll.* : kêmiş, kemî, tênekirin.
 INADEQUATE, *adj.* : kêmiş, kem. INADEQUATELY, *adv.* : bi kêmiş yan kemî, kêmişkî.
 INADEQUATENESS, *n.* : kêmişî, kemîşî.
 INADHESIVE, *adj.* : nerisikî.
 INADMISSIBILITY, *ll.* : nehêlanbarîûî).
 INADMISSIBLE, *adj.* : nehêlanbar, netê.
 INADMISSIBLV, *adv.* : bi nehêlanbarî, nehêlanbarkî.
 INADVERTENCE, *ll.* : feramoşî.
 INADVERTENCV, *ll.* : feramoşî.
 INADVERTENT, *adj.* : naşî, hov.
 INADVERTENTLV, *adv.* : bi naşî, naşîkî.
 INADVISABLE, *adj.* : ne pend bar, neqewî-bar.
 INALIENABILITY, *n.* : neguhêzbarîtî (xwedanî, saman).
 INALIENABLE, *adj.* : neguhêzbar. INALIENABLV, *adv.* : bi neguhêzbarî, neguhêzbarkî.
 INALTERABILITY, *n.* : neguhêrbarîtî.
 INALTERABLE, *adj.* : neguhêrbar.
 INALTERABLV, *adv.* : bi neguhêrbarî, neguhêrbarkî.
 INAMORATO, *n.* : dilber.
 IN-AND-IN, *adv.* : bi dubareyî.
 INANE, *adj., n.* : pûç, pûçî.
 INANIMATE, *adj.* : bêhiş, nezindî.
 INANIMATELY, *adv.* : bi bêjiyanî, bêjiyankî, nezindîkî.
 INANIMATENESS, *ll.* : nezindîtî.
 INANIMATION, *ll.* : nezindîbûn, nelivkî.
 INANITION, *ll.* : nezindîbûn, neliv kî.

INAPTITUDE

- INANITY, *n.* : pûçîtî.
 INAPPARENT, *adj.* : nediyar.
 INAPPEASABLE, *adj.* : neqayilbar.
 INAPPELLABLE, *adj.* : nenûvekîrbar.
 INAPPETENCE, *n.* : dilneçûnî, nexwaze kî.
 INAPPETENT, *adj.* : dilneçûn, nexwazek.
 INAPPLICABILITY, *n.* : kêrnehatîtî, nerahînanbarîtî.
 INAPPLICABLE, *adj.* : kênehati, nerahînanbar.
 INAPPLICABLY, *adv.* : bi kêrnehatî, binerahînanbarî, kêrnehatîkî.
 INAPPOSITE, *adj.* : kêrnehatî.
 INAPPOSITELY, *adv.* : bi kêrnehatî, kêrnehatîkî.
 INAPPOSITENESS, *ll.* : kêrnehatîtî.
 INAPPRECIABLE, *adj.* : piçek, hindik, hindek.
 INAPPRECIABLY, *adv.* : bi hindîkî, hindîkî.
 INAPPRECIATION, *n.* : rêznegirtin, nesipasdarî, nebihadarkirin.
 INAPPRECIATIVE, *adj.* : nesipasdar.
 INAPPRECIATIVELY, *adv.* : bi nesipasdarî, nesipasdarkî.
 INAPPRECIATIVENESS, *ll.* : nesipasdarîtî.
 INAPPREHENSIBLE, *adj.* : netêgeheştinbar.
 INAPPROACHABLE, *adj.* : negehiştinbar, nehevrikbar.
 INAPPROPRIATE, *adj.* : kêrnehatî, çewt.
 INAPPROPRIATELY, *adv.* : bi çewtî yan kêrnehatî, çewtîkî.
 INAPPROPRIATENESS, *n.* : kêrnehatîtî, çewtîtî.
 INAPT, *adj.* : kêrnehatî, neşehreza. INEPTLV, *adv.* : bi kêrnehati, kêrnehatîkî. INEPTNESS, *ll.* : kêrnehatîtî.
 INAPTITUDE, *ll.* : neşehrezayî.

- INARCH, *vt.* : petrume kirin (bi pêk ve girêdana çiqan).
- INARGUABLE, *ndj.* : neberhevdanbar.
- INARTICULATE, *ndj.* : devmirî.
- INARTICULATION, *n.* : devmirin.
- INARTIFICIAL, *ndj.* : sirûştî, bêhuner.
- INARTISTIC, *adj.* : nehunerî.
- IN AS MUCH, *conj.* : hindî ko, ji ber ko.
- INATTENTION, *n.* : feramoşî.
- INATTENTIVE, *ndj.* : naşî, hov, neguhdar.
- INATTENTIVENESS, *n.* : neguhdarîfî.
- INAUDIBILITY, *n.* : nebihîsbarîfî. INAUDIBLE, *ndj.* : nebihîsbar.
- INAUDIBLY, *adv.* : bi nebihîsbarî, nebihîsbarîfî.
- INAUGURAL, *ndj., n.* : destpêkirin, destpêk.
- INAUGURATE, *vt.* : dest pê kirin. INAUGURATED, *ndj.* : destpêkirî. INAUGURATING, /1. : destpêkirin. INAUGURATION, *n.* : dest pêkirin.
- INAUGURATOR, *n.* : destpêker. INAUSPICIOUS, *adj.* : enîreş, enîbeş. INAUSPICIOUSLY, *adv.* : bienîbeşî, enîreşkî. INAUSPICIOUSNESS, *n.* : enîbeşîfî,
- IN BETWEEN, *ndj., n.* : navber.
- IN BOARD, *adu., adj.* : hindurî (nav) keştî de yan gemiyê de.
- INBORN, *adj.* : zikmakî, sirûştî.
- INBOUND, *ndj.* : navdayî.
- INBREATHE, *vt.* : bêhn kêşan.
- INBRED, *ndj.* : sirûştî, hindurî.
- INBREED, *vt. i.* : hindur zayîn.
- INBREEDING, *n.* : hindur zan yan zayîn (zana hindurî yan navdayî).
- INCALCULABILITY, 11. : bêlekayîfî, nehejmêrbarî.
- INCALCULABLE, *ndj.* : bêleka, nehejmêrbar.
- INCALCULABLY, *adu.* : bi bêlekayî, bi nehejmêrbarî, bêlekakî.
- INCALESCENCE, *n.* : rivîn.
- INCANDESCENCE, *vi.* : geşbûn,
- INCANDESCED, *ndj.* : geşbûyî. INCANDESCENCE, *n.* : rivîn, riyên, vegeşbûn. INCANDESCENCE, *vt.* : geşbûn. INCANDESCENT, *ndj.* : geş.
- INCANDESCENTLY, *ado.* : bi geşî, geşîkî.
- INCANDESCING, 11. : geşbûn.
- IN-CANT, *vi.* : dey kirin, derberrîn.
- INCANTATION, 11. : nivîştî, nûşte. INCANTATIONAL, *ad.* : nivîştîyî, nûşteyî, nivîştîkî.
- INCANTATORY, *ndj.* : nivîştîyî, nûşteyî.
- INCAPABILITY, 11. : neşiyaniîfî. INCAPABLE, *adj.* : neşiya, neşê. INCAPABLENESS, 11. : neşiyaniîfî.
- INCAPABLY, *ado.* : bi neşeyî, **bi** neşiyaniî, neşiyankî.
- INCAPACITATE, *vt.* : bêşiyani kirin, lawaz kirin.
- INCAPACITATED, *ndj.* : bêşiyankirî.
- INCAPACITATING, *n.* : bê şiyankirin.
- INCAPACITATION, 11. : lawaz kirin, bêşiyankirin.
- INCAPACITATOR, 11. : bêşiyanker.
- INCAPACITY, *n.* : bêşiyaniî,
- INCARCERATE, *vt.* : zîndan kirin, bend kirin, hebs kirin.
- INCARCERATED, *adj.* : bendkirî, zindankirî.
- INCARCERATING, 11. : bendkirin, zîndankirin.

INCARCERATION

INCARCERATION, *n.* : zîndankirin.
 INCAROINATION, *n.* : qeşekirin.
 INCARNAOINE, *adj.* : qirmizî.
 INCARNAOINE, *vt.* : qirmizî kirin, sor kirin.
 INCARNAOINEO, *adj.* : qirmizîkirî, sorkirî.
 INCARNAOINING, *n.* : qirmizîkirin, sorkirin.
 INCARHATE, *adj.* : leşdar, tendar. INCARNATE, *vt.* : leşdar bûnve. INCARNATEO, *adj.* : leşdarbûyîve. INCARNATING, *ll.* : leşdarbûnve. INCARNATION, *n.* : leşdarbûnve.
 INCAUTION, *n.* : nehişyari, newuryayî.
 INCAUTIOUS, *adj.* : nehişyar, newurya.
 INCAUTIOUSLY, *adv.* : bi nehişyarî, nehişyarkî.
 INCAUTIOUSNESS, *n.* : nehişyarîfî.
 INCENOIARISM, *n.* : sotinitî (bi biryarkarî).
 INCENOIARY, *n., adj.* : sotinî, sotindar.
 INCENSATION, *n.* : bêhnxoşkirin.
 INCENSE, *n.* : bêhnxoş.
 INCENSE, *vt.* : bêhnxoş kirin, bêhnxoş sotin, enirandin.
 INCENSEO, *adj.* : arandî, enirandî, bêhnxoşkirî.
 INCENSING, *n.* : arandin, enirandin, bêhnxoşkirin.
 INCENSORY, *n.* : bêhnxoşdan : amanê ko bêhnxoşî tê de disojin.
 INCENTIVE, *n., adj.* : hander.
 INCEPT, *vi.* : dest pê kirin, pileya bilinda zankoyê (doktora, majister) standin.
 INCEPTION, *n.* : destpêkirin.
 INCEPTIVE, *adj.* : destpêkdar.
 INCEPTIVELY, *adv.* : bi destpêkdari, destpêkdarkî.
 INCEPTOR, *n.* : destpêker.

INCINERATOR

INCERTITUOE, *n.* : goman, bêhedan, dudilî.
 INCESSANCY, *n.* : berdewamî.
 INCESSANT, *adj.* : berdewan.
 INCESSANTLY, *adv.* : bi berdewamî, berdewamîkî.
 INCEST, *n.* : daketina xizmên nêzîk, nihandina mirovên nêzîk.
 INCESTUOUS, *adj.* : pêwendîdarê daketina mirovên nêzîk.
 INCESTUOUSLY, *adv.* : bi daketiniya nerewa.
 INCESTUOUSNESS, *n.* : daketinîtiya nerewayî.
 INCH, *n.* : pîvana dirêjiyê (yek ji diwazdehî pêyê), 2,54 sentîmetir : inç.
 INCH, *vt.i.* : hêdî çûn (bi inçan),
 INCHASING, *n.* : qurdanîn.
 INCHED, *adj.* : inçkirî.
 INCHER, *ll.* : şeşînç.
 INCHMEAL, *adv.* : bereber.
 INCHOATE, *adj.* : seretayî.
 INCHOATELY, *adv.* : bi seretayî, seretakî.
 INCHDATENESS, *n.* : seretayîfî, INCHOATIVE, *adj.* : mijar.
 INCHDATIVELY, *adv.* : bi mijari, mijarkî.
 INCIOENCE, *n.* : serhatin, ketin, kewtin.
 INCIOENT, *n., adj.* : helketin, bûyer, qewmîn, bûnebûn.
 • LIGHT : ronahiya l<eti; 'r.~nakî kewtî.
 INCIOENTAL, *adj.* : helketinî.) INCIDENTALLY, *adv.* : bi hel{etinî, helketinkî.
 INCINERATE, *oi.* : sotin, şewitandin.
 INCINERATEO, *adj.* : sofî, şewitandî.
 INCINERATING, *n.* : sotin, şewitandin.
 INCINERATDR, *n.* : şewate.

INCIPIENCE OR INCIPIENCY, *n.* : destpêk.
 INCIPIENT, *adj.* : seretayî.
 INCIPIIT, *n.* : yekem peyivên kitêbê. INCIRCLE,
n. : çemereya dorgirtî, çemerey dewrediraw.
 INCISE, *vt.* : kelişandin, neqş kirin. INCISEO,
adj. : kelişandî, kizikirî, neqş-kiri.
 INCISING, *'no* : kelişandin, birrîn.
 INCISION, *n.* : birrîn, ke Iş, tîjî.
 INCISIVE, *adj.* : tîj, tûj, birrinde.
 INCISIVELY, *adv.* : bi tîjî, tîjîkî,
 INCISIVENESS, *n.* : tîjîtî, tûjîtî. INCISOR,
adj. : tîj, tûj.
 • TEETH : didanên tîj.
 INCIYAYION, *n.* : navtêdan.
 INCITE, *vt.* : arandin, hajotin, şarandin.
 INCITEO, *adj.* : arandî, şarandî. INCITEMENY, *n.* :
 arandin, navtêdan, han, fêt.
 INCIYING, *n.* : şarandin, arandin, handan.
 INCIVILITY, *n.* : rewîşt, reqîtî.
 INCIVISM, *n.* : xinizîtî, bêemekîtî bo wela-
 tî.
 INCLEMENCY, *n.* : bêdilovanî.
 INCLEMENY, *adj.* : nedilovan, dilreq.
 INCLEMENTLY, *adv.* : bi bêdilovanî, bi dil-
 reqî, bêdilovankî,
 INCLINABLE, *adj.* : piştgîr, niyazbar, hewes
 bar.
 INCLINATION, *n.* : arezû, daçemandin, dil-
 heyîn, nişîvî, hewes, gêwili, larî, xulbûn.
 INCLINE, *vi.t.* : niyaz kirin, çemîn, ladan,
 nişîv bûn, xwehr bûn.
 INCLINEO, *adj.* : nişîv, xwar, xahr, lar, xêç,
 xwehr.

INCLINING, *n.* : daçemandin.
 INCLINOMETER, *n.* : nişîvpîv,
 INCLUABLE, *adj.* : jêgirtinbar, têdexistinbar.
 INCLUOE, *vt.* : kirin navde, jêgirtin, têde
 xistin.
 INCLUOED, *adj.* : jêgirtî, ketî navde, têdexistî.
 • ANGLE : goşeya jêgirtî.
 INCLUOING, *n.* : jêgirtin, têdexistin.
 INCLUSION, *n.* : têdexistin, qîmkirin.
 • BODY : lêşê têdexistinê (di nav xaneyaya
 vîrûsê de).
 INCLUSIVE, *adj.* : hemûkî.
 INCLUSIVELY, *adv.* : bi hemûkî, hemûkî .
 INCLUSIVENESS, *n.* : hemûkîtî. INCOERCIBLE,
adj. : nekotekbar. INCOGITANT, *adj.* : hol.
 INCOGNIYA, *adj.* : nihênî (nav), nepenî.
 INCOGNITO, *adj., ado., n.* : nihênî, bi nihê-
 nî, nepenî, nepenîkî.
 INCOGNIZABLE, *Adj.* : nezanbar. INCOGNIZANT,
adjf. : bê hay, bê zanîn, ne
 ageh.
 INCOHERENCE, *n.* : şaşbûn, piçikîn, nerohnî.
 INCOHERENCY, *n.* : şaşbûn, piçikîn, nerohnî.
 INCOHERENT, *adj.* : şaş, piçikî. INCOHERENTLY,
ado. : bi şaşî, bi piçikî,
 şaşîkî.
 INCOHESIVE, *adj.* : nesift.
 INCOMBUSTIBILITY, *n.* : nesotinbarîtî.
 INCOMBUSTIBLE, *adj.* : nesotinbar.
 INCOME, *n.* : dahat, destketin, dirav, hatin,
 deramet.
 - TAX : bacî deskewt, baca daha ti, hatane.

INCOMER, *n.* : koçer, hafî.
 INCOMING, *n.* : hatin, dahatî.
 INCOMINGS, *n.* : deramet.
 INCOMMENSURABILITY, *n.* : nepîvanbarîfî, kêrnehatin, nehevtayîfî.
 INCOMMENSURABLE, *adj.* : nepîvanbar, nekêrhatî.
 INCOMMENSURATE, *adj.* : kêrnehatî, nehevtayî.
 INCOMMODE, *vt.* : şepirze kirin, caris kirin, bêzar kirin.
 INCOMMODOED, *adj.* : şepirzekirî, bêzarkirî.
 INCOMMODOING, *n.* : şepirzekirin, bêzarkinn.
 INCOMMODOUS, *adj.* : teng, kêrnehatî.
 INCOMMODOUSLY, *adv.* : bi tengî, tengîkî.
 INCOMMODOUSNESS, *n.* : bêzarîfî, tengîfî.
 INCOMMODITY, *n.* : bêzarîû, tengîfî.
 INCOMMUNICABILITY, *n.* : negehînbarîfî.
 INCOMMUNICABLE, *n.* : negehînbar.
 INCOMMUNICABLY, *adu.* : bi negehînbarî, negehînbarîkî.
 INCOMMUNICADO, *adj.* : zîndankirî.
 INCOMMUNICATIVE, *adj.* : razgir, kêm axiftin.
 INCOMMUTABLE, *adj.* : neguhêzbar.
 INCOMMUTABLY, *adv.* : bi neguhêzbarî, neguhêzbarîkî.
 INCOMPACT, *adj.* : nedagirtî. INCOMPARABILITY, *n.* : bêqamîfî, bêhevtayî fî.
 INCOMPARABLE, *adj.* : bêqam, bêhevtâ.
 INCOMPARABLENESS, *n.* : bêqamîfî, bêhevtayîfî.
 INCOMPATIBILITY, *n.* : pêknekirinbar.
 INCOMPATIBLY, *adv.* : bi pêknekirinbarî, pêknekirinbarkî.

INCOMPETENCE, *n.* : bêşiyân, bêjêhatin.
 INCOMPETENCY, *n.* : bêşiyân, bêjêhatin.
 INCOMPETENT, *adj.* : bêşiyânî. INCOMPETENTLY, *adv.* : bi bêşiyânî, bêşiyankî.
 INCOMPLETE, *adj.* : nîm, kêm, kem, pandîros, netemam, netekûz.
 INCOMPLETELY, *adv.* : bi kêmî, kêmîkî.
 INCOMPLETENESS, *n.* : kêmiti, netekûzîti.
 INCOMPLIANCE, *n.* : reqî, pênekirin.
 INCOMPLIANT, *adj.* : rikdar, req.
 INCOMPREHENSIBILITY, *71.* : netêgehiştinbarîfî.
 INCOMPREHENSIBLE, *adj.* : netêgehiştî.nbar.
 INCOMPREHENSIBLENESS, *n.* : netegehiştinbarîfî.
 INCOMPREHENSIBLY, *adv.* : bi netêgehiştinbarî, netêgehiştî.nbarkî. *J*
 INCOMPREHENSION, *n.* : netêgehiştî.n.
 INCOMPRESSIBILITY, *11.* : nepestanbarîfî.
 INCOMPRESSIBLE, *adj.* : nepestanbar.
 INCOMPRESSIBLY, *adv.* : bi nepestanbarî, nepestanbarkî.
 INCOMPUTABLE, *adj.* : nehejmarbar.
 INCOMPUTABLY, *ado.* : bi nehejmarbarî, nehejmarbarkî.
 INCONCEIVABILITY, *n.* : dorebarîfî.
 INCONCEIVABLE, *adj.* : dorebar.
 INCONCEIVABLENESS, *n.* : dorebarîfî.
 INCONCEIVABLY, *adv.* : bi dorebarî, dorebarkî.
 INCONCINITY, *n.* : kêrnehatî.
 INCONCLUSIVE, *adj.* : nevebirr, nebiryar.
 INCONCLUSIVELY, *adv.* : bi nevebirrî, nevebirrekî.
 INCONCLUSIVENESS, *n.* : nevebirrîfî.

INCONDENSABLE

INCONDENSABLE, *adj.* : nexestbar. INCONDITE, *adj.* : bêkêrnivîsî. INCONFORMITY, *n.* = NONCONFORMITY. INCONGRUENCE, *n.* = INCONGRUITY. INCONGRUENT, *adj.* : nehevyeq.
 INCONRRUEN-LY, *adu.* : bi nehevyeqî, nehevyeqîkî,
 INCONGRUITY, *n.* : têvelîtî, berhelistin.
 INCONGRUOUS, *adj.* : têvel, berhelist.
 INCONGRUOUSLY, *ado.* : bi têvelî, têvelîkî,
 INCONSCIENT, *adj.* : bêhiş.
 INCONSECUTIVE, *adj.* : nepeyhatî.
 INCONSECUTI-ELY, *ado.* : bi nepeyhatî, nepeyhatîkî.
 INCONSECUTIVENESS, *n.* : nepeyhatîfî,
 INCONSEQUENCE, *n.* : negiringî, nejîrbêjî.
 INCONSEQUENT, *adj.* : negiring, nejîrbêj.
 INCONSEQUENTIAL, *adj.* : negiring, nejîrbêj.
 INCO-SE---NTIA-L~, *adv.* : bi negiringî, bi nejîrbêjî, negmngîkî, nejîrbêjîkî.
 INC-NS-a, UENTLY, *adt.* : bi negiringî, negiringîkî.
 INCONSIDERABLE, *adj.* : kêq, kem.
 INCONSIDERABLENESS, *n.* : kêqîfî.
 INCONSIDERABLY, *adu.* : bi kêqî, kêqîkî.
 INCONSIDERATE, *adj.* : hol. INCONSIDERATELY, *adv.* : bi helî, holîkî. INCONSIDERATENESS, *n.* : holîfî. INCONSIDERATION, *n.* : halî.
 INCONSISTENCY, *n.* : nerêkî, nejîrbêjî, nesift.
 INCONSISTENT, *adj.* : nerêq, nejîrbêj,
 INCONSISTENTLY, *adv.* : bi nesiftî, nesiftîkî.
 INCONSOLABLE, *adj.* : nebehîbar.
 INCONSOLABLENESS, *n.* : nebehîbarîfî.

INCONVERTIBLY

INCONSOLABLY, *adv.* : bi nebehîbarî nebehîbarîkî.
 INCONSONANCE, *n.* : nesazî.
 INCONSONANT, *adj.* : nesaz.
 INCONSPICUOUS, *adj.* : nediyar.
 INCONSPICUOUSLY, *adv.* : bi nediyarî, nediyarîkî.
 INCONSPICUOUSNESS, *n.* : nediyarîfî.
 INCONSTANCY, *n.* : demdemîfî.
 INCONSTANT, *adj.* : demdemî.
 INCONSTANTLY, *adv.* : bi demdemî.
 INCONSUMABLE, *adj.* : netêçûnbar.
 INCONSUMABLY, *adu.* : bi netêçûnbarî, netêçûnbarîkî,
 INCONTESTABILITY, *n.* : vebîrrîfî, neberhevdanbarîfî,
 INCONTESTABLE, *adj.* : vebîrr, neberhevdanbar.
 INCONTESTABLY, *adv.* : bi vebîrrî, vebîrrîkî.
 INCONTINENCE, *n.* : zayendbazî, rîtin û mizkirina bêhemdî.
 INCONTINENT, *adj.* : zayendbaz : nesaxê dirît û mîz dîkî bêhemdî.
 INCONTINENTLY, *adv.* : di cih de, demûdest, demûdestkî.
 INCONTROLLABLE, *adj.* : neraserbar.
 INCONTROVERTIBLE, *adj.* : neberhevdanbar.
 INCONTROVERTIBLY, *adv.* : bi neberhevdanbarî, neberhevdanbarîkî.
 INCONVIENCE, *n.* : perîşanî, carîsî, tengavî.
 INCONVENIENCY, *n.* : perîşanî, carîsî, tenga vî.
 INCONVENIENT, *adj.* : carîs.
 INCONVENIENTLY, *adv.* : bi carîsî, carîskî.
 INCONVERTIBILITY, *n.* : neguhêrbarîfî.
 INCONVERTIBLE, *adj.* : neguhêrbar.
 INCONVERTIBLY, *adv.* : bi neguhêrbarî, neguhêrbarîkî.

INCONVINCIBLE, *adj.* : neqayilbar.
 INCOORDINATE: nerêkxistin. INCORPORABLE,
adj. : neyekkirinbar. INCORPORATE, *adj.* :
 yekbûyî, yekgirtî. INCORPORATE, *Vt.i.* : yek
 dan, yek girtin,
 yek bûn, damezrandin, (yekîfî yan
 hevkarî).
 INCORPORATED, *adj.* : yekgirtî, yekbûyî,
 radedar.
 INCORPORATING, *n.* : yekkirin, yekgirtin.
 INCORPORATION, *n.* : têdexistin, hevkinin,
 yekbûn, damezrandin (yekîfî yan
 hevkarî).
 INCORPOREAL, *adj.* : giyanî.
 INCORPOREALLY, *adv.* : bi giyanî, giyanîkî.
 INCORPOREITY, *ll.* : neleşî, nemadeyî,
 wateyîfî.
 INCORRECT, *adj.* : nesaz, nerast, pandîros.
 INCORRECTLY, *adv.* : bi nerastî, bi çewtî,
 çewtîkî.
 INCORRECTNESS, *n.* : nerastîfî, çewtîfî.
 INCORRIGIBILITY, *n.* : nerastkirinbarîfî.
 INCORRIGIBLE, *adj.* : nerastkirinbar.
 INCORRIGIBLENESS, *n.* : nerastkirinbarîfî.
 INCORRIGIBLY, *adv.* : bi nerastkirinbarî,
 nerastkirinbarîkî.
 INCORRUPT(ED), *adj.* : pak, nerizî.
 INCORRUPTIBLE, *adj.* : ne rizîbar.
 INCORRUPTIBLY, *adv.* : bi pakî, pakîkî, bi
 nerizîbarîkî.
 INCORRUPTION, *adj.* : nerizîbûn, pakî.
 INCRASSATE, *adj.* : pejbûnî.
 INCREASE, *n.* : pitirbûn, pêtirbûn, serbar,
 sermûçe, zorbûn, pere.
 INCREASE, *ui.* : pitir bûn, pitir kirin.
 INCREASED, *adj.* : pitirbûyî, pitir kirî.
 INCREASING, *ll.* : pitirbûn, pitirkinin.

INCREATE, *adj.* : ne afirandî.
 INCREOIBILITY, *n.* : bêbawerbarîfî. INCREDIBLE,
adj. : bêbawerbarî. INCREDIBLENESS, *n.* :
 bêbawerbarîfî. INCREDIBLY, *adv.* : bê
 bawerbarî, bêba-
 werbarîkî.
 INCREDULITY, *n.* : bêbawerîfî.
 INCREDULOUS, *adj.* : bêbawer. INCREDULOUSLY,
adv. : bi bêbawerî, bêba-
 werkî.
 INCREMENT, *n.* : pitirbûn, serbar.
 INCREMENTAL, *adj.* : serbarî. INCREMENTALLY,
adv. : bi serbarî, serbarîkî. INCRESCENT, *adj.* :
 şîn, werar.
 INCRETION, *ll.* : derkirina hindurî, hormon.
 INCRIMINATE, *Vt.* : sûcdar kirin, tawanbar
 kirin.
 INCRIMINATEO, *adj.* : tawanbarkirî, sûc-
 darkirî.
 INCRIMINATING, *n.* : tawanbarkirin, sûc-
 darkirin.
 INCRIMINATION, *n.* : tawanbarkirin, sûc-
 darkirin.
 INCRIMINATORY, *adj.* : tawandar, sûcdar.
 INCRUST = ENCRUST.
 INCRUSTATION, *n.* : deq.
 INCUBATE, *Oti.* : kurk bûn, guhartin.
 INCUBATEO, *adj.* : kurkboyî. INCUBATING,
n. : kurkbûn. INCUBATION, *n.* : kurkbûn.
 INCUBATIVE, *adj.* : kurkldar).
 INCUBATOR, *n.* : balindeyê kurko
 INCUBATORY, *adj.* : kurko
 INCUBUS, *n.* : bedgiyan, şevpest, mêt-
 dezme.

INCULCATE, *vt.* : hînkirin, fêrkirin.
 INCULCATED, *adj.* : hînkirî, fêrkirî.
 INCULCATING, *n.* : hînkirin, fêrkirin.
 INCULPABILITY, *n.* : dawpakîti, bêûcbarîti.
 INCULPABLE, *adj.* : dawpak, bêûcbar.
 INCULPATE, *vt.* = INCRIMINATE.
 INCULPATION, *n.* : sûcdarkirin, tawanbar-kirin.
 INCULPATORY, *adj.* : sûcdarkirî.
 INCULT, *adj.* : req, rûqayim.
 INCUMBENCY, *n.* : berpirsyarî, erk, fer-manbarî.
 INCUMBENT, *adj.* : berpirsyar, erkdar.
 INCUMBER, *vt.* = ENCUMBER.
 INCUR, *vt.* : keftinber, têkeftin.
 INCURABILITY, *n.* : bêçarebarîti, bêçareyîti.
 INCURABLE, *adj.* : bêçare.
 - DISEASE: derdê bêderman yan bêçare.
 INCURABLENESS, *n.* : bêçareyîti.
 INCURABLY, *adv.* : bi bêçareyî, bêçarekî.
 INCURIOS, *adj.* : nezanxwaz, bê meraq.
 INCURIOSITY, *n.* : nezanxwazîti, bê meraqî.
 INCURED, *adj.* : ketîber, têketî, têxistî.
 INCURRENCE, *ll.* : têketin, rêxistin, berketin.
 INCURRING, *n.* : tûşbûn, ketinber, têxistin.
 INCURSION, *ll.* : êrîş, hêrîş, pelamar.
 INCURSIVE, *adj.* : nijdedar, nijdeyî.
 INCURVATE, *adj.* : badayî.
 INCURVATE, *vt.* : badan.
 INCURVE, *n.* : badan.
 INCURVE, *vt.i.* : badan.
 INCUS, *ll.* : hestîkê sindanê guhî. INCUSE, *adj.*, *ll.* : lédana li ser diravî.

INCUSE, *vt.* : lê dan, çesandin.
 IND-, INDI- OR INDO-, *pref.* : pêşgir e ko şîn e.
 IND- OR INDO-, *pref.* : pêşgir e ko Hind yan Hindûewropî ye.
 INDEBTED, *adj.* : deyndar.
 INDEBTEDNESS, *n.* : deyndarîti.
 INDECENCY, *n.* : xirabkarî, şermî. INDECENT, *adj.* : şerm, xirabkar. INDECENTLY, *adv.* : bi bêşermî, bêşermîkî. INDICEPHERABLE, *adj.* : aloz, (şifre) nevekirbar.
 INDECISION, *n.* : bêbiryarî, dudilî, şaşman.
 INDECISIVE, *adj.* : nevebirr, demdemî.
 INDECISIVELY, *adv.* : bi nevebirrî, nevebirrîkî.
 INDECISIVENESS, *n.* : nevebirrîti.
 INDECLINABLE, *adj.* : req, neguhêrbar.
 INDECOMPOSABLE, *adj.* : nerizinbar, neşîtelbar.
 INDECOROUS, *adj.* : bê rûmet, bê şerm.
 INDECOROUSLY, *adv.* : bi bêrûmetî, bêrûmetkî.
 INDECOROUSNESS, *n.* : bêrûnetîti.
 INDECORUM, *n.* : bêrûmetî.
 INDEED, *ado., inier.* : bi rastî, temez, eseh, rastî.
 INDEFATIGABILITY, *ll.* : neqerimînbarîti.
 INDEFATIGABLE, *adj.* : neqerimînbar, newestanbar.
 INDEFATIGABLENESS, *n.* : neqerimînbarîti, newestanbarîti.
 INDEFATIGABLY, *adv.* : bi newestanbarî, neqerimînbarîkî.
 INDEFEASIBILITY, *n.* : nehelweşinbarîti.
 INDEFEASIBLE, *adj.* : nehelweşinbar.
 INDEFEASIBLY, *adv.* : binehelweşinbarî, nehelweşinbarîkî.

- INDEFECTIBLE, *adj.* : bêçewtî, berdewamî, neçewtbar, mayî, nemir.
- INDEFENSIBILITY, *n.* : neberevanbarîti.
- INDEFENSIBLE, *adj.* : neberevanbar.
- INDEFENSIBLY, *adv.* : bi neberevanbarî, neberevanbarîkî.
- INDEFINABILITY, *adv.* : bi nebervanbarî, nebervanbarîkî.
- INDEFINABILITY, *n.* : nediyarkirinbarî(tî).
- INDEFINABLE, *adj.* : nediyarkirinbar.
- INDEFINABLENESS, *n.* : nediyarkirinbarî.
- INDEFINABLY, *adv.* : bi nediyarkirinbarî, nediyarkirinbarkî.
- INDEHISCENT, *adj.* : girtî (nevekirî) demê gehîştinê.
- INDELIBLE, *adj.* : nerakirbar, jêneçûyî (wek murekebê).
- INDELICACY, *n.* : bêrûmetî, rûqayimî,
- INDELICATE, *adj.* : dilreq, bêrûmet, rûqayim.
- INDEMNIFICATION, *n.* : şûndan. dabinkirin, bijardîn.
- INDEMNIFIED, *adj.* : şûnda yî.
- INDEMNIFY, *vt.* : şûn dan, dabîn kirin, bijar kirin.
- INDEMNIFYING, *n.* : şûndan.
- INDEMNITY, *n.* : şûndan.
- INDEMONSTRABLE, *adj.* : nenîşankirinbar, nedirûvbar.
- INDEMONSTRABLY, *adv.* : bi nenîşankirinbarî, nenîşandankî.
- INDENE, *n.* : avekiyek hîdrokarbonî ya qetrana rejyê.
- INDENT, *n.* : belgenome, daxwaza mîrî, belên bo karkirina biçûkekê, şagird, olam.
- INDENT, *vt. i.* : dir(r)andin (rexê belgenamê), ji rûnivîsekê pitir nivîsandin, didanî kirin, peqandin.
- INDENTATION, *n.* : zera ve, derperîn, qopan, daqopan.
- INDENTION, *n.* : kunkirin, didankirin, valatiya destpeka bendê.
- INDENTURE, *n., vt.* : belgenome (rexdir-randî), olam kirin.
- INDENTURED (SERVANT), *n.* : olam.
- INDENTURING, *n.* : desteberkirin (wek şagirdî).
- INDEPENDENCE, *n.* : serxwebûn, serbestî, serbixweyî, xweseî, serxwebûn, xwebûn.
- INDEPENDENCY, *n.* : serxwebûn.
- INDEPENDENT, *adj.* : serbixwe, serbest, xwese, serxwebûyî, serxwe.
- INDESCRIBABILITY, *n.* : neravebarîti.
- INDESCRIBABLE, *adj.* : neravebar : pitir ji rayeyê.
- INDESCRIBABLY, *adv.* : bi neravebarî, neravebarkî.
- INDESTRUCTIBILITY, *n.* : neherifinbarîti.
- INDESTRUCTIBLE, *adj.* : neherifinbar.
- INDUSTRUCTIBLY, *adv.* : bi neherifinbarî, neherifinbarkî.
- INDETERMINABLE, *adj.* : neradebar.
- INDETERMINABLY, *adv.* : bi neradebarî, neravebarkî.
- INDETERMINANCY, *n.* : nediyarkirin, neradekirin.
- INDETERMINLY, *adv.* : bi nediyarkirinî, nediyarkirinbarkî.
- INDETERMINNESS, *n.* : nediyarkirinîti.
- INDETERMINATE, *adj.* : nediyarkirî, neradekirî.
- INDETERMINATION, *n.* : nediyarkirin, neradekirin.
- INDETERMINISM, *n.* : neçarîti : baweriya serbestiya vên û helbijartinê.
- INDEX, *n.* : pêrist, rêber, naverok, tiwan, raber.

• FINGER : şikefalîs.
 • OF REFRACTION : hawkolkeya şikestinê (ronahî).
 INDEXATION, *n.* : pêristin.
 INDEXING = INDEXATION.
 INDIA, *n.* : Hindistan.
 INDIAN, *adj.* Hindî, welatîyê Hindistanê.
 • CORN : garis, zorat.
 • CORN DIL: zeyt yan rûnê garisî.
 • PEA : maşo
 • PIPE : boriya Hindî: texlîtek helez e.
 • RED : sorê ser zerî ve, axSORA ser zerî ve.
 INDIC, *adj.* : Hindî.
 INDICANT, *n.* : nîşan, derbîr.
 INDICATE, *vt.* : nîşankirin.
 INDICATED, *adj.* : nîşankirî.
 INDICATING, *n.* : nîşankirin.
 INDICATION, *n.* : nîşan, nîşankirin, hêma, rêzanî, serinc, nîşane.
 INDICATIVE, *adj.* : pêşkerî, pêşker, nîşandar.
 • MOOD : raweya pêşker.
 INDICATOR, *n.* : nîşanker, destikê demjîmêrê, pêşker, nîşander, nîşane.
 INDICATORY, *adj.* = INDICATIVE.
 INDICIUM, *n.* : nîşan.
 INDICT, *vt.* : gunehbar kirin.
 INDICTABLE, *adj.* : gunehbar.
 INDICTMENT, *n.* : gunehbarkirin.
 INDICION, *n.* : xul yan gera panzdeh salan ko Qonstantînê Romanî destpêkirî bo demê darayî.
 INDIFFERENCE, *n.* : guhnedan, pûtepênekirin, negiringî.

INDIFFERENCY = INDIFFERENCE.
 INDIFFERENT, *adj.* : putepêneker, negiring, navîn, neqenc nexirab, nêtar.
 INDIFFERENTLY, *adv.* : bi bêpûteyî, bêpûtekî.
 INDIFFERENTISM, *n.* : ne cudayîfî : baweriya ko hemî ayîn wekyek rast in.
 INDJGENE, *n.* : perîşanî, desttengî. INDIGENE, *n.* : hindurî, cîkî (giyanewer yan helezê cîkî).
 INDJGENOUS, *adj.* : cîkî, sirûştî, sirûşî.
 INDJGENOUSNESS, *n.* : sirûştîfî.
 INDIGENT, *adj.* : pepûk, hejar, tisî, destteng.
 INDIGESTED, *adj.* : negivêrandî. INDIGESTIBILITY, *n.* : negivêbarîfî. INDJESTIBLE, *adj.* : negivêrbar. INDIGESTION, *n.* : bedgivêrî, nagivêrî, dijwargivêrî, şavêrî, girift.
 INDIGESTIVE, *adj.* : nesaxê şavêrî.
 INDIGNANT, *adj.* : enirî, tore.
 INDIGNANTLY, *adv.* : bi enirîfî, bi enirîn, enirînkî.
 INDIGNATION, *n.* : enirîn, enir. INDIGNITY, *n.* : kirêt kirin, bêrûmetîfî. INDIGO, *n.* : nîl, heş, çiwît, şîn, hîs. INDIGOTIN, *n.* : heş.
 INDIRECT, *adj.* : ne êkser, nerasterê, ne yekrast.
 • PROOF : dirûva neyekrast.
 INDIRECTION, *n.* : karê neyekser, bêarmand, fêlbazî, xapandin.
 INDIRECTLY, *adv.* : neyekser, neyekserkî.
 INDISCERNIBILITY, *n.* : nediyarbarîfî.
 INDISCERNIBLE, *adj.* : nediyarbar. INDISCIPLINE, *n.* : bêbendûbarî. INDISCREET, *adj.* : şiloq, heleşe.

INDISCRETE, *adj.* : netcuda) parçekirî.
 INDISCRETION, *n.* : şaşbûn, halî.
 INOISCRIMINATE, *adj.* : bê cudayî.
 INOISCRIMINATELY, *adv.* : bi bêcudayî, bêcudakî.
 INOISCRIMINATION, *n.* : bêcudakirin.
 INDISPENSIBILITY, *n.* : pêviyanbarîfî, gerekîbarîfî.
 INOISPENSABLE, *adj.* : pêviyanbar, gerekîbar.
 INDISPENSABLENESS, *n.* : pêviyanbarîfî, gerekîbarîfî.
 INDISPENSABLY, *adv.* : bi pêviyanbarî, pêvînbarî.
 INDISPOSE, *vt.* : leşêşî kirin, kêmehatî kirin.
 INOISPOSEO, *adj.* : nesax, leş_{est}.
 INDISPOSITION, *n.* : leşê şî, sivikta.
 INDISPUTABLE, *n.* : vebirr, neberhevdanbar.
 INDISPUTABLY, *adv.* : bi vebirrî, bineberhevdanbarî, vebirrî.
 INOISSOLUBILITY, *n.* : nebujujînbarîfî, berdewam.
 I~LE, *adj.* : nebujujinbar, berdewam.
 INOISSOLUBLY, *adv.* : bi berdewamî, berdewamkî.
 INOISTINCT, *adj.* : nediyar. •
 SHAPE : tarmayî.
 INOISTINCTIVE, *adj.* : nediyardar, bînîşane,
 INOISTINCTLY, *adv.* : bi bînîşaneyî, bînîşanekî,
 INOISTINCTIVENESS, *n.* : bînîşaneyîfî.
 INDISTINGUISHABLE, *adj.* : neûzerbar.
 INOISTINGUISHABLY, *adv.* : bi neûzerbarî, neûzerbarî.
 INOISTRIBUTABLE, *adj.* : nebelavbar.

INOITE, *vt.* : vehandin (helbest), nivîsandin.
 INOIVUM, *n.* : îndiyom : hêmanek metalî spî qetlaz e (lî gel zinkî derdikevit),
 INDIVERTIBLE, *adj.* : neçepdanbar.
 INOIVIOUAL, *n., adj.* : tek, mirov, kes, zelam.
 INOIVIDUALISM, *Jl.* : kesîtiya mirovî.
 INDIVIDUALIST, *n.* : tekî : mirovê ko serbixwe hizir û karî dikit.
 INOIVIOUALITY, *n.* : kesîfî.
 INOIVIDUALIZATION, *n.* : kesîfîbûn.
 INOIVIOUALIZE, *vt.* : kesîfî kirin.
 INOIVIOUALIZED, *adj.* : kesîfîkirî.
 INOIVIDUALIZING, *n.* : kesîfîkirin.
 INDIVIOUALLY, *adv.* : bi kesî, kesîkî.
 INOIVIOUATE, *vt.* : kesî kirin, cuda kirin.
 INDIVIDUATED, *adj.* : kesîkirî.
 INDIVIOUATING, *n.* : kesîkirin.
 INOIVIDUATION, *n.* : kesîbûn. INDIVISIBILITY, *n.* : nebeşbarîfî. INOIVISIBLE, *adj.* : nebeşbar.
 INOIVISIBLY, *adv.* : bi nebeşbarî, nebeşbarî.
 INDO-, *pref.* : pêşgir e ko hindî ye. -
 ARYAN : hindûarî.
 - EUROPEAN : hindûewropî .
 - IRANIAN : hindûîranî.
 INDOCILE, *adj.* : serkêş.
 INOOCILITY, *n.* : serkêşîfî.
 INDOCTRINATE, *vt.* : hînkirin, fêrkirin.
 INOCTRINATION, *n.* : hînkirin, fêrkirin.
 INOOLE, *n.* : pêkhatiya belûrî.
 INOOLENCE, *n.* : tembelî.
 INOOLENT, *adj.* : tem bel, sist, fişel.

INDOLENTLY, *adv.* : bi tembelfi.
 INDOMITABILITY, *n.* : neşikênbarîfî.
 INDOMITABLE, *adj.* : neşikênbar.
 INDOMITABLENESS, *n.* : neşikênbarîfî.
 INDOMITABLY, *adv.* : bi neşikênbarî, neşikênbarkî.
 INDONESIAN, *n.* : hevvelatî : yan (ziman) yêlndonezî.
 INDOOR, *adj.* : hindur.
 INDOORS, *adv.* : li mal, nav avahî de (jorve).
 INDOPHENOL, *n.* : endofenol : boyeya şîn yan kesk.
 INDORSATION, *n.* : piştgirtin, rastandin.
 INDOXYL, *n.* : endoksîl : pêkhatiya belûr (di nav giyanewer û hele zî de).
 INDRAFT, *n.* (INDRAUGHT) : bayê hindurî.
 INDRAWN, *adj.* : kêsayî jorve (navde), parêzkar.
 INDUBITABILITY, *n.* : bêgumanbarîfî, rastîbarîfî, çespan.
 INDUBITABLE, *adj.* : bêgumanbar, rastîbar, çesp.
 INDUBITABLENESS, *n.* : bêgumanbarîfî, rastîbarîfî, çespan.
 INDUBITABLY, *adv.* : bi rastîbarî, rastîbarkî, bêgumanbarkî.
 INDUCE, *vt.* : han dan, qayil kirin, eger kirin, çêkirin, encam kirin.
 INDUCED, *adj.* : handayî, qayilkirî, egerkirî, encamkirî.
 INDUCEMENT, *n.* : handan, qayilkirin, pêşekiya gileyî yan berevaniyê.
 INDUCIBILITY, *n.* : hanbarîfî.
 INDUCIBLE, *adj.* : hanbar.
 INDUCING, *n.* : handan, qayilkirin.
 INDUCT, *vt.* : damezrandin, hînkirin, serbaz kirin, endam kirin, gehand in.

INDUCTANCE, *n.* : handan, hawkolke yê handanê, pêçeka handanê.
 INDUCTILE, *adj.* : nekêşanbar, nequtanbar, nenerm (serhişk).
 INDUCTION, *n.* : handan, lêgerîn, damezrîn, serbazkirin, encamkirin, pêşekî (şano), afirandin (xaneyên pizî).
 • COIL : pêçeka handanî, kilafey handan. -
 CURRENT : lozewa handanî, rewteka handanî.
 - FIELD : zeviya handanî.
 • HEATING : germkirina handanî.
 INDUCTIVE, *adj.* : handar, destpêkî, kartêkirî.
 INDUCTOR, *n.* : gehînek.
 INDULGE, *vt.* : verestîn, nermbûn, xwe têr kirin, nazdar kirin.
 INDULGED, *adj.* : verestî (xoşiyar).
 INDULGENCE, *n.* : verestîn, xwe têkîrin.
 INDULGENCED, *adj.* : verestî.
 INDULGENT, *adj.* : nerm, bêhnfireh.
 INDULGENTLY, *adv.* : bi nermî, verestinkî, nermî kî.
 INDULGING, *n.* : verestîn (xoşiyar). INDULINE, *n.* : indolîn : boyeya şîn yan binefşî.
 INDULT, *n.* : destûra papayî,
 INDUPLICATE, *adj.* : dukenarkirî.
 INDURATE, *adj., vi.* : req, rikgirtin, req kirin, dijwar kirin.
 INDURATED, *adj.* : rikdar.
 INDURATING, *n.* : rikdarîkirin.
 INDURATION, *n.* : reqbûn, dijwar bûn.
 INDUSIUM, *n.* : zirêziya perdeyî (ya îşiyên mîweyî),
 INDUSTRIAL, *adj.* : pîşesaz, pîşedar. •
 REVOLUTION : şorişa pîşesazî.

INDUSTRIALISM, *n.* : pîşesazîfî. INDUSTRIALIST, *n.* : pîşesaz. INDUSTRIALIZATION, *n.* : pîşesazîkirin. INDUSTRIALIZE, *vt. i.* : pîşesazîkirin. INDUSTRIALIZED, *adj.* : pîşesazîkirî. INDUSTRIALIZING, *n.* : pîşesazîkirin. INDUSTRIOUS, *ndj.* : xebatkêr, bizavker, kedker, rêncber.

INDUSTRY, *n.* : pîşesazî, sazkarî.

INDWELL, *vi. t.* : nişt bûn.

INDWELLER, *n.* : nişteçî.

-INE, *suff.* : paşgir e ko ji ..., çêkirî ye ji

INEBRIANT, *adj., n.* : mestbar, şeraba mestî.

INEBRIATE, *vt.* : mest kirin, serxoş kirin.

INEBRIATE(D), *adj.* : mest, serxoş.

INEBRIATING, *n.* : mestkirin, serxoşkirin.

INEBRIATION, *n.* : serxoşbûn, mestbûn.

INEBRIETY, *n.* : mestî, serxoşî.

INEDIBLE, *ndj.* : nexwarinbar.

INEDITED, *adj.* : nebelavkirî, belavkirî bê rastkirin yan bijare kirin.

INEDUCABILITY, *n.* : nehînbarîfî.

INEDUCABLE, *adj.* : nehînbar.

INEFFABILITY, *n.* : neravebarîfî,

INEFFABLE, *adj.* : neravebar-Inaêt ravekirin ko hind pîroz e).

INEFFABLENESS, *n.* : neravebarîfî. INEFFABLY, *adv.* : bi neravebarî, neravebarkî.

INEFFACEABILITY, *n.* : neheşivînbarîfî.

INEFFACEABLE, *adj.* : neheşivînbar.

INEFFACEABLY, *adv.* : bi neheşivînbarî, neheşivînbar kî.

INEFFECTIVE, *adj.* : nekarîger, bêtewş, bêhêz, sist.

INEFFECTIVELY, *adv.* : bi sistî, bi nekarîgerî, sistîkî, nekarîgerkî.

INEFFECTIVENESS, *n.* : nekarîgerîfî.

INEFFECTUAL, *adj.* : nekarîger.

INEFFECTUALITY, *n.* : nekarîgerîfî.

INEFFECTUALLY, *adv.* : bi nekarîgerî, nekarîgerîkî.

INEFFICACIOUS, *adj.* : neçalak, nekarîger.

INEFFICACIOUSLY, *adv.* : bi sistî, sistîkî.

INEFFICACIOUSNESS, *n.* : neçalakîfî.

INEFFICACY, *n.* : nekarîgerî.

INEFFICIENCY, *n.* : neçalakî, neco stî.

INEFFICIENT, *adj.* : neçalak, necost.

INELASTIC, *ndj.* : neçir, naçir, turt.

•COLLISION : lêkdana neçir.

•IMPACT : lêkdana neçir.

INELASTICITY, *n.* : necîrîfî, neçîrîfî.

INELEGANCE, *n.* : neterpûşî, neşepalî, nelewendî.

INELEGANT, *adj.* : neşepal, neşeng, net erpûş.

INELEGANTLY, *adv.* : bi neterpûşî, neterpûşîkî.

INELIGIBILITY, *n.* : nejêhatinbarîfî, nejêhatîfî.

INELIGIBLE, *adj.* : nejêhatintîbar, nejêhatî, nehêja, nemaftar, kêrnehatî.

INELOQUENT, *adj.* : nerewan.

INELOQUENTLY, *adv.* : bi nerewanî, nerewanîkî.

INELUCTABLE, *ndj.* : nebergirbar, neguhêrbar, neçarbar (mirov neşêt jê birevit).

INELUDIBLE, *adj.* : neçarbar.

INENARRABLE, *adj.* = INDESCRIBABLE.

INEPT, *ndj.* : ne hêja, kêrnehatî, gewc, ne şehreza.

INEPTITUDE, *n.* : neşehrezayî.

INEPTLY, *adv.* : bi gewd, gewcîkî.
 INEPTNESS, *n.* : kênehatin.
 INEQUABLE, *adj.* : neyekbar.
 INEQUALITY, *n.* : neyeksanîûî).
 INEQUI*, *pref.* : pêşgir e ko neyeksan e.
 INEQUILATERAL, *adj.* : nehevla, neheval.
 INEQUITABLE, *adj.* : zordar.
 INEQUITY, *n.* : zordarîti, sitemkarî, sitem.
 INERADICABILITY, *n.* : neheşivînbarîti.
 INERADICABLE, *adj.* : neheşivînbar, nehel-
 kêşanbar.
 INERADICABLY, *adv.* : bi neheşivînbarî,
 nehelkêşanbarkî.
 INERRABLE, *ndj.* : neçewtbar.
 INERRANCY, *n.* : neçewtbarî.
 INERRANT, *adj.* : neçewt.
 IN ERROR, *adj.* : çewt, hele, nerast.
 INERT, *ndj.* : neçalak, çost, sist, leşgiran,
 XAV.
 INERTIA, *n.* : danekizî, yekbarî, berdewamî.
 INERTIAL, *adj.* : yekbar.
 INERTLY, *adv.* : bi çostî, çostîkî.
 INERTNESS, *n.* : sistîti, leşgiranîti.
 INESCAPABILITY, *n.* : neçarîti, nerevînbarîti.
 INESCAPABLE, *adj.* : neçar, nerevînbar.
 INESCUTCHEON, *n.* : zirêyek biçûkê (li ser
 zirêyek mezintir).
 INESSENTIAL, *adj.* : pêneviyayî. INESTIMABLE,
adj. : bêqam hêja, naêt
 bihakirin, nebihabar.
 INESTIMABLY, *adv.* : bi hêjayî, hêjayîkî,
 INEVITABILITY, *n.* : neçarîti, neçarbarîti.
 INEVITABLE, *adj.* : neçar, neçarbar.
 INEVITABLENESS, *n.* : neçarîti, neçarbarîti.

INEVITABLY, *adv.* : bi neçarî, neçarekî.
 INEXACT, *adj.* : ne rast, netemam.
 INEXACTITUDE, *n.* : nerastîti, netemamîti.
 INEXACTLY, *adv.* : bi nerastî, bi netemamî,
 netemamîkî.
 INEXACTNESS, *ll.* : nerastîti, netemamîti.
 INEXCUSABLE, *adj.* : lêneborînbar,
 nebexşînbar.
 INEXCUSABLENESS, *n.* : lêneborînbarîti,
 nebexşînbarîti.
 INEXCUSABLY, *adv.* : bi lêneborînbarî, bi
 nebexşînbarî, nebexşînbarîkî.
 INEXECUTABLE, *adj.* : neniwandinbar.
 INEXHAUSTIBILITY, *n.* : bêmemanbarîti
 (zehfî). INEXHAUSTIBLE, *adj.* : bêmemanbar
 (zehfî). INEXHAUSTIBLY, *adv.* : bi zehfî,
 zehfîkî. INEXISTENT, *adj.* : neheyî.
 INEXORABILITY, *n.* : rikdarîti.
 INEXORABLE, *adj.* : rikdar.
 INEXORABLY, *adv.* : bi rikdarî, rikdarîkî.
 INEXPECTANT, *adj.* : neavis, nebizik, nebi-
 tişt.
 INEXPEDIENCE, *n.* : kênehatin. INEXPEDIENCY,
n. : kênehatin. INEXPEDIENT, *adj.* :
 kênehatî. INEXPEDIENTLY, *adj.* : bi
 kênehatî, kêne-
 hatîkî.
 INEXPENSIVE, *ndj.* : ne giran (erzan).
 INEXPENSIVELY, *ado.* : bi negiranî, bi erza-
 nî, negiranîkî, erzanîkî.
 INEXPENSIVENESS, *n.* : negiranîti, erzanîti.
 INEXPERIENCE, *n.* : bê serhatin.
 INEXPERIENCED, *adj.* : bêserhatî, xam.
 INEXPERT, *adj.* : neşehreza, nepispor.
 INEXPERTLY, *adv.* : bi neşehrezayî, bi
 nepisporî, nepisporîkî.

INEXPERTNESS, *n.* : neşehrezayîfî, nepi-sporîfî.

INEXPIABLE, *adj.* : nelêborînbar. INEXPIABLY, *adv.* : bi lênebirînbarî, lêneborinbarkî.

INEXPLICABILITY, *n.* : neravebarîfî, neşirovebarîfî.

INEXPLICABLENESS, *n.* : neravebarîfî.

INEXPLICABLY, *adv.* : bi neravebarî.

INEXPLICIT, *adj.* : ne eşkera, nediya.

INEXPLICITLY, *adv.* : ne eşkerayîfî.

INEXPLOSIVE, *adj.* : neteqîndar.

INEXPRESSIBILITY, *n.* : ne derbirînbarîfî.

INEXPRESSIBLE, *adj.* : nederbirrinbar.

INEXPRESSIBLY, *adv.* : **bi** nederbirrinbarî.

INEXPRESSIVE, *ndj.* : nederbirrîndar,

INEXPRESSIVELY, *adj.* : nederbirrîndarî.

INEXPRESIVENESS, *n.* : nederbirrîndarîfî.

INEXPUGNABLE, *adj.* : neheşafinbar, nerakirinbar, asê.

INEXPUGNABLENESS, *n.* : neheşafinbarîfî, asêyîfî, sextîfî.

INEXPUGNABLY, *adv.* : bi sextî, bi asêyî, asêyîkî.

INEXTENSIBLE, *adj.* : nedirêjkinbar.

IN EXTENSO, *adv.* : bi dirêjayî, dirêjkî.

INEXTINGUISHABLE, *adj.* : netemirînbar, nevekujînbar.

INEXTINGUISHABLY, *adv.* : bi netemirînbarî, nevekujînbarî.

IN EXTREMIS : li ber mirinê.

INEXTRICABILITY, *n.* : alozîfî, alozbarîfî.

INEXTRICABLE, *adj.* : alozbar.

INEXTRICABLY, *adv.* : bi alozbarî, alozbarîkî.

INFALLIBILISM, *n.* : neketinbarîfî, bêçewtîfî : baweriya ko Papa bê çewtî ye.

INFALLABILITY, *n.* : neketinbarîfî, bêçewtîfî.

INFALLIBLE, *adj.* : neketinbar, bêçewtî, neçewtbar.

INFAMIZE, *vt.* : bêrûmet kirin, bed nav kirin.

INFAMOUS, *adj.* : bednav, bednaw.

INFAMOUSLY, *adv.* : bi bednavî, bednavîkî.

INFAMY, *n.* : bednavî, riswayî.

INFANCY, *n.* : savayî.

INFANT, *adj., n.* : sava, memikmij, şîrmij.

- SUCKLING - : sava.

INFANTE, *n.* : kurkê sava.

INFANTICIOAL, *adj.* : savakuj.

INFANTICIOE, *n.* : sava kujî.

INFANTILE, *adj.* : savayî.

- ECZEMA : êzmik.

- OIARRHEA : virçik.

- PARALYSIS : falinc yan şehtiya biçûkan.

INFANTALISM, *n.* : savayîfî, zarokîfî.

INFANTALIZATION, *n.* : savayîkirin.

INFANTALIZE, *n.* : savakirin.

INFANTALIZEO, *adj.* : savakirî.

INFANTALIZING, *n.* : savakirin.

INFANTINE, *adj.* = INFANTILE (savayî, zarokî).

INFANTRY, *n.* : peyade.

- MAN : serbazê peyade.

INFARCT, *n.* : piniya tevnê mirî (ji ber negehiştina xwînê).

INFARCTION, *n.* : bestin, girtin, tijîbûn.

INFARE, *n.* : pêşwaziya bûk û zavayî.

INFATUATE, *adj.* : şeyda.

INFATUATE, *vt.* : şeyda kirin, dêwane kirin.

INFATUATED (BY), *adj.* : şeydalkirî bi), dêwane.

INFATUATING, *n.* : şeydakirin.

INFATUATION, *n.* : şeydabûn.

/INFEASIBILITY, *n.* : nekirdarbarîfî, neni-
wandinbarîfî.

INFEASIBLE, *adj.* : nekirdarbar, neniwandinbar.

INFECT, *vt.* : vegirtin, pîs kirin, nesax kirin.

INFECTED, *adj.* : vegirtî, nesaxkirî. •

WITH SMALLPOX : rûxûrî(k).

INFECTION, *n.* : kotîbûn, teşene, kulbûn,
vegirtin.

INFECTIOUS, *adj.* : vegir, kotî, dirm, peta,
jêkvegir, lêkvegir.

• DISEASE : nexoşiya jêkvegir.

INFECTIOUSNESS, *n.* : vegirîfî.

INFECTOR, *n.* : vegirker.

INFELICIFIC, *adj.* : kêrnehatî, xembar.

INFELICITOUS, *adj.* : kêrnehatî, nebexte-
wer.

INFELICITOUSLY, *adv.* : bi nebextewerî,
nebextewerkî.

INFELICITY, *n.* : nebextewerîfî, xemdarîfî,
nebextiyarîfî, têbîniya pûç.

INFER, *vt.i.* : nişan kirin, diyar kirin, xeml
kirin, encam kirin.

INFERENCE, *n.* : encamkirin, nişan, nişandan.

INFERENTIAL, *adj.* : nişandanî. INFERENTIALLY,
adv. : bi nişandanî, nişandanîkî.

INFERIOR, *adj.* : sik, bed, kotî, jêr, nizim-
tir, neşehreza, (paye) kêmtir.

INFERIORITY, *n.* : kotîfî, bedîfî, sikîfî.

INFERIORLY, *adv.* : bi kotî, bi sikî, kotîkî,

INFERNAL, *adj.* : dojhê,

INFERNALLY, *adv.* : bi dojhê, dojhêkî.

INFERNO, *n.* : gurîn, gurî, kana agirî.

INFERO-, *pref.* : pêşgir e ko jêr e.

INFERRER, *adj.* : nişankirî.

INFERRING, *n.* : nişankirin.

INFERTILE, *adj.* : bêpêz, bêber.

• LAND: XEŞOV.

INFERTILITY, *n.* : bêberîfî, bêpêzîfî.

INFEST, *vt.* : şepirze kirin, êriş kirin, dagîr
kirin (pêtîk, kulî ...).

INFESTANT, *adj.* : dagîrker, vegir.

INFESTATION, *n.* : dagîrkirin, êrişkirin

(kuli..J.

INFESTER, *n.* : dagîrker, êrişker.

INFIBULATION, *n.* : girêdana şermecêyan (bo
nehêlana daketinê).

INFIDEL, *adj.* : bê ol yan ayîn.

INFIDELITY, *n.* : bêolîfî, bêayînfî, xinizî,
xirabkariya mêrî yan jinê.

INFIELD, *n.* : zeviya nik malê, meydan.

INFIGHTING, *n.* : şerkirina nêzik, kulmba-
ziya nêzik.

INFIL, *vt.* : tijî kirin (kilorî).

INFILTRATE, *vt.i.* : delandin, (bi dizîkî ve)
çûn nav dûjminî de.

INFILTRATED, *adj.* : delînkirî.

INFILTRATING, *n.* : delînkirin.

INFILTRATION, *n.* : delîn, delandin, têreçûn,
sûrikandin.

INFILTRATOR, *n.* : sûrikî.

INFINITE, *adj., n.* : bêpayan, bêrade,
bêdûmahî, bêdawî, bêkutayî,
nediyarkirî.

• DILUTION : ronbûna bêrade.

• SERIES : zincîreya bêdûmahî, INFINITELY,
adv. : bi bêra de, bi bêdawî, bêradekî.

INFINITENESS, *n.* : b'ê~ INFINITESIMAL, *adj.*, *n.*
: pirtik (parçeyek
bêqam biçûk).
INFINITIVAL, *adj.* : jêderî.
INFINITIVE, *adj.* : rader, çawig, jêder.
INFINITIVELY, *adv.* : bi raderî, raderkî.
INFINITUOE, *n.* : bédûmahî, bédawî,
bêkutayî.
INFINITY, *n.* : bédûmahîtî, bédawîtî.
INFIRM, *adj.* : lawaz, dudil, zerbiçî.
INFIRMARIAN, *n.* : tûmargehvan.
INFIRMARY, *n.* : tûmargeh, nexoşxane.
INFIRMITY, *n.* : nesaxî, lawazî, binesaxî,
nesaxîkî.
INFIX, *ll.* : navîn.
INFIX, *vt.* : têre kirin, avî kirin, çespandin.
INFLAME, *vt.i.* : şewitandin, gurî girtin.
INFLAMEO, *adj.* : girgîn, rivînkirî, gurîgir-
tî, gurîkirî.
INFLAMING, *n.* : rivînkirin, gurîkîrin, gur-
kîrin.
INFLAMMABILITY, *n.* : gurîbarîtî, agirgirîtî.
INFLAMMABLE, *adj.* : gurîbar, agirgir, agirîn.
INFLAMMATION, *n.* : kul, kulik, kulî, kul-
bûn, alyan, amas, sorbûn.
INFLAMMATORY, *adj.* : gurîdar, handar, kul-
bûnî, sorbûnî, arandinî, têkvedanî.
INFLATABLE, *adj.* : pufdar.
INFLATE, *vU.* : puf dan, puf kirin.
INFLATEO, *adj.* : pufkirî.
INFLATING, *n.* : pufkîrin.
INFLATION, *n.* : pare yan dirav zorî, awsan,
pufbûn, enflasyon.
INFLATIONISM, *n.* : parezorîtî, pufbûnîtî : ko
pare zehf dibin vêca kêmbiha dibin,
enflasyonîzm.

INFLATIONIST, *n.* : piştgirê parezorîtiyê.
INFLECT, *vt.i.* : çemandin, badan, rêziman:
dûmahiya peyivê diguhorit bo
derbîrrîna pêwendîya rêzimanî mûzîqe :
tûj kirin.
INFLECTION, *n.* : çemandin, çivandin.
INFLECTIONAL, *adj.* : çivandinî.
INFLECTIONALLY, *adv.* : bi çivandinî,
çivandinkî.
INFLECTIOUS, *adj.* : çivandî, alandî.
• OISEASE : nexoşiya têkvegir.
INFLECTIVE, *adj.* : guhêr (peyiva guhartî).
INFLEXED, *adj.* : guhartî, çemandî.
INFLEXIBILITY, *n.* : neguhêrbarîtî, negu-
hêr, reqîtî, pitewî.
INFLEXIBLE, *adj.* : neguhêr (bar), req,
bênermî, neçemîn.
INFLEXIBLY, *adv.* : bi reqî, neçemînekî,
reqîkî,
INFLEXION, *n.* : veçemîn, çemandin,
çivandin.
INFLICT, *vt.* : lê dan, siza kirin, tûş kirin.
INFLICTABLE, *adj.* : lêdanbar.
INFLICTION, *n.* : lêdan, sizakirin, derd.
INFLICTIVE, *adj.* : lêdandar.
INFLORESCENCE, *n.* : gulbûn.
INFLORESCENT, *adj.* : guldayî.
INFLOW, *n.* = INFLUX.
INFLUENCE, *n.* : destçûnî, kartêkîrin, dest-
helatî, bandûr, têçûn, gozerkîrin.
INFLUENCEO, *adj.* : kartêkîrî,
INFLUENCING, *n.* : kartêkîrin.
INFLUENT, *adj.*, *n.* : zê, vizikî, rûbark, çem.
INFLUENTIAL, *adj.* : desthelatdar, destdi-
rêj bandûrî.
INFLUENTIALY, *adv.* : bi bandûrî, bi dest-
helatdarî, bandûrîkî.

IHFLUEHZA, *n.* : înfilowenza : persîva giran, peta.
 IHFLUX, *n.* : rêjgeya rûbarî, vizik.
 IHFOLO, *Vt.i.* : pêçin, bergkirin.
 INFORM, *Vt.i.* : dan zanîn, ragehandin.
 INFORMAL, *adj.* : nemîrî.
 IHFORMAITY, *n.* : asayî, nemîrîfî. INFORMALLY, *adv.* : bi nemîrî, nemirikî. INFORMANT, *n.* : sîxor, paşbêj, xeberdok. INFORMATICS, *n.* : ragehînzanî. INFORMATION, *n.* : ragehîn, agehkirin, agadarî, zanyarî, berat, ragehandin, nûçe, salox, agehî.
 • BUREAU : pirsgeh.
 - MEDIA: awayên ragehandinê .
 SCIENCE : ragehînzanî.
 INFORMATIVE, *adj.* : rewşenbîr.
 INFORMED, *ndj.* : zana, bilyan, jîr, hînkiri, ragehandî,
 INFORMER, *n.* : saloxdar, sîxor, paşbêj, qomsî, nûçebêj.
 INFORMING, *n.* : danezanîn, nasandin, ragehandin, agehkirin, dazanîn.
 - AGAINST: teşqe, sîxorî,
 INFRA, *pref.* : pêşgir e ko jêr e, bin e.
 INFRACT, *Vt.* : çirandin, gelşî kirin.
 INFRACTION, *n.* : çirandin.
 INFRANGIBLE, *adj.* : neçirînbar.
 IHFRARED, *adj.* : jêrsor,
 INFRASONIC, *adj.* : jêrbihîs.
 INFRA SPECIFIC, *adj.* : texlîtek taybet.
 INFRASTRUCTURE, *n.* : jêravahî.
 INFREQUENCY, *n.* : kêmiş, kêmiş caran.
 INFREQUEHT, *adj.* : kêmiş.
 INFREQUENTLY, *adv.* : bi kêmiş, kêmişî.

INFRINGE, *Vt.i.* : çirandin, bêrûmet kirin, destdirêjî kirin.
 INFRINGED, *adj.* : çirandî, destdirêjîkirî.
 INFRINGEMENT, *n.* : destdirêjî, peyivşikandin.
 INFRINGING, *n.* : çirandin, destdirêjîkirin.
 INFRUCTESCENCE, *n.* : bemegirtin, mîwe-nebûn, mîwenedan.
 INFUNOIBULAR, *adj.* : kovikî,
 INFUNDIBULIFORM, *adj.* : kovikî.
 INFUNDIBULUM, *n.* : kovik.
 INFURIATE, *adj.* : enir, torebar.
 INFURIATE, *Vt.* : enirandin, har kirin.
 INFURIATED, *adj.* : enirandî, harkirî .
 INFURIARING, *n.* : enirandin, harkirin.
 INFURIATINGLY, *adv.* : bi enirî nî, bi harî, enirinkî,
 INFUSE, *Vt.* : têkirin, şilkirin, çikilandin.
 INFUSED, *adj.* : têkirî.
 INFUSIBILITY, *n.* : nebuहुjînbarîfî.
 INFUSIBLE, *ndj.* : nebuहुjînbar.
 INFUSING, 11. : têkirin.
 INFUSION, 11. : têkirin, avdan.
 INFUSORIA, 11. : giyanewerên di nav şilatiya madeyê endamî de.
 - ING, *suft.* : paşgire bo navê karan.
 - ING, *Slft.* : paşgir e ko kar be, kiryarî be.
 INGATHER, *Vt.i.* : kom kirin, kom bûn, dirin (dirûn).
 INGATHERING, *n.* : komkirin, dirin (dirûn).
 INGEMINATE, *Vt.* : dubare kirin.
 INGENIOUS, *adj.* : belîmet, helkefte, helkewto.
 INGENIOUSLY, *adv.* : bi helkefteyî, helkefekî.

INGENIOUSNESS, *n.* : helkefteyîti, belîmetî.

INGENUITY, *n.* : jîrî tî, şehreza yî, alava şehreza.

INGENUOUS, *adj.* : sade, sakar, rastbêj.

INGENUOUSLY, *adv.* : bi sakarî, sakarîkî.

INGENUOUSNESS, *n.* : sakarîti.

INGEST, *vt.* : xwarin xwarin.

INGESTA, *n.* : xurek, xwarin.

INGESTION, *n.* : xwarin.

INGESTIVE, *adj.* : xurekî.

INGLE, *n.* : koçik (kuçik, tifik), kulîn, qoncalka koçkî (kuçik, tifik).

• NOOK : gurî.

INGLORIOUS, *adj.* : ne navdar, nenas, bê abrû, bêrûmet.

INGLORIOUSLY, *adv.* : bi bê rûmetî, bêrûmetîkî.

INGLORIOUSNESS, *n.* : bêrûmetîti.

INGOJNG, *n.* : çûyînjor : pareyên kirêdar xerc dîkî Li ser çakkirinê hînga diçit jor.

INGOT, *n.* : darêje, darişte.

INGRAFT, *vt.* ::: ENGRAFT (petrume kirin).

INGRAJN, *adj., n.* : çêkirî (ji benkê rengkirî berî vehandinê), rihgirtî (di derûnî de), nişaneyî rihgirtî.

LENTOID, *adj.* : şikilnîsk.

LEO, *n.* : birca şêrî.
 LEONID, *n.* : birçêr, nêz.
 LEONINE, *adj.* : şêrî, wek şêrî.
 LEOPARD, *n.* : piling, wişek, ozek.
 - HUNTING -: piling, wişek.
 LEOTARD, *n.* : kirasê palewanî yan semakerî.

 LEPER, *n.* : bazo.
 LEPID(O)-, *pref.* : pêşgir e ko kelpik e.
 LEPIDOPTER(AN), *n.* : çengkelpik.
 LEPIDOPTERAL, *adj.* : çengkelpikî.
 LEPIDOPTEROUS, *adj.* : çengkelpikî.
 LEPIDOTE, *adj.* : kelpikirî.
 LEPRECHAUN, *n.* : bedecine (efsaneya Îrlandî).
 LEPROSE, *adj.* : gurî.
 LEPROSY, *n.* : lareg, pîsikî, gulî, gurî, beloşîn, kotîbûn, belekî, kirjî.
 LEPROUS, *adj.* : bazo, kotî.
 LEPROUSLY, *adv.* : bi kotî.
 LEPROUSNESS, *n.* : kotîfî, gurîfî.
 - LEPSY, *suff.* : paşgir e ko hejandina dijware.
 LEPTO-, *pref.* : pêşgir e ko biçûk e, zirav e yan lawaz e.
 LEPTON, *n.* : pirtika seretayiya karlêkirina qayim.
 LESBIAN, *n., adj.* : panpanok.
 LESBIANISM, *n.* : panpanokî, jinbazî (bo jinan).
 LESE-MAJESTE, *n.* : rêbaza fortekî.
 LESE-MAJESTY, *n.* : xinizî.
 LESION, *n.* : ziyar, birîn, azar.
 LESS, *adj., prep., n., adv.* : kêmtir, biçûktir, piçek tîr.
 - NONE THE* : li gel hindê.

- LESS, *suff.* : paşgir e ko bê ye, nîn e.
 LESSEE, *n.* : kirêdar.
 LESSEN, *vt. i.* : kêmtir kirin, bereş kirin.
 LESSENE, *adj.* : kêmtir, bereşkirî.
 LESSER, *adj.* : biçûk, biçûktir.
 - BINDWEED : dirrî.
 - FEAST : cejna biçûk (ya remezanê).
 LESSER BEAR, *n.* : hirça biçûktir (stêr). LESSER DOG, *n.* : seyê biçûktir (stêr). LESSON, *n.* : wane, xwandin, pend, ders. LESSON, *n.* : vt. : hîn kirin, ders dan, lê heylandin yan lê xurîn.
 LESSONING, *n.* : lûnkirin.
 LESSOR, *n.* : kirêker. LEST, *conj.* : da ko.
 LET, *n.* : gîro, kirêkirî, bila, kirêkirin. -
 ALONE : ger em wê nebêjin.
 - UP : hêlan.
 LET, *vt.* : hêlan, kirê kirin.
 - TO ** ALONE : hêlan, êdî destê xwe nekirin.
 - TO ** BE : hêlan, êdî destê xwe nekirin.
 - TO ** BLOOD : xwîn kêşan (berdan yan veresand in).
 - TO ** DOWN : dahêlan, dihêlit noqî bibit yan bikevit, kevandin (êdî harî nakit).
 - TO ** DRIVE : dijwar lê dan.
 - TO ** FALL : kevandin.
 - TO ** FLY : havêtin, xeber gotin.
 - TO ** GO : berdan.
 - TO ** IN : hînîn, xapandin.
 - TO ** INTO : hînîn jor, nihênî nişa dan, dijwar êrîş kirin.
 - TO ** IT BE : bila, ba.

· TO - LOOSE : berdan, veresandin.
 · TO - OFF : lê orîn, behane kirin, havêtin (top yan kevan).
 · TO - ON : razê eşkera kirin.
 - TO ** ONESELF GO : bi dilê xwe kirin.
 · TO - OUT : dihêlit birevit, hênan der, bi kirê dan, kiras fireh yan dirêj kirin, lê dan, celde dan, havêtin.
 · TO ** OUT AT : dijarwêrîş kirin.
 · TO ** SLIP : dorandin, dihêlit birevit, berze kirin.
 · TO ** UP : kêr kirin, kêr bûn, rawestîn, nerm bûn.
 - LET, *sliff* : paşgir e ko tiştêk biçûk e.
 LETDOWN, 11. : kevandin, sistbûn, ketin.
 LETHAL, *ndj* : kuşinde, kujdar.
 - GENE : kujcîn.
 LETHARGIC, *adj* : sist, gelho.
 LETHARGY, *n* : wewewz, sistî, xewdarî, xemsarî.
 LETHE, *n* : jibîrkirin, rûbarê jibîkîrinê, feramoşî.
 LETTER, 11. : peyam, name, tîp, emraz, kaxez, parek, reşbelek.
 · BOX : sindoqa nameyan.
 · CARRIER : posteçî.
 · FOUNDER : tîprêj.
 - HEAD : kaxeza navnîşankiri ya damezrînekê.
 - MISSIVE : kaxeza ji desthelatiya payeberz.
 · OF APPRECIATION : sipasname. -
 PERFECT : bêqam rast.
 - PRESS : tîpîfî.
 LETTER, *vt* : nivîsîn.
 LETTERED, *adj* : zana, nivîsî, rewşenbîr, zanyar.

LETTERING, *n* : neqşkirin, nivîsîn.
 LETTER OF CREDENCE, *n* : bawername.
 LETTER OF CREDIT : nameya baweriyê (ji banqê),
 LETTERS, *n* : tor, wêje.
 LETTERS PATENT, 11. *pl* : rêdana nivîskiya mîrî,
 LETTERS TESTAMENTARY, 11. : desthelatkirina rasipartina mîrî.
 LETTING, 11. : hêlan, kirêdan, hêştin.
 LETTUCE, 11. : kahu.
 LEUCOMA, *n* : çavvir, çavgivale.
 LEUKEMIA, 11. : xwîn, spîbûn.
 LEUKOCY(O)-, *pref* : pêşgir e ko gog yan topika spî ye.
 LEUKOCYTE, *n* : gog yan topika spî.
 LEUKOCYTOSIS, 11. : zehfbûna topik ên spî.
 LEUKOPENIA, 11. : kêmatiya topikên spiyên xwînê.
 LEUKOPOIESIS, 11. : çêbûna topikên spî.
 LEUKORRHEA, *n* : sûzeneka spî (quzi). LEVANT, 11. : rojhelata deryaya navîn, rojhelat.
 LEVANT, *vi* : revîn.
 LEVANTER, 11. : rojhelatî (mirov), bayê rojhelatî.
 LEVANTINE, *n*, *ndj* : rojhelatî, avirrnîş.
 LEVATOR, *n* : masûlkehelgir.
 - MUSCLE : masûlkehelgir.
 LEVEE, 11. : pêşwaziya spêdê yan êvarî, berbest, sikir (bo girtina avrabûnê).
 LEVEE, *vt* : berbest kirin, sikir kirin.
 LEVEED, *adj* : sikirkirî.
 LEVEEING, *n* : sikirkirin.
 LEVEL, 11., *adj* : ast, rêkar, late, rêkî, lok, teng, gerandî, rû, asoyî, hedar, xwegirtî, ragirtî, dilsoz, paye (darî), deşt,

- pan, şaqolê asoyî: terazûya hostayî (avaker), alava rastkera pîvyarî, heverk, kêrhatî, hevhez.
- OCROSSING : yektirbirrîna rast.
- OHEAD: pendiyar.
- OLAND : deşt.
- OON THE" : dilsoz, emekdar.
- TO DO ONE'S - BEST: herçî bişêt bikit.
- LEVEL, *vt.* : rêkar kirin, rast kirin, kevandin, bilindiya erdî diyar kirin, yeksane kirin, herifandin (bi erdî ve rast kirin).
- LEVEL(L)ED, *adj.* : rêkarkirî, rastkirî.
- LEVELLER, *n.* : bagurdan, bangurdan, bangêrdan.
- LEVELLING, *n.* : bagerîn, bangerîn, rastkirin, astkirin, rastçêkirin.
- ROD : darkê rastkirinê (pîvyar).
- LEVELLY, *adv.* : bi rêkarî.
- LEVELNESS, *n.* : rêkarîtî. LEVER, *n.* : niwîl, nal, simik.
- CENTER : sersimik.
- LEVER, *vt.i.* : bi niwêlî rakirin, bi simikî rakirin, alavê wek simikî bi kar hinan.
- LEVERAGE, *n.* : simikî, niwêlî.
- LEVERAGED, *adj.* : simikîkirî.
- LEVERAGING, *n.* : simikîkirin.
- LEVERED, *adj.* : rakirî (bi simikî).
- LEVERET, *n.* : têşka kêvrûşkê.
- LEVERING, *n.* : rakirin (bi simikî).
- LEVIABLE, *adj.* : bacbar.
- LEVIATHAN, *n., adj.* : mezin, ejdeha, dewlet nemaze ewa rêzik diktatorî, canewerê mezinê deryayî, dehbeyê deryayî.
- LEVIED, *adj.* : backirî.
- LEVIGATE, *vt.* : hevîr kirin, nerm kirin, herşandin, hêrîn.
- LEVIGATED, *adj.* : hêrayî.
- LEVIGATING, *n.* : hêran.
- LEVIGATION, *n.* : hêran. LEVIN, *n.* : çirûska birûskê.
- LEVIRATE, *n.* : bîjina ko şû bi tiyê xwekirî.
- LEVIRATIC, *adj.* : pêwendîdarê bîjina ko şû bi tiyê xwe kirî.
- LEVITATE, *vt.i.* : firîn (hindî sivik e), firandin (giyanî).
- LEVITATED, *adj.* : firî.
- LEVITATING, *n.* : firîn.
- LEVITY, *n.* : sivikiya barî, sivikîtî, şaşbûn.
- LEVOROTATION, *n.* : çepzivirîn .
- LEVOROTARY OR LEVOROTATORY, *adj.* : çepzivirim.
- LEVULOSE, *n.* : şekira meywe û hingvînî,
- LEVY, *n.* : bac, serbaz.
- EN MASSE : serbazkirina giştî.
- LEVY, *vt.* : bac kirin.
- LEVYING, *n.* : backirin.
- LEWD, *adj.* : çavçepel, nizm, pûç, bêbiha, xirabkar, dawênpis.
- LEWDNESS, *n.* : hîzî, hîzîtî,
- LEWIS, *n.* : berhelgir : alav e bo rakirina beran.
- LEWISITE, *n.* : xazek jehriya şerî ye.
- LEX, *n.* : qanûn.
- LEXICAL, *adj.* : ferhengî, qamûsî, peyivî. ◦ MEANING : wateyê peyivê.
- LEXICALLY, *adv.* : bi ferhengî, qamûsikî,
- LEXICOGRAPHER, *n.* : ferhengdaner, ferhengvan.

LEXICOGRAPHIC(AL), *adj.* : ferhengî, qamûsî.

LEXICOGRAPHY, *n.* : ferhengdanîn.

LEXICOLOGY, *n.* : peyiv-şopewerzanî, zimanzanî.

LEXICON, *n.* : ferheng, qamûs.

LEXIS, *n.* : hemû peyivên zimaneke.

LEY, *n.* = LEA : koz.

LIABILITY, *n.* : berpirsîti, deyn.

LIABLE, *adj.* : desteber, berpirs bar.

LIAISE, *vi.* : pêwendî çêkirin yan rêk xistin.

LIAISED, *adj.* : pêwendîkirî.

LIAISING, *n.* : pêwendîkirin.

LIAISON, *n.* : pêwendiya nerewa, pêwendiya nêzik yan qayim, hevpeğirekî, karê efserê pêwendiyê dikit.

LIAISON, *n.* : helezek helpirjîn e.

LIAR, *n.* : derewker, derewîn, virker, vira, virek, zir.

LIAS, *n.* : pêwendîdarê parçeyek ji rojgarê corasiyê Ewropî.

LIASSIC, *adj.* : pêwendîdarê kilsa reqa şîna inglîzî.

LIBATION, *n.* : riştin, vexwarin, şerab. LIBEL, *n.* : havêtin, lêdan (axiftin), tawana nawziran, nawziran, şil tax, şil taqî.

LIBEL, *vi. t.* : nawziran kirin, dihavêtê, şiltax kirin.

LIBEL(L)ANT, *n.* : gilî kar.

LIBEL(L)ED, *adj.* : şiltaxkirî.

LIBEL(L)EE, *n.* : gunehbar.

LIBELING, *n.* : şiltaxkirin.

LIBELIST, *n.* : şiltaxkar.

LIBELOUS, *adj.* : şiltaxî.

LIBELOUSLY, *adv.* : bi şil taxî, şiltaxeke.

LIBERAL, *n., adj.* : azadbîr, aza, serbest.

• ARTS : hunerên serbest (ziman, dîrok, zanistî, jîrzani).

LIBERALISM, *n.* : serbestîti.

LIBERALISTIC, *adj.* : serbestî.

LIBERALITY, *n.* : serbestîti, dil firehî, dilverayî, serbestbûn, firehî, zehfî.

LIBERALIZATION, *n.* : serbestkirin, serbestbûn.

LIBERALIZE, *vt.* : serbest kirin.

LIBERALLY, *adv.* : bi serbestî, bi dilverayî, serbestî kî.

LIBERALNESS, *n.* : sebestîti.

LIBERATE, *vt.* : aza kirin, rizgar kirin, berdan, serbest kirin.

LIBERATED, *adj.* : rizgarkirî, azakirî.

LIBERATING, *n.* : rizgarkirin, azakirin, berdan, aza, azadar, serberdan, berdan.

LIBERATOR, *n.* : rizgar, aza ker. LIBERTARIAN, *n., adj.* : serbest, aza, piştgirê seretayên azadiyê (hizir û kar).

LIBERTICIDE, *n.* : serbestî yan azadî kuj.

LIBERTINAGE, *n.* : = LIBERTINISM.

LIBERTINE, *n., adj.* : forq, dawênpiş.

LIBERTINISM, *n.* : hîzîti, felîteyîti.

LIBERTY, *n.* : azadî, serbestî.

• OF CONSCIENCE : serbestiya nidahî yan derûnî.

• OF THE PRESS : serbestiya rojnamegerî.

LIBIDINAL, *adj.* : fêtkar, har.

LIBIDINOUS, *adj.* : fêtkar, har.

LIBIDINOUSLY, *adv.* : bi harî, bi fêtkari, fêtkarîkî.

LIBIDINOUSNESS, *n.* : harî ti, fêtkarîti.

LIBIDO, *n.* : harî, belqitandin, fêtkarî.

LIBRA, *n.* : mêzîn.

LIBRARIAN, *n.* : kitêbxaneyan. LIBRARIANSHIP, *n.* : razgmya kitêbxaneyê.

LIBRARY, *n.* : kitêbxane, pirtûkxane. LIBRATE, *vi.* : lere kirin, lerizîn, hevseng bûn, veweşîn.

LIBRATION, *n.* : lereyî.

LIBRATING, II. : lere kirin, lereyî.

LIBRATORY, *adj.* : lereyiyî, lerekirinî.

LIBRETTIST, II. : operanivîs.

LIBRETTO, *n.* : deq yan peyivên opera.

LIBRIFORM, II. : rîşalî.

LIBYA, *n.* : Lîbya: welatê bakura Efrîqa.

LIBYAN, *adj.* : lîbya yî, lîbî.

LICE, II. : zêndî, speh, espê,
◦ 'S EGGS : rişk, biran guh.

LICENSE, II. : rêdan, destûr.

LICENSE, *vt.* : rêdan, rewa kirin. LICENSED, *adj.* : rewakirî, destûrkirî, rêdayî.

LICENSER, II. : rêdankar.

LICENSING, II. : rewakirin, rêdan, destûrdan.

LICENTIATE, II. : oldarê rêdayî, helgirê rêdana zankoyê.

LICENTIOUS, *adj.* : dawênpiş, hîz.

LICH, II. : term.
- GATE : dergehê dêrê yan goristanê.

LICHEN, *n.* : keviz, qewze, nesaxiyek çermî ye.

LICHENED, *adj.* : kevizkirî.

LICHENOLOGY, II. : keviz(z)anî, keviznasî.

LICIT, *adj.* : rewa.

LICK, *n.* : alîstin, alastin, zimandan.

LICK, *vt.i.* : alîstin.

OTO - INTO SHAPE : taze yan çalak kirin.

OTO - ONE'S UPS : lêvên xwe (ji keyfa) mêtin.

◦ TO - ONE'S SHOES OR BOOTS : rûbazî kirin yan xwe nizm kirin bo kesekê.

◦ TO - THE DUST : kef tin, hatin revandin.

◦ TO - UP (OR OFF) : paqij kirin (bi alîstinê).

LICKED, *adj.* : alîstî.

LICKER, II. : alîsok.

LICKERISH (LIQUORISH), *adj.* : hîz, xwe re, çillek, çikas, har, fêtkar.

LICKETY-SPLIT, *adv.* : bêqam bi lez. LICKING, II. : alîstin, zimandan, alastin. LICKSPITTLE, II. : rûbaz,

LICOR/CE, II. : binebelek, sas.
◦ ROOT : binebelek.

LICTOR, II. : liktor : rêve kirê rawêjkar yan diktatorê Romanî.

LID, *n.* : serdevk, derxûn, qepax.

LIDLESS, *adj.* : bê qepax, bê serdevk. LI DO, II. : bezmgeha li beravek xîzî.

LIE, II. : Xwe dirêj kirin, derew, direw, pot, virtr), paldan.
◦ DETECTOR : derewzank.
• FABRICATED - : şîtax, şiltaqî.
- TO GIVE A PERSON THE - : *bi* derew gunehbar kirin.
- TO GIVE THE - TO SOMETHING : derewîn hinan der.
◦ WHITE - : virtr) (derewa spî: derewa sivika bêziyan).

LIE, *vi.t.* : xwe dirêj kirin, virr kirin, derew yan direw kirin, rezîn, lîsîn, vezelîn, vekeftin,
◦ TO LET SLEEPING DOGS - : Xwe ji pirsra giriftar vedan.

..TO ... AT ONE'S HEART : perîşan bûn (bo kesekê).

O TO ... BACK : xwe dirêj kirin.

O10 ... BY : vesihîn, nêzik man, nêzik danan.

O10 .. DOWN : paldan, rakeftin.

O TO ... IN : di nav nivînan de man.

O TO ... IN ONE : karin, şiyân.

O TO ... IN THE WAY : kosp yan gîro di rêkê de.

..TO ... LOW : xwe veşartin, xwe li ser erdê dirêj kirin.

..TO .. OFF : xwe ji ber avê yan gemiyek dûr kirin.

..TO ... ON OR UPON : xwe li ser tiştekê yan mirovekê girtin.

O TO ... ON ONE'S HANDS : naêt firotin.

O10 ... ON THE HEAD OF : ew e berpîrsê qewmînê.

O TO ... OVER : gîro bûn, naêt dan.

O TO ... TO : gemî li cihê xwe man.

O TO ... UP : li nav nivînan de vesihîn, gemî çûn gerê yan li wêrê man.

..TO .. WITH : li gel jinekê nivistin, nişte bûn.

LIEF{ *adv.* : ser çava.

LIEGE{ *n., adj.* : emekdarî derebegî, dilsoz, peyivdarê derebegî, mafdarê derebegî, serkarê derebegî, derebeg.

LIEN{ *n.* : girewa aqarî.

LIENAL, *adj.* : sipilî.

LIERNE, *n.* : perasû ya kurt û pan.

LIEU{ *n.* : şûn, berdêlî.

LIEUTENANCY, *n.* : efseriya yekstêr.

LIEUTENANT{ *n.* : efserê yekstêr, sedvan.

..COLONEL : serheng.

-COMMANDER : çarstêrdarê deryayî.

O GENERAL : sertîp.

O GOVERNOR : cêgirê parêzkarî.

LIFE, *n., adj.* : jîn, jiyar, jînî, jî, jiwarî, jîndarî.

O A BAD"" : mirovê ko nagehit jiyê navî.

O A GOOD .. : mirovê ko gehiştin jiyê navî (bo dabînkirinê).

-BELT : piştêna rizgariyê.

-BLOOD : xwîna jiyane: jiyaparêz.

-BOAT : bele ma rizgarkirinê.

-BREATH : bêhna jiyane.

-BUOY : canrizgar.

· CYCLE : gera jînê yan jiyane.

· ESTATE : aqarê jiyane.

-EXPECTANCY : têkroya jiyane. .

GIVING : jiyane dan.

..GUARD : karkerê rizgarkirina jiyane nemaze ji nav avê,

· HISTORY : dîroka jiyane, jînname. .

INSURANCE : dabînkirina jiyane.

O JACKET : saqoyê rizgarkirinê.

O LINE : werîs kê rizgarkirinê.

O LONG : hemû jiyane (berdewam).

O NET : tora rizgarkirinê.

O OFFICE : nivîsgeha dabînkirina jiyane. .

PEER : pîrê jiyane (endamê civata pîran bê mafê paşmayî).

O PRESERVER : jiyaparêz.

O RAFT : kerxa rizgariyê.

-SAVER : jiyanzizgar {ker}, jiyane rizgarkirin.

-SEED : zindîlok.

· SIZE : qebareyê xuristî yan siruştî.

· SOCIAL"" : jînyarî.

· TIME : jî.

- WAY OF - : rêbaza jiyane.
 - WORK : karê jiyane.
 LIFEFUL, *adj.* : çalak, jiyandar.
 LIFELESS, *adj.* : mirî, bêjiyan, bêhiş, çol, bêçalakî, nenîstekirî.
 LIFELESSLY, *adv.* : bi sistî, sistikî.
 LIFELESSNESS, *n.* : sistîtî, bêjiyanîtî. LIFER, *n.* : mirovê heta heta zindankirî. LIFT, *n.* : bilin dik, helbir.
 LIFTMAN : karkerê bilindekê.
 LIFT TRUCK : guhêzoka barkêş.
 LIFT, *vt.i.* : bilind kirin, rakirin, helgirtin, heldan.
 LIFTABLE, *adj.* : helgirbar.
 LIFTER, *n.* : helgir.
 LIFTING, *n.* : helgirtin, rakirin, hilmîştin, hildan, helbirîn.
 - UP : hilanin, rakirin, bilindkirin.
 LIGAMENT, *n.* : pêgirek, girê, bendeka yekîtiyê.
 LIGAMENTARY, *adj.* : bendkî.
 LIGAMENOUS, *adj.* : bendkî.
 LIGATE, *vt.* : girê dan (demarê xwîn jêve-restî).
 LIGATED, *adj.* : girêdayî.
 LIGATING, *n.* : girêdan.
 LIGATION, *n.* : girêdan, pêgirek.
 LIGATURE, *n.* : bendeknexasme tayê girêdana porgên xwînê, pêgirek, girêdan.
 LIGER, *n.* : têşkê şêrî yan pilingî.
 LIGHT, *n., adj., adv.* : ronahî, ronakî, rohnî, ronî, somayî, rewşen, çira, sivik, sok, ron, roşnayî, şewq.
 - IN THE - OF : jî ber ko.
 - ADAPTATION : ronahî bijarekirin.

- AIR : bayê sivik.
 - BLOND : şêvekirî, şêzela1.
 - BREAD : nanê genimî.
 - BROWN : genimî (reng).
 FINGERED : destsivik.
 - FOOTED : pêsvivik.
 • GREEN : keskê vekirî. -
 HEADED : gêj, hol.
 - HEARTEDNESS : halî.
 - HEAVYWEIGHT : kulmbazê kêşgirane sivik.
 • HOUSE : fener, peşte. -
 LOADED : barsî vik.
 - LYRIC : peste.
 - MEMORY : cizb.
 • MINDED : hişsivik : hol. -
 RAIN : pizrûk,
 • SHOWER : pizrûk. -
 STAND : çiradan.
 - STRUCK : têkdayî bi ronahiyê (wek filmî).
 • WEIGHT : kulmbazê kêş sivik (135 pawin),
 • WITTED : xupû.
 - WOOD : darê zû disojit.
 - YEAR : sala ronahiyê.
 - TO BRING TO - : eşkera kirin.
 - TO COME TO - : eşkera bûn.
 LIGHT *vt.i.* : ronahî kirin.
 - TO - INTO : dijwar êrîş kirin.
 - TO - OUT : zû çûn.
 LIGHTED, *adj.* : ronahîkirî.
 LIGHTEN, *vt.i.* : ronahî kirin, sivik kirin.
 LIGHTENED, *adj.* : sivikkirî.

LIGHTENING, *n.* : birûsk, bilêç.
 - BOLDY : tirûsk, peşk, bapeşk.
 LIGHYER, *n.* : helker, çeqmaq, kelek, gemiya binpan.
 LIGHYER, *vt.* : (bi gemiya binpan) guhastin.
 LIGHTING, *n.* : ronahîkirin, agirîkirin, rivîn kirin, tavatî, helkirin, sotandin, rewşendarî, helgîrsan.
 LIGHYISH, *adj.* : piçekê sivik.
 LIGHTNESS, *n.* : sivikîfî, sivikahî, sivikayî.
 LIGHYING, *n.* : birûsk, birûske, bilêç, pis-pisok.
 - ARRESTER : dijbirûsk, birûskgir. •
 8UG : çirîske kiz,
 - FLASH : çirîska birûskê.
 - ROD : dijbirûsk.
 - SPEED : leza bêqam.
 LIGHTPROOF, *adj.* : dijronahî.
 LIGHTSHIP, *n.* : peştegemî.
 LIGHTSOME, *n.* : çeleng.
 LIGHTS-DUY, *n.* : ronahî vekujîn (nîşana agehdariyê yan nivistinê).
 LIGN-, ligni- or ligno-, *pref.* : pêşgir e ko dar e.
 LIGNEOUS, *adj.* : darî, wek darî.
 LIGNIFICATION, *n.* : darbûn.
 LIGNIFIED, *adj.* : darkirî.
 LIGNIFY, *vt.i.* : dar kirin.
 LIGNIFYING, *n.* : darkirin.
 LIGNIN, *n.* : darîn.
 LIGNITE, *n.* : texlîtek komir e.
 LIGNOCELLULOSE, *n.* : silolozê darî. LIGROIN, *n.* : berhemek neftî firîndar e. LIGULA, *n.* : zimanok.
 LIGULATE, *adj.* : kulilkiya şikiltîtik.

LIGULE, *n.* = LIGULA.
 LIGURE, *n.* : berek hêja ye.
 LIKABILITY, *n.* : xweşkokîfî.
 LIKABLE, *adj.* : xweşkok.
 LIKE, *n., adj., ptep., adv., conj.* : wek, mîna, manend, fena.
 LIKE, *vt.i.* : hez kirin, begem kirin.
 LIKED, *adj.* : hezkirî.
 LIKELIHOOD, *n.* : şîmanekî.
 LIKELY, *adj., adv.* : şîmanek, şîmanekî. LIKE-MINDED, *adj.* : hevmed, hev hiş, hevrannan.
 LIKEN, *vt.* : mînane kirin.
 LIKENED, *adj.* : mînanekirî.
 LIKENESS, *n.* : mîna hî, wêne, xudik, wekîne.
 LIKENING, *n.* : mînanekirin. LIKEWISE, *adv., conj.* : dîsa, dîsan. LIKING, II. : hezkirin, begemkirin. LILAC, *n., adj.* : şilêr.
 LILACEOUS, *adj.* : şilêrî,
 LILIED, *adj.* : şilêrî,
 LILLIPUT, *n.* : Lilîput : girava aşopiya mirovqutu (rewile).
 LILLIPUYIAN, *n., adj.* : Lilîputî.
 LILT, *n.* : strana şad.
 LILT, *vt.i.* : (şad) stirandin.
 LILTING, *n.* : awazî, şad.
 LILY, *n.* : şilêr, zembeq, lale, pelezêsk, pelezî, zebat, sosin.
 · LIVERED : tirsonek.
 · OF THE VALLEY : şilêra dolê. -
 PAD : belga serav.
 - WHITE : bêgunchî, spi wek befrê.
 LIMACINE, *adj.* : lolekî, badoke.

LIMB(S), *n.* : dest û pê, pîlax, çiwarpel.
 LIMB, *vt.* : birrîn (endam û parçe) nemaze
 çiqên dari.
 LIMBAYE, *adj.* : perwazdar.
 LIMBER, *n., adj., vt.i.* : berahiya topê,
 nerm, çeleng, nerm bûn.
 LIMBERLY, *adv.* : bi nermî, nermîkî.
 LIMBERNESS, *n.* ; nermîn, emn.
 LIMBLESS, *adj.* : bê dest û pê.
 LIMBO, *n.* zîndan, feramoşî,
 hêvişandin.
 LIMBUS, *n.* : dehmena rengkirî.
 LIME, *n.* : kal si yom, ho dax, kils, sineûv.
 - GLASS : şûşeyê semeberdê asayî.
 - KILM : kûrheya semeberdê.
 - LIGHT : ronahiya semeberdî,
 - STONE : semeberd.
 - TWIG : bista hodarî, tel he, tepik.
 - WAYER : ava sincûvî (ko dijtirî ye).
 - WORT : heleza kilsê.
 LIME, *vt.* : sineûv kirin.
 LIMED, *adj.* : sineûvkirî.
 LIMERICK, *n.* : helbesta pênc malkî ya
 tiraneyî.
 LIMICOLINE, *adj.* : beravnişte.
 UMINAL, *adj.* : pêwendidarê ber derazînka
 hişê.
 LIMING, *n.* : sincûvkirin.
 LIMIT, *n.* : sinor, rade, ewper.
 LIMIT, *vt.* : rade kirin, kurt kirin, diyar
 kirin.
 LIMITABLE, *adj.* : radebar.
 LIMITARV, *adj.* : radedar, radeyî, dorgirtî.
 LIMITATION, *n.* : radekirin, girdan.
 LIMITATIVE, *adj.* : radedar, radekirî.

LIMIYED, *adj.* : radekirî, sinorkirî, mişlaq.
 LIMITING, *adj.* : radedar, dûmahîkî, radekirî.
 • VALUE : bihayê dûma hî, nixê ewper,
 bihayê radeyî.
 LIMINESS, *adj.* : bêsinor, bêrade. LIMITROPHE,
adj. : devera sinorî, serhedî. LIMN, *vt.* :
 neqş kirin, melheze kirin. LIMNED, *adj.* ;
 neqş kirî.
 LIMNER, *n.* : neqşker.
 LIMNETIC, *adj.* : pêwendidarê ava zelal.
 LIMNING, *n.* : neqşkirin.
 LIMNOLOGY, *n.* : avzelalzanî, gol yan
 deryaçe zanî.
 LIMONITE, *n.* : lîmonît : oksîdê aviyê asinê.
 LIMOUSINE, *n.* : otombîlek mezin, lîmûzîn,
 LIMP, *n., adj.* : leng, lengîn, lengandin,
 kulek, şil, qop, lenger, şelîn, sist.
 LIMP, *vi.* : kulîn, lengîn.
 LIMPED, *adj.* : kulî, lengî, lengiya, kulandî.
 LIMPET, *n.* : şeytanokê, pêzikê keviran,
 mirovê xwe bi karî ve digirit.
 LIMPID, *n.* : zelal (av).
 LIMPIDITY, *n.* : zelalîti.
 LIMPIDLY, *adv.* : bi zelalî, zelalîkî.
 LIMPIDNESS, *n.* : zelalîti,
 LIMPING, *n.* ; kulîn, lingirîn, şelin, kulan-
 din.
 • ANI MAL : şext.
 LIMPKIN, *n.* : balindeyek wek leglegeyî.
 LIMPLY, *adv.* : bi lengî, lengîkî. LIMPNESS,
n. : lengîti, sistî, kulekîti. LIMPSY, *adj.* =
 LIMP.
 LIMY, *adj.* : hodarî, sincûvî, semeberdî.

LINAGE, *n.* : hejmara rêzên çapkirî (bo bihakirinê).
 LINALOOL, *n.* : linalol, texlîtek alkuhol e.
 LINCHPIN, *n.* : bizmarê çerxê.
 LINCROSTA, *n.* : kaxezek dîwarî ye. LINCTUS, *n.* : derman (bo alistinê). LINDANE, *n.* : îzomerê belûriyê bêrengê hezkoklorîd yê benzînê ko pêtkuj.e.
 LINDIN, *n.* : sincûv, darê sincûv, exlamor.
 LINDY, *n.* : texlîtek sema ye.
 LINE, *n.* : rêz, dêr, xêz, xîç, sîle, tabûr, qor, cixiz, malbat.
 ◦ ALL ALONG THE .. : ji destpêkê tako dûmahiyê.
 ODANCE: govend.
 OHARO .. : bextreş.
 OHORIZONTAL .. : rêz yan hêla asoyî.
 OINCLINED .. : rêza xwar.
 OIN .. WITH : pêkhatî.
 OENGAGED : hêla telefonê mijûl e.
 OPERPENDICULAR .. : rêza şaqolî.
 OSTRAIGHT .. : rêz yan hêla rast.
 OTO BRING A PERSON INTO" : qayil kirin.
 OTO COME INTO" WITH : pêk dihêt li gel.
 OTO GIVE ONE .. ENOUGH : delîveyek dî bo vekirin (li dûv berdan).
 OTO GO UP THE" : ji binkî çûn berê şerî.
 OTO READ BETWEEN THE -S : di navbera rêzan de xwandin.
 - TO TAKE ONE'S OWN .. : serbixwe kar kirin.
 ◦ TO TOE THE" : çîz kirin, ferman qebûl kirin.
 ◦ WIDE .. : şift,
 LINE, *vt. i.* : rêz kirin, xêz kirin.

◦ TO .. ONE'S PURSE : berîkên xwe tijî kirin (dirav: ên ku her li berjewendiya xwe bi tenê digêrit), rêzekê li bin peyivekê dadinit bo rakirinê).
 OTO- OUT: neqş kirin, melheze kirin, rêzekê li bin peyivekê dadinit bo rakirinê.
 LINEAGE, *n.* : binemale, babik, bavik, malbat, tuxm.
 LINED, *adj.* : rêzkirî, xîzkirî.
 ◦ PAPER : rûpela xîzkirî.
 LINEAL, *adj.* = LINEAR.
 LINEAMENT, *n.* : nişan, dêhm, rûçik.
 LINEAR, *adj.* : xêzî, rêzî, hêlî.
 OEQUATION : hev kêşeya hêlî.
 OMEASURE : dirêjîpiv.
 OPERSPECTIVE : dirêjî yan hêlî bîn.
 LINEATION, *n.* : cixizkirin.
 LINEN, *n.* : kinc, perûk.
 LINEOLATE(D), *adj.* : (bi rêzên zirav) dirf-kirî.
 LINER, *n.* : gemiya hêlî, berê stûnî.
 LINESMAN, *n.* : harîkerê navbêji,
 LING, *n.* : masiyek deryayî zirav û dirêj e.
 LINGA(M), *n.* : kîr.
 LINGER, *vt. i.* : paş keftin, dudilî kirin.
 LINGERED, *adj.* : paşketî.
 LINGERIE, *n.* : binkirasên jinan.
 LINGERING, *n.* : şondaman, paşdaman, hêvişandin.
 LINGO, *n.* : zimanê gêre yan biyanî. LINGUO,
 LINGUO, LINGUO, *pref.* : pêş gir e ko ziman e.
 LINGUA, *n.* : ziman, derhatiyek wek zimanî, yan ezmanî.
 - FRANCA : hevziman.

- LINGUA-FORMA, *adj.* : şikilziman, wek zimanî.
- LINGUAL, *adj.* : zimanî.
- LINGUIST, *n.* : zimanzan, zimanewan.
- LINGUISTICS, *n.* : zimanzanî, zarzanî.
- LINGULATE, *adj.* : şikil ziman.
- LINIMENT, *n.* : melhem, hetwan.
- LINING, *n.* : ber, cixiz, rûkêş, napûş, estar, xêzkirin, berkirin, rûkêşkirin, nawpûşîn, rûpişt.
- LINING UP : QORGIRTIN, qorkirin, rêzbûn.
- LINK, *n.* : pêgirek.
- BOY : çirahelgir.
- OF CHAIN : rewq, bazinek.
- LINK, *vt.i.* : girêdan (pêkve).
- LINKAGE, *n.* : zincîra bazinan yan bistan, pêgirekî bendekî, bend, girêdan.
- LINKED, *adj.* : (pêkve) girêdayî, zincîrekiri.
- LINKMAN, *n.* : = LINKBOY.
- LINKS, *n.* : zîrên beravî, meydana golfê. -
- MAN : yarîkerê golfê.
- LINK UP, *n.* : kombûn, gehîn, pêwendî.
- LINKWORK, *n.* : zincîr.
- LINNET, *n.* : sêvikî : balindeyek ^{strîni} ye.
- LINOLEIC, *n.* : tirş iya lînolik (tirşiya ronê kitanî).
- LINOLEUM, *n.* : raxistek mûmi.
- LINOTYPE, *n.* : tîprêj.
- LINSANG, *n.* : canewerek memikdar e wek kitkê ye.
- LINSEED, *n.* : tovê kitanî. LINSEY-WOOLSEY, *n.* : kirasê zivrê hiriyê. LINSTOCK, *n.* : topagirker.
- LINT, *n.* : pêça kitanî.
- WHITE = LINNET.
- LINTEL, *n.* : sîvandeya serderî.
- LINTER, *n.* : paşmayiya pembûyî (piştî jenînê).
- LINTY, *adj.* : (pembû) paşmayiyî.
- LINY, *adj.* : bi rêzan nîşankirî. LION, *n.* : şêr.
- CUB : çêl şêr, têşikşêr.
- HEARTED : şêrdil.
- KILLER : şêrkuj. -
- 'S MANE : milek.
- 'S MOUNTAIN : şêrko.
- LIONESS, *n.* : dêleşêr, mêşêr.
- LIONIZATION, *n.* : giringkirin.
- LIONIZE, *vt.i.* : giring kirin, rêz girtin.
- LIONIZED, *adj.* : giringkirî.
- LIONIZING, *n.* : giringkirin.
- LIP, *n.* : lêv, lêw.
- SERVICE : pişt gîriya nejidil.
- STICK : sorav.
- TO BITE ONE'S .. : lêvên xwe kirandin (ji bêzariyê yan da ko nekenit).
- TO HANG ON A PERSON'S .. : qenc guhdarî kirin.
- TO MAKE A .. : lêvên xwe miç kirin.
- LIP, *vt.* : stirandin, gotin, maçî kirin. LIP(oh) *pref.* : pêş gir e ko rûn e yan bez e.
- LIPASE, *n.* : haveyna rûnşîtelker.
- LIP-DEEP, *adj.* : lêvikî (ne ji dil).
- LIPID(E), *n.* : bez û mûm.
- LIPOGRAPHY, *n.* : rakirina tîp ya peyivan (ji nivîsînê).
- LIPOID, *n., adj.* : rûn (ron), bez, bezî.
- LIPOLYSIS, *n.* : rûn yan bez şîtelkirin.
- LIPOMA, *n.* : porgebez.

LIPOPROTEIN, *n.* : pirofînê bezî yan rûnî.
 LIPPED, *adj.* : lêvdar.
 LIPPY, *adj.* : lêvî, rûqayim.
 LIP-READ, *vU.* : lêv xwandin. LIP-
 READER, *n.* : lêvxwendiyar. LIP-
 READING, *n.* : lêvxwendin.
 LIPSING, *n.* : pistkirin),
 LIQUATE, *vt.* : cuda kirin (bi buhujînê).
 LIQUATED, *adj.* : cuda kiri (bi buhujînê).
 LIQUATING, *n.* : cudakirin.
 LIQUEFACTIENT, *n.* : buhujinker. LIQUEFACTION,
n. : buhujtin, şilkirin, bos-
 tîn.
 LIQUIFIABLE, *adj.* : avekîbar.
 LIQUIFIEO, *adj.* : şil, avekîkirî.
 LIQUIFY, *vt.i.* : şil kirin, avekî kirin,
 buhujtin, buhujandin.
 LIQUIFYING, *n.* : avekîkirin.
 LIQUESCENT, *adj.* : buhujî. LIQUEUR,
n. : meya bîhnxoşkirî,
 LIQUID, *n., adj.* : avekî, rohn, leşav, şile, avî,
 şil, ron.
 -AIR: bayî şil.
 • MEASURE : şilpîv.
 LIQUIDATE, *vt.i.* : qirandin, birhandin, şil
 kirin, diravî kirin, kuştin, deyn dan.
 LIQUIDATED, *adj.* : qirandî, qelandî, birhandî,
 kuştî.
 LIQUIDATING, *n.* : qirandin, avekîkirin (dirav).
 LIQUIDATION, *n.* : qirandin, qelandin,
 birhandin, avekîkirin (dirav).
 LIQUIDATOR, *n.* : dabeşker (diravî damez-
 rînekî).
 LIQUIDITY, *n.* : diravî, ronayî, şilfî, rohnî.
 LIQUIDIZE, *vt.* : avekî kirin.

LIQUIDS, *n.* : avekî, şilemenî.
 LIHMIDUS, *n.* : kirva avekiyê.
 LIQUOR, *n.* : mey.
 • SALESMAN : meyfiroş.
 LIQUORICE, *n.* : sos, binebelek.
 UQUORISH, *adj.* : vexwar.
 LIRA, *n.* : yekeya diraviya îtalî.
 LIRIPIPE, *n.* : kulavê ser tilî, temezî.
 LISLE, *n.* : benikê pembûyê badayî.
 LISP, *n.* : zimanfisî.
 LISP, *vU.* : zimanfisî axiftin.
 LISPER, *n.* : zimanfis.
 LISSOM(E), *adj.* : ferz, nerm, lewend, şaş.
 LISSOMENESS, *n.* : lewendî, nermî.
 UST, *n.* : siyayî, rêzar, tomar, rex, کنار,
 parçeyek lakêseteng.
 UST, *vt.i.* : xahr bûn, qayil kirin, kêr hînan,
 siyayî kirin, tomar kirin, guhdarî kirin.
 LISTEN, *vi.t.* : bihîstin, guh dan, guhdarî
 kirin.
 LISTENABLE, *adj.* : bihîstinbar.
 LISTENED, *adj.* : bihîstî.
 LISTENER, *n.* : guhdar, bihîstyar . LISTENING, *n.*
 : guhdarî, guhdan, guhdê-
 rî.
 LISTER, *n.* : hevcar.
 LISTING, *n.* : siyayî, siyayikim, xişte.
 LISTLESS, *adj.* : tembel, dilsar.
 LISTLESSNESS, *n.* : dilsarî.
 LIT = LIGHT.
 LITANY, *n.* : laveyîn dêrê.
 LITCHI, *n.* : mîweyek çînî şîrîn e.
 -LITE, *suff.* : paşgir e ko kan e, kevir e,
 berdine ye.

LITER OR LITRE, *n.* : le tir, litre : pîva qebareyê (temet qebareyê kîlogramek avî).

LITERACY, *n.* : sîwa, zanîna xwendin û nivîsînê, xwendewari.

LITERAE HUMANIORES, *n.* : nameyên rûmetdar.

LITERAL, *n., adj.* : tîpî, sade, heyberî.

LITERALITY, *adv.* : bi torî, torîkî.

LITERALNESS, *n.* : torîtî.

LITERALITY, *n.* : tîpîtî : ravekirina tîpî.

LITERALIZATION, *n.* : tîpîbûn.

LITERALIZE, *vt.* : tîpî kirin : watayî tîpî girtin.

LITERALIZED, *adj.* : tîpîkirî.

LITRALIZING, *n.* : tîpîkirin.

LITERALLY, *adv.* : bi tîpî, tipîkî,

LITERARY, *adj.* : torî.

LITERATE, *n., adj.* : xwenda, xwendewar, rewşenbîr.

LITERATELY, *adv.* : bi xwendewarî, xwendewarîkî.

LITERATENESS, *n.* : xwendewarîtî.

LITERATI, *n.* : torevan.

LITERATIM, *adu., adj.* : tîpî, tîpîkî. LITERATION, *n.* : (peyiv yan deng) tîpîkirin.

LITERATOR, *n.* : hîinkerê seretayî.

LITERATURE, *n.* : tor, wêje.

LITH(O)-, *pref.* : pêşgir e ko ber, lityon e.

LITHARGE, *n.* : yekem oksîdê zirêç,

LITHE OR LITHESOME, *adj.* : lewend, ferz, nerm.

LITHESS, *n.* : nermî, lewendî.

LITHIA, *n.* : oksîdê lityomê spî.

• WATER : ava lîfî : ava kaniyê : xwêya lityom têde heye.

LITHIASIS, *n.* : berçêbûn (di zerdavdankê de).

LITHIC, *adj.* : tîtyonî, (wek) berî yan kevirî.

LITHIUM, *n.* : hêmanek metalî reng zîv e.

LITHO-, *pref.* : pêş gir e ko ber e, kevir e.

LITHOPRINT : çapkirina ofsêtî.

LITHOGRAPH, *n.* : berçapkirin.

LITHOGRAPH, *vt.* : ber çap kirin.

LITHOGRAPHER, *n.* : berçapker. LITHOGRAPHIC,

adj. : berçapkirî. LITHOGRAPHY, *n.* :

berçapkirin (çapkirina li ser berî).

LITHOLOGY, *n.* : berzanî, kevirzanî (yan nasî).

LITHOMARGE, *n.* : axek çînî xest e.

LITHOTRIPTIC, *n., adj.* : dermanê berşikên (di mîzdankê de).

LITHOPHYTE, *n.* : helezê li ser kevirî şîn dibit, kevircanewer (wek mercanî).

LITHOPONE, *ll.* : renga spiyê sulfatê zinkî û sulfatên baryom.

LITHOSPHERE, *n.* : hişkati, bejê hişk.

LITHOTOMY, *n.* : berderînan (ji mîzdan-kê).

LITHOTRITY, *n.* : hişkati, bejê hişk.

LITIGABLE, *adj.* : gilîbar.

LITIGANT, *n., adj.* : dozvan.

LITIGATE, *ui.i.* : (dad werî) gilî kirin.

LITIGATED, *adj.* : gilîkirî.

LITIGATING, *n.* : gilîkirin.

LITIGATION, *n.* : dozname.

LITIGIOUS, *adj.* : şerker, gilîxwaz.

LITIGIOUSLY, *adv.* : bi gilîxwazî, gilîxwazîkî.

LITIGIOUSNESS, *n.* : gilîxwazîtî.

LITMUS, *n.* : boyeya gulberojê. -

PAPER : kaxeza gulberojê.

LITOTES, *n.* : dariştinek rewanbêjî ye (ko bo erêyî nerê bi kar diêt),

LITRE, 11. = LITER.

LITTER, *n.* : gil êş, qilêr, helgirk, mef, xul, qerqot.

LITTER, *uti.* : gilêş kirin.

LITTERATEUR, *n.* : hozan, torevan.

LITTLE, *n., adj.* : hindek, hindik, hinek, pitek, piçek, kêr, biçûk, piçkûk, çendek, çik, piçûk.

•• BY •• : piçpiç.

- FINGER : qilic(k), tila başikan.

- FLOWER : gulik, kulîlk.

- GRAIN : danik.

- HAIR : rişçik, rehçik, sihrik.

- PIECE : pirtik, piç.

- WHILE : bistek, bêhnek, taw, gavek.

LITTORAL, *n., adj.* : berav, devera beravî.

LITURGIC(AL), *adj.* : olkariyî.

LITURGICS = LITURIOLOGY.

LITURIOLOGY, *n.* : olkarîzanî,

LITURGIST, 11. : olkarîzan, bawermendê karê olî.

LITURGY, *n.* : olkarî.

LIVA-LE, *adj.* : jiyabar, kêrhatî bo jiyane.

LIVE, *adj.* : zindewer, zindî, jî. -

COAL : pel, bizot, pît.

- OAK : zîdeberrû (berrûyek emerîkanî her kesk e),

LIVE, *vi.t.* : jiyar.

~ TO - AND LET - : jiyar û hêlan, ewê dî Jî (wek bivêt) bijît.

- TO •• CIOSE : rezîl yan çikos dijît.

- TO •• DOWN : wesa dijît da ko bed karê kirî jî bîr bikin an lê biborin.

- TO - OUT THE NIGHT : çalak man (di nav de).

LIVEABLE, *adj.* : kêrhatî bo jiyane, jiyabar.

LIVEABLENESS, 11. : jiyabarîfî.

LIVE-BOX, 11. : sindoqa jiyane (bo canewerên avî).

LIVED, 11. : jiyayî, jiyandar.

LIVELIHOOD, *n.* : debar, jiyar.

LIV-IV, = = çalak, çeleng, çapik, jîwer, zindî.

- HEART : dilbijîn, dîlzindî.

LIVEN, *vt.i.* : geş kirin, jiyane kirin.

LIVENED, *adj.* : geş kirî, jiyane kirî.

LIVENING, *n.* : geşkirin, jiyane kirin.

LIVE.R, *n.* : kezeb, cerg, ceger, pi şa reş, plşa Spl.

• COMPLAINT : nesaxiya cergi,

• FLUKE : kirmikê cergî.

LIVERIED, *adj.* : eilkirî, kinckirî.

LIVERISH, *adj.* : cergî, ce gerî, bedmad, cergnesax.

LIVERWORT, 11. : giyayê cegerî, helezek kevzî ye.

LIVERY, 11. : cil û xurek (bo xizmetkaran), alîka hespan, cilên taybetî yê hevkar~yan ~i~metkart endamiya hevanya bajêrî, guhaztina samanî.

- COMPANY : yekîtiya pişegeran.

- MAN : pişegerê yekîtiyê.

- STABLE : tewleya erebaneyan.

LIVERY, *adj.* : cergî (reng û birîfî), cegerî, bed cerg, bedmad, enirok.

LIVESTOCK, *n.* : terş, dewar, ajal.

LIVEWIRE, *adj.* : mirovê dirrê çalak.

- LIVID, *adj.* : pêtî, şîn (ji lêdanê).
- LIVING, *n., adj.* : jiyana, jîn, giyandar, aborî, debar, jînkari, zîndewer, jîwarî.
- BEING: zîndewer.
 - DEATH: jiyana mirinî (ne hêja).
 - ROOM: biwara jiyane.
 - WAGE: têr kirê (ko têra jiyane bikit).
- LIXIVIATE, *vt.* : delîn kirin, sepî kirin.
- LIXIVIATED, *adj.* : delînkirî, sepîkirî.
- LIXIVIATING, *n.* : delînkirin, delandin, sepîkirin.
- LIZARD, *n.* : kim kirne, marmêlke, bafîşmar, dêlemar, gumgimok, marmarek, marijok, sûsmar, şewgerd, bûkmar, marmaroşk, pezmişk, margêsk.
- GECKO: rnarमारोक.
 - SMALL -: rnarमारोक.
- LOACH, *n.* : masiyek biçûk rûbarî ye.
- LOAD, *n.* : lod, bar, piştî.
- LIFTING: barhelgirtin, barkêşî,
- LOAD, *vt.i.* : bar kirin, dagirtin (tifeng ...).
- TO-UP: barî lê kirin.
- LOADED, *adj.* : barkirî.
- LOAOER, *n.* : barker.
- LOAOING, *n.* : barkirin, (bar) dagirtin, tîjîkirin.
- CHARGE: barane.
 - UP: bar lê kirin.
- LOAOS, *n.* : bar, barxane.
- LOAF, *ll.* : kolêre, sewik.
- LOAF, *vl.* : tembelî kirin, ba pîvan.
- LOAFER, *n.* : tolaz.
- LOAFING, *n.* : bapîvanî.
- LOAM, *n.* : têkiliya teqn û xîz û zilkan, axa vî têkiliyê (bo qalibên dariştinê),
- LOAN, *n.* : pêşîne, wam .
- WORD: peyiva biyanî (dizimanekê de).
- LOAN, *vt.* : qer kirin.
- LOANABLE, *adj.* : qerbar.
- LOANEE, *n.* : qerbir.
- LOANER, *n.* : qer ker.
- LOANING, *n.* : bêriya çêlan, kolan.
- LOATH, *adj.* : bêzar.
- LOATHE, *vt.* : bêzar kirin.
- LOATHED, *adj.* : bêzarkirî.
- LOATHING, *n.* : bêzarkirin, qêz, bêzarkirin.
- LOATHINGLY, *adv.* : bi bêzarî.
- LOATHLINESS, *n.* : bêzarî.
- LOATHLY, *adj., adv.* : zinx, bi bêzarî, bêzarîkî.
- LOATHSOME, *adj.* : bêzar, kîndar.
- LOB, *n.* : mirovê gewc yan xirpo, tepka havêti (kirîkit yan tenîs),
- LOB, *vt.i.* : tepk havêtin (kirîkit yan tenîs), hêdî û giran livîn.
- LOB(O), *pref.* : pêşgir e ko kakilkî ye.
- LOBER, *adj.* : kîzikirî,
- LOBATE(O), *adj.* : kizîkirî,
- LOBATION, *n.* : kizi (kirin).
- LOBBIED, *adj.* : bizav kirî (bo qayilkirinê).
- LOBBY, *n.* : daman yan jora civatê (bo bizava qayilkirinê).
- LOBBY, *vt.i.* : bizav kirin ko endamên civatekê qayil bikit (li babetî karekê yan qanûnekî).
- LOBBYING, *n.* : bizavkirin (bo qayilkirinê).
- LOBE, *n.* : pil, falik.
- OF EAR: nermika guhî.
- LOBECTOMY, *n.* : helkêşana falikekî yan kîziyekê (ji pişeyî, bo nimûne).

LOBED, *adj.* : kîzîkirî, falikirî.
LOBELID, *n.* : helezek giyayî gul şîn, sor yan binefî ye.
LOBLOLLY, *n.* : gewc.
• BOY, MAN: harîkerê neşterkarî.
LOBOTOMIZE, *vt.* : berahiya mejî helkêşan, bêhêz yan bêhiş kirin.
LOBOTOMIZED, *adj.* : bêhêzkirî, bêhişkirî, falikek ji mejiyê berahî helkêşayî.
LOBOTOMIZING, *n.* bêhêzkirin, bêhiş kirin, helkêşana falikekê ji mejiyê berahiyê.
LOBOTOMY, *n.* : helkêşana kîzî yan falikê mejiyê berahiyê.
LOBSCOUSE, *n.* : amanek (danek) goşt û zerzewate.
LOBSTER, *n.* : kêvjaleyê deryayî, kuliyê deryayî.
- POT : telheya girtina kêvjaleyê deryayî.
LOBULAR, *adj.* : kîzîkî.
LOBULATE, *adj.* = LOBULAR.
LOBULE, *n.* : kîzîk.
LOBWORM, *n.* : kirmek axê mezin e (bo timloka masiyan).
LOCAL, *n., adj.* : cîkî, ciyî, cihîtkî), xumalî, rawestayî li hemî êzgehan, hev kêşana radiwestit li hemû êzgehan, nûçeyek cîkî (di nav rêkxirawekê).
• COLOUR : rengê cîkî (bo nûçeyê yan bûyerê).
• GOVERNMENT : hikumeta cîkî (bajêrvanî).
• OPTION : mafê deverî, helbijartina cîkî.
LOCALE, *n.* : dir.
LOCALISM, *n.* : cîkî tî.
LOCALITE, *n.* : gerekî, tax.
LOCALITY, *n.* : dever, gerek, tax.

LOCALIZABILITY, *n.* : cîkî kirin barîfî.
LOCALIZABLE, *adj.* : cîkîkirinbar.
LOCALIZATION, *n.* : cîkîkirin. LOCALIZE, *vt.* : cîkî kirin .
LOCALIZED, *adj.* : cîkîkirî.
LOCALIZING, *n.* : cîkîkirin.
LOCALLY, *adv.* : bi cîkî yan ciyî, cîkîkî.
LOCATE, *vt.* : (cî) diyar kirin, nişte kirin, danan.
LOCATION, *n.* : dever, Cî, cih, şûn, dir, der.
LOCATIONAL, *adj.* : şûnî, dirî.
LOCATIONALLY, *adv.* : bi dirî, direyekî.
LOCATIVE, *n., adj.* : hokerê cihikî.
LOCH, *n.* : gol, ger.
LOCHIA, *n.* : derbûna mal biçûkî piştî biçûkbûnê.
LOCHIAL, *adj.* : pêwendidarê derbûna malbiçûkî.
LOCK, *n.* : kod, çilnîre, guliya pirçê yan porê.
• OF HAIR : gulî, perçem.
• OF WOMAN'S HAIR : bisk.
- OUT : derkirin, derxistin.
LOCK, *vt. i.* : girtin, bi kilîlê girtin, zîndan kirin, pengî borandin.
• TO - AWAY : wêve danan.
• TO - IN : mirovek girtin (kirin nav jorekê de).
• TO - OUT : li derve hêlan (bi girtina derî).
LOCKABLE, *adj.* : daxistinbar.
LOCKAGE, *n.* : penge bo borandina gemiyê di nav nukendî de.
LOCKER, *n.* : dolaba kodkirî, sindoqa girtî.
• PAPER : kaxeza pêçana xureka befirkirî û embarkirî.

• ROOM : jora kodkirî.
 LOCKET, *n.* : qotîk (bi stûvankî ve).
 LOCKING, *n.* : zitim.
 LOCKJAW, *n.* : guh reqî, derdegupan.
 LOCKNUT, *n.* : pêçgira qayimkirinê.
 LOCKOUT, *n.* : derxistin.
 LOCKSMITH, *n.* : kodkar.
 LOCK STITCH, *n.* : dirîna dutayî,
 LOCK STOCK AND BARREL, *adu.* hemû,
 hemî.
 LOCKUP, *n.* : girtin, zindankirin.
 LOCO, *n.*, *adj.* : dîn, har, heleza hariyê.
 LOCO, *vt.* : (terşî) har kirin yan dîn kirin,
 jehr kirin.
 LOCOFOCO, *n.* : zilkê şixatê ko bi lêkxişînê
 helbûn, endamê partiya demokrata
 wîlayetên yekgirtiyên emerîkanî.
 LOCOISM, *ll.* : harî yan dîniya terşî.
 .LOCOMOTE, *vt.* : gerandin, livandin.
 LOCOMOTED, *adj.* : gerandî, livandî.
 LOCOMOTING, *n.* : gerandin, livandin.
 LOCOMOTION, *n.* : livîn, guhêz. LOCOMOTIVE,
n., *adj.* : guhêzdar, livîndar,
 guhêzî, gerok.
 • ENGINE : bizwên yan makîneya livînê.
 LOCOMOTOR, *adj.* : livîn kî.
 • ATAXIA : têkçûna destgeha demarî. °
 ORGANS : endamên livînê.
 LOCOMOTORY, *adj.* : livîndar.
 LOCOWEED, *n.* : heleza hariyê.
 LOCULAR OR LOCULATED, *adj.* : kunikî, kilorî,
 xanedar.
 LOCULATION, *n.* : kilorbûn.
 LOCULE, *n.* : xaneyê hêkdanka pêkhatî.

LOCULUS, *n.* : kilor, valatî .
 LOCUM TENENS, *n.* : cîgirê oldarê yan
 pijîşkî.
 LOCUS, *n.* : cihê endazyarî, cêgay endaz-
 yarî, dir, cih.
 ° CLASSICUS : hevok yan derberrîna
 nemir.
 LOCUST, *ll.* : kulî, kule.
 LOCUTION, rêbaza axiftinê, derberrîn.
 LOCUTORY, *n.* : jora berhevdanê (li dêrê).
 LODGE, *n.* : celal.
 LODGE STAR, *n.* : stêra rêber nexasme ezmîn.
 LODGE STONE, *n.* : berê magnetîzî, her tiştê
 kêşdarê qayim.
 LODGE, *n.* : pena, xaniyê niştebûna dem-
 darî.
 LODGE, *vt. i.* : hewandin, hewîn.
 LODGED, *adj.* : he wan dî.
 LODGER, *n.* : nişteçî, nişteçê (mêvanê kirê
 didit).
 LODGING, *n.* : jîngeh, rasipartin, hewandin,
 siparde.
 • HOUSE: xaniyê bi jorên raxistî bo kirê.
 LODGMENT OR LODGEMENT, *n.* : xanî, pena,
 hewandin, ra sipartin, gilî kirin, tiştê
 kombûyî, mal, jora kirêkirî (li mala
 mirovek dî), karê bergiriyê demdarî li
 ser erdê dijminî.
 LOFT, *n.*: bilindî, qat yan nihûrnê bilind,
 kadîn, embara kayê, lédana bilinda
 tepkê, berzî, balayî.
 LOFT, *vt. i.* : embar kirin (li eliyê), li tepkê
 dan (da ko tîj bilind bibit), bala kirin.
 LOFTER, *ll.* : berê golfê.
 LOFTILY, *adv.* : bi balayî, balayikî.
 LOFTINESS, *n.* : balayiti, berzîtî, berzayî,
 semyan.

LOFTY, *adj.* : berz, bala, bilind, şikûdar.

LOG, *n.* : logarîtm, kolkedar, darê sotandinê, êzing, gizre, tomar, kirat.

• BOOK : tomar (ya gemiyê, balafirê û her karî).

• SELLER : êzingfiroş.

• WOOD : darê êzingî.

LOG, *vt.* : tomar kirin.

LOG(O), *pref.* : pêşgir e ko peyiv e, axiftin, hizir e.

LOGANBERRY, *n.* : tiya logan.

LOGAOEDIC, *adj.* : kêştêkil.

LOG = LOGARITHM, *n.* : logarîtm.

LOGARITHMIC, *adj.* : logarîtmî.

LOGE, *n.* : loc : xaneya sînemayê yan şanogeriyê.

LOGGED, *adj.* : girankirî, tomakirî. LOGGER, *n.* : darbirr, darvan, êzingvan.

LOGGERHEAD, *n.* : sermezî (kîseleyek deryayî mezin e), gewc, xirp.

- AT-SWITCH : şer kirin, cerenîx kirin.

LOGGING, *n.* : darbirrîn, tomakirin.

LOGIC, *n.* : jîrbêjî, jîrî.

LOGICAL, *adj.* : jîrbêj.

LOGICALITY, *n.* : jîrbêjîtî.

LOGICALLY, *adv.* : bi jîrbêjî, jîrbêjîkî.

LOGICIAN, *n.* : jîrbêjzan.

LOGION, *n.* : pendexiftin, pend.

LOGISTIC, *n.* : jîrbêjiya hêmayî, kardariya şerî.

LOGISTICS, *n.* : kardarîzaniya şerî.

LOGJAM, *n.* : tenga vî, têtîrane.

LOGO, *n.* : dirûşm.

LOGOGRAM, *n.* : tîp, nişan yan hêma ya nimînderê peyivê.

LOGOGRAPH, *n.* = LOGOGRAM.

LOGOGRAPHER, *n.* : kevnedîrokvanê pexşaniyê Girek.

LOGOGRIPH, *n.* : alozî yan meteloka bêjeyî.

LOGOMACHY, *n.* : şerbêjeyî.

LOGORRHEA, *n.* : pîrbêjî, çenebazî.

LOGOS, *n.* : hiş, seretaya hişiya gerdûnî, peyiva xudayî.

LOGOTYPE, *n.* : du yan sê tîp pêkve dariştî.

LOGROLLING, *n.* : girêlkirina daran (di nav avê de).

• LOG OR LOGUE, *Suff.* : paşgir e ko berhevdan e, suhbet e, axiftin e.

LOGILY, *adv.* : bi zexelî, zexelîkî.

LOGY, *adj.* : zexel.

- LOGY, *Suff.* : paşgir e ko derberrîna lêvikî yan nivîskî ye.

LOJN, *n.* : şermecê, navqed.

• CLOTH : damen, piştamal.

LOITER, *vi.* : bapîvî kirin, tembelî kirin, gîro bûn.

LOITERER, *n.* : serserî.

LOITERING, *n.* : ba pivanî, serserîtî.

LOLL, *vt. i.* : sist bûn, dahêlan, tembelî kirin.

LOLLIPOP, *n.* : şîrînayî (çoklêt), şekirk.

LOILOP, *vi.* : tembelî kirin, xwe sist kirin, lîtikî çûn.

LOILY, *n.* : şîrînayî,

LOILYGAG, *vi.* : bapîvanî kirin.

LOMBARD, *n.* : diravkar.

• STREET : kolana diravkariya London.

LOMENT, *n.* : texlîtek tovê helezi yê ko dişkê hînga digehit.

LONDON, *n.* : serbajêr yan paytextê dewleta Brîtanya Mezin.

LONE, *adj.* : bêkes, bêheval, tenya.
 LONELINESS, *n.* : yekanî, *têki*, bêkesîti, tenyayî.
 LONELY, *adj.* : bêkes, tenya, yekane, biçûn.
 LONENESS, *n.* : tenyatî.
 LONESOME, *adj.* : bêkes.
 LONG, *n., adj., adv.* : dirêj.
 • A •• FACE : rûyê mirîto. -
 AS •• AS : hindî ko.
 - AT " LAST : dûmahiyê, piştî hind xwe girtinê.
 - IN THE " RUN : dûmahîkê.
 - CLOTHES : cilkên savayî.
 - DRINK : vexwarina di nav perdaxa dirêj de.
 - DAGGER : qeme, qame (xencera dirêj).
 - EARS : xirpoyê wek kerî (guhdirêj).
 - FAMILY : têrbiçûk (malbat).
 - FINGER : *tila* duwem.
 - IN THE TOOTH : pîr.
 - JUMP : bazdana dirêj.
 - LEECH : zêroyê dirêj.
 - LIVE! = her bijî!
 - MEASURE : pêveka dirêjîyê mîl, yarde, kîlometir
 - RANGE : mewda dirêj. •
 ROBE : cilên qanûnî.
 - SERVICE : serbazîya demdirêj.
 • 50 •• : bi xatra te, ûxir.
 • SUFFERING : aram, dîlfîreh.
 • SUIT : karê mirov têde bi ser dikevit.
 • TERM : demdirêj.
 "THE" AND THE SHORT OF IT : hemû tiştê pêviyayî gotin.

- TON : ten ya înglîzî (2240 pawin),
 - TONGUE : zimandirêj.
 - VACATION : pişoya dirêj.
 - WAYE : pîla dirêj.
 - WINDED : bêhndirêj.
 - WISE : dirêjane.
 LONG, *vi.* : bêrî kirin.
 LONGANIMITY, *n.* : peşedirêjî, aramî .
 LONG BOAT, *n.* : belema dirêj.
 LONG BOW, *n.* : kevana dirêj. LONG-DISTANCE, *adj., adv., n.* : dûr, dûr û dirêj, dirêj, dûrbihîsa dûr, pêwendîdarê vê dûrbihîsa dûr.
 LONG DIVISION, *n.* : dabeşkirina dirêj. LONG DOZEN, *ii.* : derzenê dirêj (sêzdeh şûna diwazdehan),
 LONGERON, *n.* : perasûyê dirêjê serekî.
 LONGEVITY, *n.* : jîdirêjî.
 LONGEROUS, *adj.* : jîdirêj.
 LONG HAIR, *ii.* : hunerxwaz, hizirvanê nekirdar (dirêje pirç yan por).
 LONG-HAIRED, *adj.* : pirç yan por dirêj : . hizirvanê nekird ar, hunerxwaz.
 LONG HAND, *n.* : nivîsîna asayî (bi destî).
 LONG HEAD, *n.* : mirov yan serê kilox dirêj.
 LONGHEADED, *adj.* : pendiyar.
 LONGHORN, *n.* : qoçdirêj.
 LONGI, *pref.* : pêşgir e ko dirêj e.
 LONGICAUDAL, *adj.* : dûvdirêj.
 LONGICORN, *ii., adj.* : şaxikî : kêzên şaxdirêj, duşaxikên hestiyarên dirêj, kêza du şax gelek dirêj.
 LONGING, *n.* : awat, bêrîkarî, arezû, bêrîkirin, bêrî, pirge, xwezî, soj, mehbîran, mehîran, dilxwazî.
 LONGISH, *adj.* : piçekê dirêj.

LONGITUDE, n. : hêla dirêjyê. **LONGITUDINAL, adj.** : dirêjkî. **LONGITUDINALLY, adv.** : bi dirêjkî, dirêjkî. **LONG-UVED, adj.** : jîdirêj, berdewam, demekdirêj.

LONG PLAY, II. (LP) : qawinê tîrek 10-12 înç.

LONG-SHOREMAN, n. : karkerê valakirin yan barkirina gemiyê.

LONG SHOT, n. : pêşbezê zehmet bi ser bikevit.

LONGSIGHTED, adj. : (çav) dûrbîn.

LOO BY, n. : mirovî hol.

LOOF, n. = **LUFF.**

LOOFAH, n. : tovê helezê tof e.

LOOK, n. : dîtin, bîn, nêrîn, awîrek, nîgar, fikirîn, bal, mêzekirin, avir, mêze.

LOOK, vU. : nêrîn, dîtin, mêze kirin, berê xwe dan.

- **ALI VE!** - **SHARP!** : zû! bilezîne!

• **TO - AT** : dîtin, nêrîn, temaşe kirin.

- **TO - ABDUT ONE** : hişyar bûn, wurya bûn.

- **TO - AFTER** : guhê xwe dan (kesekê yan tistekê), sexbîrî kirin.

• **TO - AHEAD** : berê xwe dan pêş anko paşerojê.

- **TO - A PERSON INTO THE FACE** : aza rûberî kirin.

- **TO - BACK** : berê xwe dan paş.

- **TO - BLACK** : enirî yan mirî to diyar bûn.

- **TO .. BLUE** : mirîto yan tore, enirî, diyar bûn.

• **TO .. DOWN OR UPON** : guh nedan, nizim dîtin.

- **TO .. DOWN ONE'S NOSE** : nîv kirêtî berê xwe danê.

• **TO .. FOR** : lê gerûl.

• **TO - FORWARD TO** : bêrî kirin.

• **TO .. IN OR ON HIM** : kurt sera dan (yan serdan kirin).

• **TO" INTO** : qenc berê xwe dan, kitêb bi lez dîtin yan xwandin.

• **TO .. ON OR UPON WITH DISTRUST** : gomandarî dîtin.

- **TO - ONESELF AGAIN** : sax bûn.

- **TO .. OUT** : agehdar bûn, hindav dîtin.

- **TO - SOMETHING OUT** : helbijartin.

- **TO .. OVER** : seh kirin, pişkinandin, lê borîn.

• **TO .. ROUND** : berê xwe dan dor û bera (berî tiştêkê bikit).

- **TO .. THROUGH** : taze çavê xwe gerandin.

• **TO .. TO** : zêrevanî kirin, tiştêk hîvî kirin, guh dan.

OTO" UP : çavê xwe rakirin selal.

OTO .. (A PERSON) UP : serdana filanî kirin.

- **TO .. (A PERSON) UP AND DOWN** : berê xwe dan ser û binê bêvanî.

LOO KER, n. : bîner.

- **ON** : temaşeker.

LOOKING, n. : dîtin, nêrîn, bînîn, mêzekirin, fikirîn.

- **FOR** : lêgeran.

- **SHARPLY** : zîq dîtin.

- **UP** : serveçûn.

LOOKING GLASS, n. : xwedîk, awêne.

LOOKS, n. : bejn û bal.

LOOKOUT, II. : dîdevan.

LOOM, n. : xanût, şebengdor, tevn, tewn, diyarbûna şêliya tiştêk dûr, li tariyê yan di nav mijê de.

LOOP-PIT, *n.* : pêçal.

LOOM, *vt.* : (şêlî) diyar bûn.

LOON, *n.* : bapîv, gundiyê xirpo, bapîv, har û dîn, sade, sakar, balindeyek noqar masîxwer e.

LOON(E)RY, *adj.* : dînoke.

LOOP, *n.* : gêjena daxistî, girê, kol pek, qulle.

LOOP, *vt.i.* : gîjen temam kirin, firîn û wergêran, girîdan, kolpekî girtin.

LOOPER, *n.* : cobirr.

LOOP-HOLE, *n.* : gulêr, kunka havêtinê, derbazî (bin).

LO~P-HOLE, *vt.* : gulêr kirin, kunk vekinn.

LOOSE, *adj.* : sist, şil, nehedan, serbest (berdayî), vekirî, felîte.

- BOWELS : (hinav) zikçûyi.
- BOX : deftera jimêyarî ko her kaxez yan laper jê derdikevin.
- BUILD : bejinkirêt.
- END : rexê berdayî, dahêlayî.
- FIELDING : ne hişyar.
- JOINTED : movik vekirî, serbest ko bilivî.
- LEAF : laperê dihêt der.
- REIN : hefsar berdayî.
- TONGUE : pîrbêj, çenebaz.
- ON THE - : berdayî.
- THERE IS A SCREW - SOMEWHERE : tiştekek çewt e li direkê.
- TO GIVE A - TO : devê xwe vekirin. -
- TO HAVE A SCREW - : piçekê dîn e.
- TO LET OR SET - : berdan.

LOOSE, *vt.* : sist kirin, vekirin.

LOOSED, *adj.* : sistkirî.

LOOSELY, *adv.* : bi sistî, sistîkî.

LOOSEN, *vt.i.* : sist kirin.

LOOSENED, *adj.* : sistkirî.

LOOSENESS, *n.* : sistî, xaw bûn, dahêzran.

LOOSENING, *n.* : sist kirin, dahêzran, sistbûn. LOOSING, *n.* : sistkirin.

LOOT, *n., vt.i.* : talan, talan kirin.

LOOTING, *n.* : talan, rifandin.

LOP, *n.* : çiqê birrî, çiqê biçûk, kizax. ·

- EARED : guhşorkirî.

LOP, *vt.i.* : baz dan, şor bûn, birrîn, law kirin (dar), kezax kirin.

LOPE, *17.* : bazdan, fort.

LOPE, *vi.* : baz dan, fortekî çûn.

LOPER, *n.* : bazder.

LOPPED, *adj.* : kezaxkirî.

LOPPER, *11.* : bodemkar, kezaxkar. LOPPING, *n.* : bodemkirin, kezax, bodem, pejilanding.

LOPPY, *adj.* : sist, xav.

LOPSIDED, *adj.* : rexeqî, nehevseng, kêr-nehâtî.

LOPSIDEDLY, *adv.* : bi rexeqî, rexeqîkî, kêrehatîkî.

LOPSIDEDNESS, *n.* : rexeqîtî.

LOQUACIOUS, *adj.* : çenebaz.

LOQUACIOUSLY, *adv.* : bi çenebazî, çenebazîkî.

LOQUACIOUSNESS, *n.* : çenebazîtî.

LOQUACITY, *n.* : çenebazî(tî).

LOQUAT, *n.* : darek gulî ye, berdar e.

LORAN, *n.* : alava loran: bo diyarkirina cihê balafirê yan gemiyê.

LORD, *n.* : lord, mîr, beg, axa, Xweda.

- CHAMBERLAIN : serekrazgir.
- CHANCELLOR : serokê civata lordan (pîran).

LORD, *vi.t.* : zordarî kirin.
LORDLINESS, *n.* : lordîfî, serdestî, şikûdarî, rûmetî.
LORDLING, *n.* : lordê biçûk: lordik. **LORDLY**, *adj.* : lordî, şikûdar, rûmetdar. **LORDOSIS**, *n.* : pişt qopî, fort.
LORD'S DAY, *n.* : yekşemb, êkşemb.
LORDSHIP, *n.* : xonkarî.
LORD'S PRAYER, *n.* : nivêja Xudayî.
LORD'S SUPPER, *n.* : şîva Xudayî.
LORD'S TABLE, *n.* : sifreya Xudayî.
LORE, *n.* : zanîn.
LORICA, *n.* : zirêyê Romanî.
LORICATE, *adj.* : zirêkirî.
LORIKEET, *n.* : texlîtek tûtî ye.
LORIS, *n.* : meymûnek Hindî ye.
LORN, *adj.* : hejar.
LORRY, *n.* : lorî: barkêş.
LOSABLE, *adj.* : windabar, berzebar, doranbar.
LOSE, *vt.i.* : winda kirin, berze kirin, dorandin.
OTO : **FACE** : bê rûmet bûn.
OTO - GROUND : paşve çûn, çîz kirin.
OTO - ONE'S HEAD : şaş bûn.
• TO - ONE'S PLACE : şûna rêza kitêbê (dir) jî bîr kirin.
• TO - ONE'S REASON (OR SENSES) : har bûn.
• TO - ONE'S TEMPER : enirîn.
• TO - OUT : dorandin (pêşbirke yan pêşbezin).
LOSEL, *n.* : pûçemirov.
LOSER, *n.* : dorankar.
LOSING, *n.* : windakirin, hinda kirin, dorandin, berzekirin.

LOSS, *n.* : bizir, hindakirin, windakirin, berzekirin, dorandin, ziyar, tem.
• OF CONSCIOUSNESS : veporsîn.
• OF HAIR : mûwerîn.
• OF MEMORY : bêbîrî,
• RATIO : rêjeya dorandinê.
LOST, *adj.* : gum, şaş, dorandî, bizir, hinda, winda, win, hindabûyî, berze.
LOT, *n.* : lat, peşk, çîtik, axpîne, behr, hejmarek zehf, pir(r), gelek, zorbext, têrûpişk.
- TO CAST -S : bext kêşan. **• TO DRAW -S** : bext kêşan.
LOT, *vt.* : dabeş kirin.
LOTHARIO, *n.* : jinbaz.
LOTION, *n.* : hetwan, nermker.
LOTTED, *adj.* : dabeşkirî. **LOTTERY**, *n.* : peşk, pişk. **LOTTING**, *n.* : dabeşkirin.
LOTTO, *n.* : game yan ya riya bextî wek peşkî.
LOTUS, *n.* : zebat, nîlûfer, mertek, lotis.
• EATER : zebatxwer.
• LAND : welatê zebatê.
LOUD, *adj., adv.* : bilind, berz, denggirs, boq.
• BURST OF LAUGHTER : tîq; pîrç.
• SPEAKER : dengbilindker, dengewere, gewrekerê.
• WEEPING : zêmar, qareqar.
LOUDEN, *vt.i.* : biling kirin, bilind bûn (deng).
LOUDISH, *adj.* : piçekê bilind.
LOUDLY, *adv.* : bi dengberzî. **LOUDMOUTHED**, *adj.* : pîrbêjê dengzî. **LOUDNESS**, *n.* : dengbilindî, dengbilindkî.

LOUGH, *n.* : ger(av), kendaw.
 LOUIS, *n.* : kevnediravê firensî.
 LOUNGE, *n.* : velezîn.
 ..CAR: fargona vesihînê (velezînê).
 LOUNGE, *vi.t.* : velezîn.
 LOUR, *n.* : rûtirş.
 LOUR, *vi.* : rûyê xwe tirş kirin.
 LOUSE, *n.* : speh.
 ..WORT : giyaspeh.
 LOUSINESS, *n.* : çepelîfî, pîsî, kotî.
 LOUSY, *adj.* : spehî, pîs, çepel.
 LOUT, *n.* : mirovê gewc, xirpo, hol. LOUT,
vi.t. : çîz kirin, (bi rûmet) çemîn.
 LOUTISH, *adv.* : piçekê hol, xav. LOUTISHLY,
ado. : bi holî.
 LOUTISHNESS, *n.* : holîfî, holîkî.
 LOUTS, *adj.* : lofî.
MARTIN, *n.* : hacîreşk, pereslêr.

MARTINET, *n.* : efsere bandûbariyê.

MARTINETISM, *n.* : bendûbarîfî. **MARTINGALE**,

n. : qayîşa tenga xurcezînî. **MARTINI**, *n.* :

martînî : texlîtek şerab e. **MARTLET**, *ll.* :

hacîreşk, pereslêr.

MARTYR, *ll.* : giyanbexş, şehîd. **MARTYRDOM**,

n. : giyanbexşî, cangorîfî. **MARTYRIZATION**,

ll. : şehîdbûn, cangorîbûn. **MARTYRIZE**, *vt.* :

şehîd kirin. **MARTYROLOGY**, *n.* : tomara

şehîdan. **MARTYRY**, *n.* : şehîdgeh.

MARVEL, *ll.* : ecêb, sosret.

MARVEL, *vt.* : ecêbî girtin, sosret girtin.

MARVELLED, *adj.* : ecêbîgirtî, sosretgirtî.

MARVELLING, *n.* : sosretgirtin, ecêbgirtin.

MARVELLOUS, *adj.* : serzivirîn, sersorîn, ecêb.

MARXIAN, *adj., n.* : Marksî: bawermendê îdeolojiya Karl Marksî.

MARXISM, *n.* : marksîzm : dîtaneya ramiyarî û aboriya Marksî bo hel weşîna samanê xwemalî û avakirina civatek civakî.

MARZIPAN, *n.* : şîrînayî (bahîv, şeker û şîlka hêkê).

MASCARA, 11. : kil, matik.

MASCON, *n.* : madeyê dagirtiyê rakêşerê xurt li jêr rûyê heyvê.

MASCOT, *n.* : bextdar. MASCULINE,

adj., *n.* : nêr, nêrîn. - FORELOK :

bijî.

MASCULINITY, *n.* : nêrîtî, mêranî, zelamîûî).

MASER, *n.* : meyzer, *n.* : alave bo mezin-kirina pirteya kehrebî (bi derperîn û handana fîrêjan).

MASH, *n.* : lepeherîşan (genim yan malt // ceh // şîlkirî û tenkvedayi di nav ava germ de bo çekirina bîreyê, têkiliya genim, pîne û ava germ (bo alîkê), seydayî.

MASH, *vt.* : herîşandin, şil kirin, evînî kirin.

MASHED, *adj.* : kutayî, qutayi, herîşandî. - POTATOES : kartola kutayî yan herîşandî.

MASHER, *n.* : alavka herîşandinê, evînkar.

MASHIE, *n.* : texlît ek darê goHê ye.

MASHITE, *n.* : asinkê goHê.

MASK, *n.* : bîzmik, hendeg, rûpûş, rûbend, maske.

MASK, *vt.* : hendeg kirin, rûpûş kirin.

MASKED, *adj.* : hendegkirî, rûpûşkirî.

MASKER(QUER), *n.* : rûpûşkar, rûbendkar.

MASKING, *n.* : hendegkirin, perdekirin.

MASKINONGE, *n.* : masiyek mezin e.

MASOCHISM, *n.* : hezkirina xwelêdanê

yan xwezarkirinê û xweêşandinê (masoşîstî).

MASOCHIST, 11. : hezkerê xwelêdanê û xweêşandinê (masoşîst),

MASOCHISTIC, *adj.* : pêwendîdarê xwe lêdanê.

MASON, *n.* : hostayê avakirinê, avakerê serbest, avaker (fermeson).

- BEE : mêşingvîna avaker.

- JAR : cerê avakerî (amanek dijba ye).

- WASP : zilkêtkî avakerî.

MASON, *vt.* : ava kirin.

MASON-DIXON, ~ LINE, *n.* : sinorê navbera wîlayetên Merîlend û Pensîlvanya ko radeyê bendeyiyê bo li wîlayetên yekgirtiyên Emerîka.

MASONIC, *adj.* : avakerî, masonî (fermesonî).

MASONRY, *n.* : avagerî, avahî, avakirin.

MASQUE OR MASQUERADE, *n.* : kurteşanogerî.

MASQUER, *n.* = MASKER.

MASQUERADE, *n.* : ahenga qirdikî (nepenî kirinî), cilên nepenikirinê, nepenîkirintqirdikî).

MASQUERADE, *vi.* : nepenî kirin, qirdikî kirin, beşdariya ahenga qirdikîkirinê.

MASQUERADED, *adj.* : nepenîkirî.

MASQUERADING, *n.* : nepenikirin.

MASS, *n.* : nivêja giroyî (filehên katolîk) yan civarî.

MASS, *n.* : lok, comik, barist, gomçik, topel, çînên karker, gulor, komelî.

- CARD : karta agehdariya nivêja giroyî (civatî).

- DESTRUCTION : komkuj.

- SPECTRUM : şebenga barist.

MASS, *vt.*, *i.* : topel kirin, lok kirin.

MASSACRE

- MASSACRE, n.** : qelaço, kuştar, serbirrgeh, komkujî, komelkujî, kuştarî.
- MASSACRE, vt. i.** : ser jê kirin, kom kuştin (kuştarî).
- MASSACRED, adj.** : kuştarkirî.
- MASSACRING, n.** kuştan kirin.
- MASSAGE, n.** : perxan, têdan, gemirandin.
- MASSAGE, vt.** : perxankirin, gemirandin.
- MASSAGED, adj.** : perxandî, gemirandî.
- MASSAGING, n.** : perxandin, gemirandin.
- MASSASAUGA, n.** : zengdarê biçûk (mar).
- MASSSES, n.** : elalet, xelk, komelan, civar.
- MASSETER, n.** : masûlkeya cûtinê. **MASSICOT, n.** : yekem oksîdê zirêçê. **MASSIF, n.** : parçeya serekiya çiyayî yan sirta çiyayî.
- MASSIVE, adj.** : ejdeha, mezin, gewre, zil.
- MASSIVELY, adv.** : bi ejdehayî, ejdehakî.
- MASSIVENESS, II.** : ejdehayîtî,
- MASS PRODUCE, n.** : komberhemkirin.
- MASS PRODUCTION, II.** : komberhemkirin.
- MASSY, adj.** : mezin, giran.
- MAST, n., vt.** : darbabirek, darala, dar babirek kirin.
- MAST-, prer** : pêşgir e ko çîçik e, memik e.
- MASTABA, n.** : gorrek Firewnî lakêşe ye.
- MASTECTOMY, n.** : çîçikberrîn, memikraki-
rm.
- MASTER, II.** : hosta, seyda, axa, rajor, xudan, rajorek, serwer.
- **AT-ARMS** : efserê bendûbariya gemiyê.
 - **KEY**: kilîla giştî.
 - **PIECE** : nawaze, nayab, qetlaz, şakar.
 - **'s SON** : pisaxa.

MASTOIDECTOMY

- **STROKE** : karek hostayî.
 - **WORK** : nawaze, qetlaze, şakar.
- MASTER, vt.** : tepeser kirin, pispor bûn.
- MASTERFUL, adj.** : zordar, şehreza.
- MASTERFULLY, adv.** : bi şehrezayî, şehrezakî.
- MASTERFULNESS, n.** : şehrezayîtî.
- MASTERLINESS, n.** : hostayîtî), hostatî.
- MASTERLY, adj., adv.** : hostayî, bi hostayî.
- MASTERMIND, n.** : hişa rêber, serekpîlangêr.
- MASTER OF CEREMONIES, n.** : kardarê şahînetan.
- MASTERSHIP, n.** : rajorî, serdestî, serwerî.
- MASTERSINGER, n.** : hostastranbêj. **MASTERY, n.** : serdestî, axayî, axatî, serwerî, zalî, şarezayî, hunerwerî.
- MASTIC, n.** : qaçik, dare qaçikî, mestekî.
- **TREE** : darê qaçikî.
- MASTICATE, vt.** : hevîr kirin, cûtin.
- MASTICATED, adj.** : cûtî, cîfî.
- MASTICATING, n.** : cûtin, cûtin.
- MASTICATION, n.** : cûtin, cûtin, cûn, cûyîn, loçkandin, cûtin.
- MASTICATOR, n.** : cûtinkar, cûtinkar.
- MASTICATORY, adj.** : cûtinî, cûtinî, benîşt, qaçik.
- MASTIFF, n.** : texlîtek seyê pasewanî.
- MASTITIS, n.** : memikkulî.
- MASTODON, n.** : dehbeyek nemayî (wek filî bû).
- MASTOID, adj., n.** : hestîmemikî, hestîmemikî kulbûn, çîçeyî, memikî, çîçikî.
- **CELL** : xaneya hestîmemikî.
 - **OPERATION** : kirdara hestîmemikî.
- MASTOIDECTOMY, n.** : helkêşana hestîmemikî,

MASTOIDITIS, 11. : kulbûna hestîmemikî.

MASTURBATE, *vi.* : destperî kirin.

MASTURBATED, *adj.* : destperikirî.

MASTURBATING, *n.* : destperîkirin.

MASTURBATION, *n.* : destperîkirin.

MASTURBATORY, *adj.* : pêwendîdarê destperîkirinê.

MASURIUM, *n.* : masoryom : hêman ek kîmyayî ye.

MAT, 11., *adj.* : hêşîl, qîşîl, kezîk, perawêza wêneyî, balgeha kulmbaziyê.

MAT, *vt., i.* : vehînan, (wêneyî) perawêz kirin, kezî kirin, hêşîl kirin (dirê).

MATADOR, 11. : matador : şerkerê serekiyê şeregayî.

MATCH, *n.* : qam, yarî, game, zilk.

- **BOARD** : depê hevta ko pêkve nêr û mê kirî ye.

- **BOOK** : deftera darikan, qotika darikên kibrîtî.

- **PLAY** : pêşbirkeya golfê.

- **POINT** : xalka serketinê.

MATCH, *vt.* : hevta bûn, guncîn. **MATCHABLE**,

adj. : guncanbar, hevtabar. **MATCHET**, 11. :

kêrikek mezin e (çek û alave).

MATCHLESS, *adj.* : bêhawta, bêhevta, qetlaz, bêhemta, bê qam, bêmanend, bêminâ.

MATCHLOCK, *n.* : fitîlka tifengê.

MATCHMAKER, 11. : xwazgîn, xazgîn .

MATCHWOOD, *n.* : qirşikên darî.

MATE, 11. : hogir, hevrê, hawrê, hevser, heval, mêr yan jin, kuştina şahîûi şetrencê), cot bûn.

MATE, *vt. i.* : şahî kuştin (şetrenc), cot kirin, bi mêr (yan jin) kirin.

MATED, *adj.* : cotkirî, daketî.

MATER, 11. = **MOTHER** (dayik).

MATER FAMILIAS, 11. : kabani.

MATERIAL, *acj.*, 11. : maye, kereste, kerese, made, madeyî, diravî.

- **RAW** : kereseya xav.

MATERIALISM, *n.* : mayekîfî, madexwazîfî. -

DIALECTICAL - : bêjyariya mayekîfî.

MATERIALIST, 17. : madeyî.

MATERIALISTIC, *adj.* : madeyiyî (pêwendîdarê madeyî).

MATERIALITY, 11. : made, madeyîfî.

MATERIALIZATION, 11. : madekirin, leşdarbûn.

MATERIALIZE, *ut. i.* : madeyî kirin, leşdar kirin, çêbûn.

MATERIALLY, *adv.* : bi madeyî, madekî.

MATERIA MEDICA, *n.* : medeyê pijîşkî.

MATERIEL, 11. : kereste.

MATERNAL, *adj.* : dayikane, dayikî.

MATERNITY, *n.* : dayikayîfî.

MAT(E)V, *ad.* : civakîbar.

MATH, 11. = **MATHEMATICS** (bîrkarî).

MATHEMATICAL, *ad.* : bîrkariyî.

- **LOGIC** : jîrbêjîya bîrkarî.

MATHEMATICALLY, *adv.* : bi bîrkarî, bîrkarîkî.

MATHEMATICIAN, *n.* : bîrkar.

MATHEMATICS, 11. : bîrkarî, jimarkarî.

MATHEMATIZATION, *n.* : bîrkarîkirin.

MATICO, *n.* : bîbera çolê (kûvî).

MATIN, *ad.* : spêdeyî (nivêj).

MATINAL, *ad.* : spêdeyî, berbangî.

MATINEE, 11. : ahenga rojkî.

MATING, 11. : cotbûn.

MATINS, 11. : nivêja nîva şevê yan berê spêdê.

MATR-, Matri- or Matro-, pref. : pêşgir e ko dayik e.

Matriarch, n. : serekdayik.

Matriarchal, adj. : serekdayikî.

Matriarchate, n. : malbat yan dewleta (serek) dayikî, qonax yan koçeya dayikîtiya civakî.

Matriarchy, n. : rêzika dayikîtî.

Matricidal, adj. : dayikkujiyî.

Matricide, n. : dayikkujî (kuştina dayikê bi destê kurî yan keçê).

Matriculant, n. : xwendekarê navkirî (bo qebûlîkirinê li zankoyê yan zanîngehê).

Matriculate, vt.i. : qebûl bîm li civatê, zanistgeh yan zankoyê.

Matriculation, n. : qebûlîkirin li zankoyê.

Matrilineal, adj. : dayikîniyî (malbat).

Matrilocal, adj., n. : rêzika ko mêr diçit mala jinê bo jîyanê piştî şûkirinê.

Matrimonial, adj. : şûkirinî. **Matrimony, n.** : şûkirin (yan jinînan). - **VINE** : çalûk, muxeylan, tûtirk.

Matrix, n. (pl. Matrices or Matrixes) : rêzgeh, qalib, madeyê tevnî (li navbera xaneyan), jêder, malbiçûk dayik (qalibê dayik li rêjgehê), qawinê dayik ..

Matron, n. : kabanî, serek civata jinan.

- **OF HONOUR**: yawera abrûyî (demê şûkirinê).

Matronize, vt. : dayikane sexbîrî kirin.

Matronly, adj. : dayikedarî, rûmetdar (jin).

Matt(er), n. = **MAT**.

Matted, adj. : şêlî.

Matter, n. : made, maye, babet, pirs, nê, tiştê giring, gîl, mîz, tibabek

nêzik, poste, tîpên rêzkirî bo çapkirinê.

· **A HANGING** -: tawana siza kuştin.

· **FOR THAT** -: bo wê çendê (yan êkê).

· **IN THE - OF** : hindî ko.

· **NO LAUGHING** -: tiştêk giring e (ne yê kenîne ye).

· **NO - WHAT** : çî bibit yan biqewrît.

Matter, vi. : xem kirin (ko giring e).

Matter-of-course, adj. : pîrsa demî ye (ko dê her çêbit).

Matter-of-fact, adj. : rastî, kirdarî.

Mattery, adj. : edabî, nêmi, **Matting, n.** : hêşil, madeyê hêşilê. **Mattock, n.** : paç, dudevik.

Mattoid, adj. : hişgêre (dînoke û jîr pêkve).

Mattress, n. : şil te, doşek, mitêl, qîşil, nahlik.

· **COVER** : rûdoşek.

Maturate, vi. = **Mature** (gehiştin).

Maturation, n. : gehiştin, sewhan. **Mature, adj.** : gehiştî, puxte, pijî, tewzî, qerd, berbext, sewhayî.

Mature, vt.i. : gehiştin, sewhan. **Matured, adj.** : gehiştî, pijiyayî, sewhayî. **Maturely, adv.** : bi gehiştinî, sewhayîkî. **Matureness, n.** : gehiştinî.

Maturing, n. : gehiştin, hirmijin, sewhandin.

Maturity, n. : gehiştin, berbextî, lêketin, herze, geyîn, sewhan.

Matutinal, adj. : zû, spêdeyî. **Matzo, n.** : nanê hevîrê netirşkirî.

Maud, n. : kirasê xîçkiryê şivanê Skotlendî.

MAUDLIN, *ndj.*, *n.* : mest, perûş.
 MAUL, *Ji.* : mîkut, mê kut, kutek.
 MAUL, *vt.* : lê dan, herişandin, darî
 kelişandin.
 MAULSTICK, *n.* : darê neqşekerî.
 MAUND, *n.* : min (yeke ya kêşanê temet
 82,28 pawinan e).
 MAUNDER, *vi.* : çenebazî kirin, bapîvî kirin.
 MAUNOY, *n.* : şehyaneya şuştina pêyên
 hejaran û belavkirina diravê vê xêrê.
 MAUSER, *n.* : kevnetifenga „mawîzer“.
 MAUSOLEUM, *n.* : gor: mezin û hêja. MAUVE,
n., *ndj.* : binefşiyê vekirî, mor,
 tolkî.
 MAVERICK, *n.* : dervek, çêl yan bizina
 nedaxkirî.
 MAVIS, *n.* : balindeyê strankar.
 MAW, *n.* : ûr, tovdank, dev, gerû yan
 herdu lam.
 MAWKISH, *adj.* : bêz, soza.
 MAWSEED, *n.* : tovê xeşxaşa efyonê.
 MAXI, *adj.*, *n.* : dirêj, kirasê dirêj.
 MAXILLA, *n.* : lama jorî.
 MAXILLARY, *adj.*, *n.* : lamî.
 MAXILIPED(E), *n.* : pêlamk.
 MAXILLO-, *pref.* : pêşgir e ko lam e.
 MAXIM, *n.* : binka rewîştî, seretaya
 binyatî, pend.
 MAXIMAL, *adj.* : mezintirî, bilindtirî, tekûz
 tirî.
 MAXIMAIIST, *n.* serçil (sorisgêr), kesê
 mezintirîn û tekûztirîn daxwazan dicit.
 MAXIMALIZE, *vt.* = MAXIMIZE.
 MAXIMIZATION, *n.* : ewperîbûn.
 MAXIMIZE, *vt.i.* : ewperi kirin, berfîreh rave
 kirin.

MAXIMIZED, *adj.* : ewperîkirî.
 MAXIMIZING, *n.* : ewperîkirin.
 MAXIMUM, *n.* : ewper, mezintirîn.
 • BOILING POINT : mezintirîn xalka kelinê
 (xalka mezintira kelinê).
 • DENSITY : MEZINTIRIN TIRI, xestî yan çirî.
 • FORCE : mezintirîn hêz.
 • VELOCITY : mezintirîn lez yan xêrayî.
 • WORK : mezintirîn kar.
 MAXWELL, *n.* : yekeya vizika magnetîzî.
 MAY, *n.*, *v. aux.* : belko, maçî ye, qey,
 renga, lewaneye, guhîj, guwêj.
 • NOT: ne.
 • YOU" NOT ENJOY YOUR MEAL : kerafî bit!
 MAY, *n.* : gulan.
 MAYAN, *adj.* : pêwendîdarê kelepurê kevnê
 gelê Maya.
 MAYAPPLE, *ll.* : texlîtek giya yek emerîkanî
 ber şikilhêk e, berê vî giyayî.
 MAYBE: ma çî ye, belko, qey.
 MAY DAY, *ll.* : cejna yekema gulanê,
 cejna paleyan.
 MAYFLOWER, *n.* : gul yan kulîlka gulanê.
 MAYFLY, *n.* : mêşa gulanê.
 MAYHAP, *adv.* : belko.
 MAYHEM, *n.* : kevandin, azar, ziyan, kirê-
 tiya birrîna endamek leşî.
 MAYING, *n.* : şehyaneya cejna yekî gulanê.
 MAYONNAISE, *n.* : amanê hêk, sihk, ron û
 beharatî (caran li gel goştê mirîşkê û
 masiya saman).
 MAYOR, *n.* : bajêrvan, şarevan, serbajêr,
 serokê bajêrî, kedxweda, koxe, keyatî,
 pêşmam.
 MAYORAL, *adj.* : serbajêrî.
 MAYORALTY, *n.* : bajêrvanî, keyatî, serba-
 jêriltî).

MAYORESS, II.: seroka bajêrî, serba-jêrimê).

MAYORSHIP, II.: bajêrvanîti, serbajêrîti,

MAYPOLE, *n.*: daralaya cejna gulanê. **MAY POP**, *n.*: gula derdan.

MAY QUEEN, II.: şahbanûya gulanê.

MAY TI DE OR MAY TIME, *n.*: heyva gulanê.

MAYWEED, II.: beybûna gem.

MAZARINE, *n., adj.*: şîne tarî.

MAZDAISM, *n.*: zerdeştî.

MAZE, *n.*: şaşge, şaşî, şepirzî.

MAZE, *vt.*: şaş kirin, şepirze kirin, guhişandin.

MAZER, *n.*: tirarek dar û mezin e. **MAZURKA**, *n.*: semayek Polendî ye, mûzîqeya mazurkaya vê semayê.

MAH, *adj.*: aloz, alînî, şepirzeyî.

MAZZARD, *n.*: texlîtek gêlaz e.

ME, *prO1*: min.

MEAD, *n.*: mîd : şeraba hingvîn, avceh û havênî,

MEADOW, *n.*: mêrg, çîmen, aran. •
FIELD: firêze.
 - **GRASS**: giyaziravk.
 • **LARK**: şivankujê mêrgan (balinde). -
SAFFRON: zehferana mêrgan.
 - **SWEET**: mecrîsok, gulbevdiya mêrgan.

MEAGRE, *adj.*: kêrn, piçek, kem. **MEAGRELY**, *adu.*: bi kêrnî, kêrnkî. **MEAGRENESS**, *n.*: kêrnîti, piçekîti, piçekîkî. **MEAL**, *n.*: dan, jem, xwarin, nan, arê (ardê) genimî yan arê genimê şamê.
 • **TIME**: demê danî (xwarinê).
 • **WORM**: kirmê arî.

MEAL, *vt.*: xwarin xwarin.

MEALIE, *n.*: garis.

MEALY, *adj.*: dam.

MEALBUG, *n.*: pêtika şerabê. **MEALY MOUTHED**, *adj.*: nermbêj, têkşêl. **MEAN**, II., *adj.*: navî, navincî, sefil, rezil, kotî, sîtar, xwaro, têkra, pîs.
 • **BY ALL** ... **S**: bi her awayî.
 • **BY ANY** ... **S**: bi her awa yekê.
 • **BY** ... **S OF**: bi awayê.
 - **BY NO** ... **S**: êkcar (ne).
 - **BY SOME** ... **S (OR OTHER)**: bi awayekê.
 - **DEVIATION**: (ladana navî yan navincî).
 • **DISTANCE**: têkraya dûrayî.
 • **FREE PATH**: rêya serbesta navîn.
 • **LIFE**: jiyê navîn, temenê nawend. - **TO AN END**: awa ye bo armancekê.
 • **MOLECULAR VELOCITY**: navîna leza gerdî (leza navîna gerdî).
 - **POINT**: xalka navî.
 - **PROPORTION**: rêjeya navî.
 • **SQUARE VELOCITY**: leza navîna ducarî.
 • **TIME**: demê navî.

MEAN, *vt. I.*: wate kirin, niyaz kirin, mebest kirin.
 • **TO** ... **WELL BY OR TO**: dostane niyaz kirin.

MEANDER, II.: çep û çîr kirin, badan, teriqîn, ba pîvan.

MEANDERED, *adj.*: çep li çîrkirî. **MEANDRINE**, *adj.*: têr çep û çîr. **MEANDERING**, *adj.*: çep û çîr kirin. **MEANING**, *n., adj.*: wate, gote, çemik. **MEANINGFUL**, *adj.*: watedar, têrwate.

MEANNESS, II.: rijdî, rezilî, çikosî, qelasî,

nizmi, nizmatî, nizmayî, sîtarî, rû reşî, tim têl.

MEANS, n. : ho, loke, awa, behane, pergal. •

OF LIVELIHOOD : av Û tav.

• **TEST**: azmûna neheyînê.

MEANT, adj. : niyazkirî, watakirî.

MEANTIME, II. : demê navber.

• **FOR THE -** : niho, noke, vê gavê, vî demî, êsta.

• **IN THE -** : di demê navbera ... de.

MEASLED, adj. : sorikkirî.

MEASLES, n. : sorik, sorêje.

MEASLY, (Iadj.) : sorikî.

MEASURABILITY, n. : pîvanbarîûî), pîvebarî(tî).

MEASURABLE, (Iadj.) : pîvanbar, pîvebar, pîvekdar, hevden.

MEASURE, n. : pîv, pîvan, pîvek, tibab, çend.

• **BEYOND** : ~ : bêqam, gelek mezin.

• **GREATEST COM MON -** : mezintirîn hev dabeşker.

• **IN A -** : ta radeyekê.

• **IN A GREAT (LARGE) -** : ta radeyek dûr yan mezin.

• **IN SOME -** : ta radeyekê.

- **MADE TO -** : bo leşê mirovî çêkirî ye yan dirûtî ye (qaydekirî ye).

- **TO SET - S TO** : radeyekê (bo) dadinit.

- **TO TAKE - S** : pêngavên pêviyayî wergirtin.

• **TO TAKE ONE'S -** : (dirûnker) pîvanên leşî wergirtin.

• **WITHOUT** - bêqam,

MEASURE, vt. : pîvan, kêr hatin. **MEASURED, adj.** : pîva yî, hunandî, hevrist.

MEASURELESS, (Iadj.) : bê pîvan, bê rade, bê qam.

MEASUREMENT, n. : pîvan, pîvek. **MEASURING, n.** : pîvan, pîvandin, pêwane. **MEAT, n.** : goşt.

• **BOILED -** : goştê kelandî.

• **BONELESS -** : nerme.

- **BROTH** : avgoşt.

- **ROAST** : goştê biraştî (yan birajtî).

• **LUMP OF -** : tilxê goştî.

• **MAN** : goştîroş.

MEATUS, n. : borî.

MEATY, adj. : têrgoşt.

MECHAN(oh pref.) : pêşgir e ko mekanîk e.

MECHANIC, n. : destkar, mekanîk.

MECHANICAL, (Iadj.) : amêrsaz, amêrger, xweger, mekanîkî.

- **ADVANTAGE** : havil yan sûda mekanîkî.

• **BALANCE** : terazûya mekanîki yan xwegerî.

• **COMPLIANCE** : berdestiya mekanîki.

• **CONTRIVANCE** : sîkeneya mekanîkî.

• **DRAWING** : wênekirina mekanîkî.

• **EQUIVALENT** : hev hêza mekanîkî.

• **EQUIVALENT OF HEAT** : hev hêza mekanîkiya germiyê.

• **RESISTANCE** : bergiriya mekanîkî.

MECHANICIAN, II. : mekanîkê şehreza.

MECHANISTIC, adj. : amêrgerî, xwegerî.

MECHANIZATION, n. : amêrgerkirin, xwegerkirin, mekanîkîkirin.

MECHANIZE, vt. : amêrger kirin, xweger kirin, mekanîki kirin.

MECHANIZED, (Iadj.) : amêrger(kirî), amêrsazikirî, xweger(kirî), mekanîkîkirî.

MECONIUM, n. : madeyek reş e ji biçûkî derdikevit (piştî biçûk bûnê).

MEDAL, vt. : xelat, aferîn, medalî.

- **BEDECKED** : (bi medaliyan) xemilandî.
- **FOR MERIT** : medaliya stêlehî yan jêhatinê.
- **PLAY** : pêşbirkeya gol fê.

MEDALLED, adj. : medalîkirî.

MEDALLIC, adj. : xelatî.

MEDALLION, n. : nişan, medaliya mezin.

MEDALLIST, n. : medalî çêker, dahênerê medaliyan.

MEDDLE, vi. : têkilî kirin, têkvedan kirin.

MEDDLER, n. : têkildar, têkvedankar. **MEDDLE SOME, adj.** : têkvedankar.

MEDE, n. : gelê Mîdya.

MEDI(O), pref. : pêşgir e ko navî ye. **MEDIA, n.** : awayên ragehandinê, çîna navî {ji diwarê demarê xwînê).

MEDIACY, n. : navîfî.

MEDIAL, adj. : navî, navincî.

MEDIAN, n., adj. : Mad, Mîdî.

MEDIAN, adj. : navî, navincî, nîvanî, nawendî.

MEDIANLY, adv. : bi nîvanî, nîvanîkî, **MEDIANT, n.** : sêyema her pêştirka mûzî-qeyî.

MEDIA STINAL, adj. : nîvekî.

MEDIASTINUM, n. : nîvek.

MEDIATE, adj., vt., i. : navî, navbêjî kirin, rêkkeftin çare kirin.

MEDIATED, adj. : navbêjîkirî.

MEDIATING, n. : navbêjîkirin.

MEDIATION, n. : navbêjîkirin.

MEDIATIVE, adj. : navbêjîdar.

MEDITIZATION, n. : girtina dewletekê (li

gel hêlana fermanrewayî û hindek mafan).

MEDIATIZE, vt. : dewletek girtin. **MEDIATOR, n.** : navbêj navber, navbercî. **MEDIATORIAL, adj.** : na vbêjî.

MEDIATORY, adj. : navbêjî.

MEDIATORESS, n. : navbêj (mê).

MEDIATRICE OR MEDIATRIX, n. = **MEDIATRESS.**

MEDIC, n. : pijîşk, xwendekarê pijîşkiyê.

MEDICABLE, adj. : çarebar.

MEDICAL, adj., n. : pijîşkî.

- **EXAMINER** : pijîşkê mîrî.

- **JURISPRUDENCE** : pijîşkiya dad werî.

MEDICALLY, adv. : bi pijîşkî, pijîşkîkî.

MEDICAMENT, n. : çare, çareserî, derman-kirin.

MEDICARE, n. : rêzika sexbîriya ten dirustî.

MEDICASTER, n. : cerbeze.

MEDICATE, vt. : derman kirin, çare kirin, têkilî madeyek pijîşkî kirin.

MEDICATED, adj. : dennankirî.

MEDICATING, n. : dermankirin.

MEDICATION, n. : dermankirin, derman, çare.

MEDICINABLE, adj. : dermankirinbar.

MEDICINAL, adj. : dermanî, pijîşkî.

MEDICINALLY, adv. : bi dermanî, dermanîkî.

MEDICINE, n. : derman, darû,

- **BALL** : tepka pijîşkî (giran e).

- **MAN** : cerbeze.

MEDICINE, vt. : derman kirin.

MEDICK, n. : helezek wek beqlî ye. **MEDICO, n.**

: pijîşk, xwendekarê pijîşkî. **MED/EVAL, adj.** : pêwendîdarê rojgarên navîn.

MEDIEVALISM, *n.* : rojgariya navîn.
 MEDIAVALIST, *n.* : dîrokvanê rojgarên navîn. MEDIOCRE, *adj.* : asayî, sakar.
 MEDIOCRITY, *n.* : sakarî, mirovê şehreza navîn, navincî.
 MEDITATE, *vt.*, *i.* : raman kirin, karek kirin.
 MEDITATED, *adj.* : ramankirî.
 MEDITATING, *n.* : raman kirin.
 MEDITATION, *n.* : raman (kirin).
 MEDITATIVE, *adj.* : ramandar, raman karî.
 MEDITATIVELY, *adv.* : bi ramandarî, raman-darkî.
 MEDITATIVENESS, *n.* : ramandarîtî, raman-karîtî.
 MEDITERRANEAN, *adj.* : navîn, deryayiyê navîn.
 MEDITERRANEAN SEA, *n.* : deryayê navîn.
 MEDIUM, *n.*, *adj.* : darûber, war, asayî, navend, navîn, awa, navber.
 · THROUGH THE" OF : navincî, navendî.
 MEDIUM FREQUENCY, *n.* : lereya navîn.
 MEDIUM OF EXCHANGE, *n.* : awaguhêrgeh.
 MEDLAR, *n.* : guhij, guwêj.
 MEDLEY, *n.*, *adj.* : têkil, awazê têkil.
 MEDOC, *n.* : şeraba sora Bordo.
 MEDULLA : mejiyê hestî.
 · OBLANGOTA : mejiyê lakêşe.
 · RENALIS : kakiloka gulçîskî.
 MEDULLARY, *adj.* : (hestî) mejiyî.
 SHEATH : kalanê mejiyî.
 MEDULLATED, *ndj.* : mejî kalandar.
 MEDUSA, *n.* : lale ya deryayî, pişa deryayî, çirayê deryayî, masiya celatînî, yek ji sê xweşkên kirêtên pirçmarên efsaneyê Girekî.
 MEDUSAL, *adj.* : laleyî.

MEDUSOID, *adj.* : pêwendîdarê masiya cela tînî.
 MEED, *vt.* : kêrhatî, civîn, civîngeh, kirê, siza, xelat.
 MEED, *vt.* : kêr hatin, kom bûn, yek girtin, pêşwazi kirin.
 · TO → A PERSON HALFWAY : nîv rê (li gel mirovekê pêk hatin).
 MEEK, *adj.* : hejar, stûxwar, destvîlk, ser-nerm.
 MEEKLY, *adv.* : bi hejarî, hejarkî. MEEKNESS, *n.* : hejarîtî, destvîlkî. MEERKAT, *n.* : derya kitik, canewerek wek kozeyî ye.
 MEESCHAUM, *n.* : sillketa magnesyoma avkirî. MEET, *n.* : civîna zelum (1 tajiyan bo nêçîrê, civîna çerxsiwaran).
 MEET, *vt. i.* : civîn, kom bûn.
 MEETING, *n.* : civîn, berhevbûn, kombûn, pêrgîn, xirvebûn, hevcivîn, berbîrîn, vêketin.
 · HOUSE : peristgeh.
 · PLACE : civîngeh.
 · SPOT : levîdarî.
 MEGA, *pref.* : pêş gir e ko mezin e.
 MEGACEPHALOUS, *adj.* : sermezin. MEGACYCLE, *n.* : mêgasîkl : milyonger. MEGAHIT, *n.* : karek nayab.
 MEGAL(O), *pref.* : pêşgir e ko mezin e.
 MEGALITH, *n.* : berek mezin kevnar e.
 MEGALOMANIA, *n.* : dîna tiya meznatiyê.
 MEGALOMANIAC, *adj.* : nesaxê dîna tiya meznatiyê.
 MEGALOPOLIS, *n.* : bajarê mezin.
 MEGAPHONE, *n.* : dengzilker.
 MEGAPOD(E), *n.* : balindeyek Awistiralî ye (hêka di nav kavlan de kirin).

fltr:ASC'(JP-rC, (/df~mt!zinbfn, diyar (bo çavî).

MEGA5PORANIUM, n. : kîskê tovî. **MEGA5PORE,**

n. : tovê mezin (zayende). **MEGATON, n.** :

megaton : hêza peqîn
(milyon ton, birîn ye ji sêyem netratên toîin),

MEGAWATT, n. : megawat : milyon wat.

MEGILP, n. : madeyek şîreyî neqşker bi kar hînan.

MEGOHM, n. : mêgom: milyon am. **MEGRIM, n.**

: serêşa dijwar, mirîtoyî, gêjî,
mirûsî.

MEI0515, n. : dabeşbûna nîvekî. **MEFOTIC,**

adj. : dabeşbûniya nîvekî. melamine :

pêkhatiyek belûrî spî ye.

MELAN(O)-, pref. : pêşgir e ko reş e.

MELANCHOLIA, n. : maxolya, melankoliya.

MELANCHOLIC, adj. : cangiran, pest, dilgiran.

MELANCHOLY, n. : maxolan, melankolî, can giranî, maxolya, mirûzî, mirûsî, alûn, pest, dilgiranî, sewda, girjbCm.

MELANE51AN, n., adj. : welatîyê Melanez-ya, melenezî.

MELANGE, n. : têkilî.

MELANIC, adj. : reş, tarîreng. **MELANIN,**

n. : heştreng) tarî. **MELANISM, n.** :

(reng) tarîfî. **MELANITE, n.** : berek

hêja reş e. **MELANIZE, vt.** : reş kirin,

tarî kirin. **MELANIZED, adj.** : tarîkirî.

MELANIZING, n. : tarîkirin.

MELANOID, adj. : reşî.

MELANOMA, n. : pejûna reş.

MELANOSIS : têt bûna reşî.

MELAHOUS, atij. : pirçreş û çerm tarî.

MELAPHYRE, n. : kevrek agir pijînî ye. **MELBA**

TOAST, n. : nanê tenikê birajîfî. **MELCHITE OR**

MELKITE, n. : melkî (file yan fele).

MELD, n. : vekirin (kaxezan), eşkera kirin.

MELD, vt.i. : eşkera kirin, vekirin. **MELILOT, n.**

: gulbendiya qiralî.

MELINITE, n. : teqemeniyek dijwar e.

MELIORATE, vt.i. : çak bûn.

MELIORATED, adj. : çakkirî.

MELIORATING, n. : çakkirin.

MELIORISM, n. : çakbûnîfî, baweriya ko dinyaber bi çakiyê ve diçit, ko mirov dişêt çak bikit.

MELIORIST, n. : çakbawer.

MELISMA, n. : awaza mûzîqeyî.

MELL, vt.i. : têkil bûn, têkil kirin.

MELLIFEROUS, adj. : hingvînçêker.

MELLIFLUENCE, n. : hingvînkirin. **MELLIFLUENT**

OR MELLIFLUOUS, adj. : hingvînkirî.

MELLIFLUOUSLY, adu. : hingvînkirinî.

MELLIFLUOUSNESS, n. : hingvînkirinîfî.

MELLOW, adj. : ter, nerm, nazik, şad, serxoş (piçekê), şîrîn, şîrêzî, gehîştî.

MELLOW, vt.i. : nerm kirin, nerm bûn, gehandin (şerab).

MELODEON, n. : ergena borîzana biçûk.

MELODIOUS, adj. : xoşawaz.

MELODIC, adj. : awazî.

MELODIST, n. : ahengbêj, stranbêj, dengbêj, awazvan, awazbêj, bestekar, awazker.

MELODIZE, vt.t. : awaz kirin.

MELODIZER, n. : awazvan, awazker, awazbêj.

MELODRAMA, n. : melodrama : şanogeriya soza û handanî,

MELODRAMATIC, adj. : melodramî : soza-handanî.

MELODRAMATICALLY, ad»: bi melodramî, bi soza-handanî.

MELODRAMATICS, n. : melodramikî, rewîştta soza-handanî, soza-handanîkî.

MELODRAMATIZE, vt. : melodramî (melodramatîze) kirin, soza-handani kirin.

MELODRAMIST, II: soza-handankar. **MELODY, n.** : lawik, leylan, newa, aheng. **MELOID, adj., n.** : kêzî.

MELON, n. : gundur.

• **RINDS** : kaşil.

- **SMALL AND FRAGRANT** -: şemam. •

WATER -: zebeş, şutî.

MELT, n. : buhuj, tiwawe.

• **WATER** : ava buhujî (ji befrê).

MELT, vt.i. : buhujîn,

MELTED, adj. : bivaştî.

MELTING, n. : buhujîn, bivaştin, şilbûn, tiwanewe, pûs tin, xewirandin, buhuştin.

- **POINT**: xalka buhujînê. •

POT: bote.

MELTON, n. : kurtepûrtî (perûk).

MEMBER, n. : endam, lebat.

• **OF ACADEMY** : endamê korê.

• **OF PARLIAMENT** : nîminender (endamê civata gelî).

MEMBERSHIP, n. : endamî: lebatî.

MEMBRANACEOUS, adj. : perdeyî.

MEMBRANCE, n. : pergî.

MEMBRANE, n. : perde, çernik, pûstik.

MEMBRANEOUS, adj. : perdeyî, perdedar.

• **LABYRINTH** : lerze avika perdeyî.

MEMBRANOUS, adj. = **MEMBRANEOUS**.

MEMENTO, n. : yadgar, bîranînek.

MEMOIR, n. : yadname, tomara bûyeran, bîrîn, yadaşt, bîrewerî.

MEMORABILIA, n. : tiştên bîranînê.

MEMORABLE, adj. : bîrewer, bîraver.

MEMORABLY, ariv. : bi bîrewerî, bîrewerkî.

MEMORANDUM, n. : bîranîn, birname.

MEMORIAL, ariv., II: kêlka bîrê, bîranîn.

- **DAY**: roja yadgarê yan bîra ti yekê.

MEMORIALIZE, vt. : yadgarname pêşkêş kirin, bîrname pêşkêş kirin, bîranînek vejandin.

MEMORIA TECHNICA, II: alava bîranînê.

MEMORIZE, vt. : ji ber kirin.

MEMORY, n. : bîranîn, yadgar, yad, bîr, bal, bîrewerî.

MEMSAHIB, n. : jina biyanî (li Hindistanê).

MEN (PI. OF MAN), II: mêr.

MEN(O), pref. : pêşgir e ko mehik e.

MENA, n. : gezû.

MENACE, II: gef, goreşe, metirsî, hereşe, gefkirin.

MENACE, vt. : gef kirin, tirsandin.

MENACING, II: hereşe, gef kirin.

MENAGE, n. : damezrîna malê: jinûmêr.

MENAGERIE, n. : nîşangeha dehbeyan.

MENARCHE, n. : destpêka mehikê yan xwîndîtinê.

MEND, II: çakirin, veçînîn.

• **ON THE** -: yê çak dibit (ber bi çakbûnêveye).

MEND, otî. : pate kirin, veçînîn, çak kirin, rast kirin.

· TO - A FIRE : agir xoş kirin.

· TO - ONE'S ACE : lez kirin.

MENDABLE, *adj.* : çakbar, veçinbar.

MENDACIOUS, *adj.* : derewkar, derewker, derewîn, derewbêj.

MENDACITY, *n.* : derew, derewkarî, derewbêjî, derewkirin.

MENDELEVIVUM, 11. : mendelevyom : hêmanekîfej¹. ar e.

MENDELISM, *n.* : Mendil etî, olek zikmakî ye (pêwendîdarê ditaneya paşmayîza niya zana, G.J. Mendil 0822-1884).

MENDICANCY, *n.* : parsêkî,

MEDICANT, 11. : parsêk, geda.

MENDICITY, 11. = MENDICANCY.

MENDING, *n.* : veçinîn, çakkirin.

MENHADEN, *n.* : tex lîtek masî ye.

MEN HIR, *n.* : peykerê berê stûneyî.

MENIAL, *adj.*, *n.* : tise.

MENINGEAL, *ndj.* : mejûtevnî,

MENINGES, 11. : mejûtevn.

MENINGITIS, *n.* : kulbûna tevnê mejî.

MENINX, *n. pl.* : meninges.

MENISCUS, *n.* : nûheyy, nûheyyî, movikê kirkirokî, nîskaya rûçalkoqiz.

MENOLOGY, *n.* : rojname nemaze ya dêra Girekî.

MENOPAUSAL, *adj.* : jîbêhîvîljin). MENOPAUSE, *n.* : jiyê bêhîviyê (jin: bê mehik jî 45-50 sal).

MENSE, *vt.* : rûmetdar kirin.

MENSED, *adj.* : rûmetdarkirî,

MENSES, *n.* : mehik, xwîndîtin. MENSHEVIK, *n.* : menşevîk : kêmayiya partiya civakiya dîmokratiya karkerên rûs,

MENSING, *n.* : rûmetdarkirin,

MENSTROUS, *adj.* : mehikî, xwîndîtinî .

MENSTRUAL, *adj.* : mehikî .

MENSTRUATE, *vt.* : xwîndîtin (jin), mehik bîm.

MENSTRUATED, *ndj.* : mehikî, xwîndîtî.

MENSTRUATING, *n.* : xwîndîtin.

MENSTRUOUS, *adj.* : mehikî. MENSTRUUM,

n. : buhujker. MENSURABLE, *adj.* :

pîvanbar. MENSURAL, *adj.* : pivanî,

MENSURATION, *n.* : pîvan.

MENTAL, *adj.*, *n.* : hiş, hişî.

· HOSPITAL : dînxane, şêtxane,

MENTALISM, *n.* : hişîtî,

MENTALIST, *n.* : hişzan.

MENTALITY, *n.* : hiş, hûş, hişîtî.

MENTALLY, *adv.* : bi hişî, hişkî.

MENTATION, *n.* : hişkar.

MENTHENE, *n.* : mentîn : hîdrokarbonek rûnî û bêreng e.

MENTHOL, *n.* : mentol : madeyek ji rûnê pîngî çêkiriye: êşkuj e.

MENTHOLATED, *ndj.* : mentolkirî.

MENTION, *n.* : nîşankirin.

· HONOURABLE - : xelatê jêhatiyê, serhatiyê nemaze li azmûnê şerî.

MENTION, *vt.* : nîşan kirin.

MENTIONABLE, *adj.* : nîşanbar.

MENTIONED, *adj.* : nîşankirî.

MENTIONER, *n.* : nîşanker.

MENTIONING, *n.* : nîşankirin.

MENTOR, 11. : pendiyar, seydayê dilsoz.

MENU, 11. : siyayiya xwarinê.

MEOW, *n.* : mewjandin, miyewmiyew.

MEOW, *vt.* : miyew miyew kirin.

MEPACAINÉ, *n.* : dermanê dijî lerzetayê.
 MEPHISTOPHELES, *n.* : bedgiyan.
 MEPHITIC, *adj.* : genî, jehrî.
 MEPHITIS, *n.* : genîtî, bêhna genî.
 MER, *pref.* : pêşgir e ko derya ye.
 MERCANTILE, *adj.* : bazirganî. MERCANTALISM, *ii.* : bazirganîtî. MERCAPTAN, *ii.* : merkeptan : pêkhatiyek kîmyayî alkuholî ye.
 MERCATOR, *ii.* : (PROJECTION) : nexşeyê cîhanê li ser stûnê.
 MERCENARINESS, *n.* : caşîtî.
 MERCENARY, *n., adj.* : caş, kirêgirtî.
 MERCER, *n.* : perûkfiroş.
 MERCERIZE, *vt.* : çare kirin (pembûyê ristî, bi daxesoda bo qayimkirinê û tazekirinê, heşxurt kirin).
 MERCERIZED, *adj.* : heşxurtkirî.
 MERCERIZING, *n.* : heşxurtkirin.
 MERCERY, *n.* : perûkfiroşî.
 MERCHANDISE, *n., adj.* : pirtal, ko tal, pertal.
 MARCHANDISE, *vi.t.* : bazirganî kirin.
 MERCHANDISER, *n.* : bazarker, bazirgan.
 MERCHANDISING, *n.* : bazarkirin, bazirganî.
 MERCHANDIZE, *n.* : mita, pirtal yan pertal.
 MERCHANDIZED, *adj.* : bazarkirî.
 MERCHANDIZING, *n.* : bazarkirin.
 MERCHANT, *n., adj.* : bazirgan, bazarvan.
 • MAN: keştîtgemî) ya bazirganî.
 • MARINE : gelekeştiya bazirganiyê.
 • PRINCE: bazirganê dewlemend (mîr-bazirgan).
 • SHIP : gemiya bazirganiyê.
 MERCHANTABILITY, *n.* : bazarbarîtî.

MERCHANTABLE, *adj.* : bazarbar, kêrhatî bo bazarî, firotinbar.
 MERCIFUL, *adj.* : mihirvan, dilovan, mih-reban.
 MERCIFULLY, *adv.* : bi dilovanî, bi mihirvanî.
 MERCIFULNESS, *n.* : dilovanîtî, mihirvanîtî.
 MERCILESS, *adj.* : bêdilovanî, bêbezeyî, dilreq.
 MERCILESSLY, *adv.* : bi dilreqî, bi bêdilovanî, bêdilovanîkî.
 MERCUR(O), *pref.* : pêşgir e ko cîwe ye.
 MERCURATE, *vt.* : cîwe kirin. MERCURATED, *adj.* : cîwekirî. MERCURATING, *ii.* : cîwekirin.
 MERCURIAL, *adj.* : cîweyî, demdemî.
 MERCURIC, *adj.* : cîweyî. MERCUROCHROME, *n.* : merkurokrom madeyek paqijker û mikrobkuj e.
 MERCURY, *n.* : cîwe.
 • VAPOUR LAMP : çirayê helmî yê cîweyî.
 MERCY, *n.* : dilovanî, piyarî, bezeyî, mihirvanî.
 MERDE, *ii.* : rîxo
 MERE, *ii., adj.* : ger, gol, tenê, her. MERELY, *adv.* : bes, her, bi tenê. MERETRIOUS, *adj.* : xapînok, derewkar, felîte, dêhl.
 MERETRIOUSLY, *adv.* : bi xapînî, xapinkî.
 MERETRIOUSNESS, *n.* : xapînîtî. MERGANSER, *n.* : qaza noqar.
 MERGE, *vt.i.* : têkil bûn, têkil kirin (bûn yek).
 MERGEO, *adj.* : têkilkirî, yekbûyî. MERGENCE, *ii.* : têkilbûn, yekbûn. MERGER, *n.* : vekbûn, têkilbûn, yekgirtin.

- MERGING**, *n.* : têkilkirin, yekkirin.
- MERIDIAN**, *n., adj.* : dirêjehêl.
- MERIDIONAL**, *n., adj.* : başûrî, nişteçêyê başûrî.
- MERIDIONALLY**, *adv.* : bi başûrî, başûrkî.
- MERINGUE**, *n.* : mering : şîrînayiya şeker û spîlka hêkê, kiloca vê şîrînayiyê.
- MERINO (SHEEP)**, *n.* : pezê îspaniyê spî û hirîhêja.
- MERJSTEM**, *n.* : tevnê piziyê „dabeşbar“.
- MERISTIC**, *adj.* : birgehî.
- MERISTICALLY**, *adv.* : bi birgehî, birgehkî.
- MERIT**, *n.* : jêhatin, lêhatin, beha.
- **SYSTEM** : rêzika jêhatinê.
- MERITED**, *adj.* : stêle, jêhatî.
- MERITOCRACY**, *n.* : hikumeta jêhatiyan.
- MERITORIOUS**, *adj.* : jêhatî, berketî bo rêz û rêzaneyê.
- MERITORIOUSLY**, *adv.* : bi stêleyî, bi jêhatî, stêlekî.
- MERITORIOUSNESS**, *n.* : stêleyîtî, jêhatîtî.
- MERL(E)**, *n.* : şalûl.
- MERLIN**, *n.* : helûyek biçûk e.
- MERLON**, *n.* : dîwar (du kunên telarê kelheyê cuda kirin).
- MERMAID**, *n.* : periya deryayî.
- MERMAN**, *n.* : canewerê deryayiyê efsaneyî: gewde mêr û dîv masî ye.
- MEROBLASTIC**, *adj.* : parçekelşînî (wek hêkê),
- MERRILY**, *adv.* : bi şadî, şadkî. **MERRIMENT**, *n.* : şênahî, şadî, keyfxoşî. **MERRY**, *adj.* : tew zî, keyfxoş, şa.
- **ANDREW** : zirtek.
 - **GO-ROUND** : gerînek.
 - **MAKER** : zirtek.
- **MAKING** : zirtekî, şayî.
 - **TO MAKE** - : keyf kirin.
 - **TO MAKE - OVER** : tirane pê kirin.
- MERRY THOUGHT**, *n.* : hestiyê qirka balindeyî,
- MES**, *pref.* : pêşgir e ko navîn e.
- MESA**, *n.* : banikê rastê rex nişîvî.
- MESALIANCE**, *n.* : şûkirin yan jinînana nehevta.
- MESCAL**, *n.* : darê kaktusiyê meksîkî, şeraba vî darî.
- MESENCHYMAL**, *adj.* : çîna navînî (pêwendîdarê çîna navîn).
- MESENCHYME**, *n.* : çîna navîn .
- MESENTRIC**, *adj.* : kinteyî.
- **ARTERY** : sordemarê kin teyî.
- MESENTERON**, *n.* : kunka torî, hinavpêç.
- MESENTERY**, *n.* : kinte.
- MESH**, *n.* : nêrûmê, tor, tele. -
- WORK** : tele.
- MESH**, *vt.i.* : nêr û mê bûn (yan kirin), keftin tel hê, gon can bûn.
- MESHED**, *adj.* : torasa, nêrûmêkirî, nêrûmêbûyî,
- MESHING**, *n.* : nêrûmêkirin.
- MESHY**, *adj.* : torkirî,
- MESIAL**, *adj.* : navîn (ko canewerî dabeş dîkit rast û çep).
- MESIAALLY**, *adv.* : bi navînî, navînkî.
- MESITYLENE**, *n.* : mesîtlîn : hîdrokarbonêk rûnî ye.
- MESMERIC**, *adj.* : nivandîniya magnetîzî.
- MESMERIST**, *adj.* : razankarê magnetîzî.
- MESMERIZATION**, *n.* : nivandîna magnetîzî, dilgîrkirin .
- MESMERIZE**, *vt.* : magnetîz nivandin, dilgîr kirin.

MESMERIZED, *adj.* : şeyda, dêwane, dilgîkirî.

MESMERIZING, 11. : nivandin, şeydakirin.

MESNE, *adj.* : navîn.

MESNE IORD, *n.* : derebegê biçûk (zeviyê ji derebegek mezintir bi kirê digirit).

MESOBLAST, 11. : çîna navîna pizî.

MESOCARP, 11. : berik, kakil.

MESOIITHIC, *adj.* : pêwendîdarê rojgarê beriyê navîn.

MESON, *n.* : mezon : hûreke (lok di navbera proton û elektronê de ye).

MESONEPHRIC, *adj.* : gulçîskiya navîn.

MESONEPHROS, 11. : gulçîsk navîn.

MESONIC, *adj.* : mezonî.

MESOPHYLI, 11. : tevnê navîn (yê belgê helezi).

MESOPHYTE, *n.* : heleza qenceaxê.

MESOPOTAMIA, 11. : welatê nihala du rûbar.

MESOSPHERE, 11. : çînek ji bergê esmanî (bayî) ye 250 mîlan bilind e (li ser rûyê erdî).

MESOTHEIUM, *n.* : çîna hunînî (berê vala-tiyên pizî).

MESOTHORAX, *n.* : kîzîka navîna sîngê pêtikê.

MESOTHORIUM, *n.* : toryoma navîn.

MESOTRON, *n.* = MESON.

MESOZOIC, *adj.* : rojgarê navîn.

MESS, *n.* : bêserûber, şêlûbêl, tevlihev.

MESS, *vt. i.* : tevlihev kirin.

MESSAGE, 11. : peyam, name.

• OF CONDOIENCE : şînarne, behîname.

MESSALINE, 11. : tevnek avirrnîş tenik e.

MESSED UP, *adj.* : perîşan.

MESSENGER, *n.* : şandiyar, şandiyek, peyamber, şandox, namebir, peyik, pêşvenêr.

MESSIAH, *n.* : Îsa pêxember, Mesîh.

MESSIANIC, *adj.* : mesîhî.

MESSILY, *adv.* : bi tevlihevî yan bêserûberî, tevlihevîkî.

MESSINESS, 71. : tevlihevî tî, bêserûberîtî.

MESS JACKET, *n.* : sindoqa serbaziya xwarinê.

MESSRS (*pl.* OF MISTER) : rêzdartan.

MESSUAGE, *n.* : xanî (li gel erd û avahî).

MESSY, *adj.* : bê ser û ber, pîs, nerêk, marêk.

MESTIZO : durih (melez).

MET, *p.* OF MEET : kombo.

MET-, META-, *pref.* : pêş gir e ko pişt e, paş e.

METABOLIC, *adj.* : jînkâr.

METABOLISM, 11. : metabolizm : jînkârî (û) : kirdara ko xurek ava dîkî madeyek jî nî û protoplazim diherifit bo afirandina wîzeyî.

METABOLITE, *n.* : madeyê [jînkârî çêdîkî.

METABOIZATION, *n.* : jînkârîbûn.

METABOLIZE, *vt.* : jînkârî kirin.

METABOLIZED, *adj.* : jînkârîkirî.

METABOLIZING, *n.* : jînkârîkirin.

METACARPAL, *n., adj.* : şehî.

METACARPUS, *n.* : şehê zendî.

METACENTRE, *n.* : nîveka navber: nîveka rakêşana leşê serav.

METACHROMATISM, 11. : rengguhorîn.

METAGALAXY, *n.* : hesareyên derekî, gerdûn.

METAGENESIS, *n.* : zayîna ladanî.

METAL, *n.* : kan, metal.

• BAR: ^{q19}, bista metalî.

• RECTIFIER : rastkerê kanî yan metalî. -

SEMI STABLE - : kanê nîvsirewto.

- STATE: barê kanî.

METAL, *vt.* : kan kirin, metal kirin.

METALANGUAGE, *n.* : zimanê berhevdanê.

METALLED, *ndj.* : kankirî, metalkirî. METALLIC,

ndj. : kanî, metalî, METALLIFEROUS, *ndj.* :

kandar.

METALLING, *n.* : kankirin, metalkirin.

METALLIZE, *vt.* : kan kirin. METALLOGRAPHER,

11. : kanzan, metalzan. METALLOGRAPHIC, *ndj.*

: pêwendîdarê kan-
zaniyê.

METALLOGRAPHY, *n.* : kanzanî.

METALLOID, *n., adj.* : nekan, nemetal, nîv yan
nîmce kan, nekanî.

METALLOPHONE, 11. : alava mûzîqeyî wek
darînkî lê bi bistên asinî.

METALLURGIC(AL), *adj.* : kanî, metalî.

METALLURGIST, *n.* : kanzan, metalzan.

METALLURGY, *n.* : kanzanî, metalzanî. METAL

WORKING, 11. : çêkirina alavên kanî
yan metalî.

METAMERE, 11. : parçeyek ji zincîreya leşê
hevparçe.

METAMERIC, *ar/fo* : pêwendîdarê hevpekhatin
û kêşa gerdîlê (bi taybexuya têvel).

METAMERISM, *n.* : hevpekhatin û kêşa gerdîlê
taybexuya têvel.

METAMORPHIC, *aLij.* : şikilguhorî, şewegu-
horî.

METAMORPHISM, *n.* = METAPHORSIS.

METAMORPHOSE, *vt.i.* : şikil yan şewê guhar-
tin.

METAMORPHOSING, *n.* : şikil yan şewê gu-
hartin.

METAPHOR, 11. : xwaze, xwastinî.

METAPHORIC(AL), *ndj.* : xwazeyî.

METAPHORICALLY, *adj.* : bi xwazeyî,
xwazekî.

METAPHRASE, *n., adj.* : wergêran nemaze
wergêrana tîpî (peyiv bi peyiv).

METAPHRASE, *vt.* : wergêran (tîp yan peyiv).

METAPHYSIC, *n., adj.* : paşsirûşt, sersirûşt,
nepenî, paşxwerist.

METAPHYSICAL, *adj.* : paşsirûştî, sersirûştî.

METAPHYSICIAN, 11. : paşsirûştzan.

METAPHY-SICS, *n.* : paşsirûşt, piştirsirûştî.

METAPLASIA, 11. : tevinbûn : guhorîn ji
tevnê ko dibit tevnê dî (kirkirok
dibit hestî...).

METAPLASM, *n.* : dariştin, derlûnan.

METAPLASMIC, *ndj.* : derlûnanî. METAPOLITICS,

n. : rêzaniya zanistiya
bijîn.

METAPOLITICAL, *adj.* : pêwendîdarê rêzaniya
zanistiya bijîn.

METAPOLITICIAN, *n.* : rêzanê zanistiya bijîn.

METAPROTEIN, *n.* : madeyê ji protînê derhatî
yan derînayî.

METAPSYCHICS, *n.* : jîrzaniya dîtaneyiya bûn
û zanîne, jîrzaniya hişê.

METAPSYCHOLOGY, 11. : derûn ramanzanî.

METASOMATIC, *ndj.* : guhorîna kanî yan
metalî.

METASTABLE, *adj.* : nîvhedar.

METASTASIS, *n.* : belavbûn.

METASTASIZE, *vi.* : belav bûn. METATARSAL,

n., adj. : şehê pêyî. METATARSUS, 11. : şehê
pê. METATHETIC(AL), *adj.* : guhorînî.

METATHESIS, *n.* : guhorîn (dir yan bar).

META THORAX, *n.* : paşsing.

META ZOA, *n. pl.* : canewerên zehfxane.

METAZOAN, *n., adj.* : canewerek zehfxane.

METE, *n.* : rade.

METE, *vt.* : belav kirin (beş). **METEMPIRIC(S),**

n. : jîrzaniya heyberên derveyî serhatiyân.

METEM PSYCHOSIS, *n.* : paşkoçkirin.

METENCEPHALIC, *adj.* : paşmejiyî.

METENCEPHALON, *n.* : paşmejî.

METENCEPHALOUS, *adj.* : paşmejiyî.

METEOR, *n.* : şolik, nêze, tîrêjstêr.

METEORIC, *adi.* : nêzeyî.

METEORICALLY, *adv.* : bi nêzeyî, nêzekî.

METEORITE, *n.* : stêra rijyar, nêze.

METEORITICS, *II.* : nêzezanî. **METEOROGRAPH, *n.***
: alavka tomarkirina diyardeyên banimayî.

METEOROGRAPHIC, *adj.* : pêwendîdarê alavka tomarkirina diyardeyên banimayî.

METEOROID, *n.* : nêzeyya gerok (li dor rojê).

METEOROLOGIC(AL), *adi.* : banimayî.

• **AIRCRAFT** : balafira banimayê.

METEOROLOGIST, *n.* : banimazan.

METEOROLOGY, *n.* : banimayîzanî, keş zanî.

METER OR METRE, *n.* : metir, pira metrî.

METHACRYLATE, *n.* : xwêya tîrşiya mê takrîfik.

METHADONE, *n.* : derman ek hedarker.

METHAMPHETAMINE, *n.* : dermanek çalakker.

METHANE, *n.* : mitên : gaza zong, çal û komiran.

METHANOL, *n.* : mêthanol : avekiyek alkuholî gurîbar û jehr e.

METHEDRINE, *n.* : dermanê çalakkerê hîdroklorîkî.

METHEGLIN, *n.* : şeraba hingvîniya dermankirî yan beharatkirî.

METHEMOGLOBINE, *n.* : pêkhatiya oksijen û gilomobîn.

METHANAMINE, *n.* : qijilandarê tîrşiya mîzî.

METHIONINE, *II.* : tîrşiyek emînî ye. **METHOD, *n.***
: rêbaz, awa, cor, şêwe, çitoyî, şêwaz, loke, teher, reftar, rewîşt, rewşek.

METHODIC, (*ldi.*) : melhezeyî, rêzikî.

METHODICAL, *adi.* : rêzikî, pêrewî, melhezeyî,

METHODICALLY, *adv.* : bi rêzikî, melhezekî.

METHODICALNESS, *n.* : rêzikîfî.

METHODISM, *II.* : dêr û tîre ya mêtodîya încîlî.

METHODIST, *n.* : endamê tîreya mêtodîya filehî, melhezeyî.

METHODISTIC, *adi.* : melhezeyî.

METHODIZE, *vt.* : melheze kirin, rêbaz kirin.

METHODIZED, *adi.* : melhezekirî, rêbazîkirî.

METHODIZING, *II.* : melhezekirin, rêbazîkinn.

METHODOLOGY, *II.* : melhezezanî. **METHUSELAH, *n.*** : oldarek berî Nûh pêxemberî.

METHYL, *n.* : riha hîdrokarbona alkuholî (spîrto ya darî), metîl.

METHYLAL, *II.* : pêkhatiyek avekî ye (bo nivandinê), metîlal.

METHYLAMINE, *II.* : gazek teqemenî û gurîbar e, metîlamîn.

METHYLATE, *n., vt.* : pêkhatiyek mêtanolî ye, mêtanol kirin, metîlat.

METHYLATED SPIRIT, *n.* : alkuhola mêtanolkirî : bo ronahîkirin û germkirinê.

METHYLENE, *n.* : rihek hîdrokarbonî du hevtayî: metîlen.

METIC, *n.* : biyanî.

- METICULOUS, *adj.* : mîçink.
- METIER, *n.* : pîşe, pîşe gerî.
- METIS, *n.* : zarokê mirovê spî fl hindokê sor.
- METOL, *n.* : toza derhînanana filman. METONIC, *adj.* (~ cycle) : demê 19 salan (235 heyv) ko hemî guhorînên heyvê diyar dikit.
- METONYM, *n.* : bêjeya berdêl. METONYMICAL, *adj.* : pêwendîdarê bêjeya berdêlî.
- METONYMY, *n.* : bêje berdêlî.
- METOPE, *n.* : vekirina ko du baran cuda dikit.
- METOPON, *n.* : dermanek tezînî morfînî ye.
- METRAZOL, *n.* : dermane bo çalakkirina dilî û pişî.
- METRE, *n.* : metir, metre: yekeya dirêjîyê (sed sentîmetre).
- METRIC, *adj.* : metrî.
- METRIC(AL), *adj.* : hevrist, pivayî, hunandî.
- METRIC HUNDRED WEIGHT, *n.* : yeke ya kêşanê (pêncî kîlogram e).
- METRICS, *n.* : helbestzanî.
- METRIST, *n.* : rêzik, şehrezayê pîvanên helbestê (helbestzan).
- METRITIS, *n.* : kulbûna malbiçûkî (pizdankî).
- METRO, *n.* : mêtro : hev kêşa jêrerdî,
- METROLOGY, *n.* : pîvanzanî, rêzika pîvan û kêşanê.
- METRONOME, *n.* : alava dem gira awazan.
- METROPOLIS, *n.* : bajar yan welatê serekî, serbajêr, paytext, metranxane.
- METROPOLJTAN, *n.*, *adj.* : metran, pay textî, (serbajêrî,
- METRORRHAGIA, *n.* : xwîn verestina malbiçûkî, riskîna malbiçûkîtpizdankî).
- METTLE, *n.* : aram, mad, çalakî.
- ON ONE'S - : hand ayî da ko hindî bişêt bikit.
- METTLED, *adj.* : çalak, çeleng.
- MEW, *n.* : mewjandin, miyewmîyew (dengê kitikê).
- MEWL, *vi.* : giryan (girîn) (wek biçûkî).
- MEWS, *ll.* : çend axûr yan afirên girûvirên li meydanke vekirî.
- MEXICAN HAIRLESS, *n.* : Meksîkiyê bêmû (seyek biçûk kêmmû ye).
- MEZEREON, *n.* : helezek erxiwanî ye.
- MEZZANINE, *n.* : qat yan nihûma navîn, tilarê jêrî.
- MEZZO FORTE, *adj*; *adv.*: bilind (navîn).
- RELIEVO : neqşenavîn, neqşê navê derketî.
- MEZZOTINT, *n.* : neqşkirina sihkîrîtrêbazek neqşkirinê îtalî ye).
- MHO, *n.* : yekeya gehînbariya kehrebî ye.
- MI^(oh) *pref.* : pêşgir e ko kêmtir e, biçûktir e.
- MIAOW, *n.* : mewjandin, miyewmîyew.
- MIASMA, *n.* : genîtiya hilmê.
- MIASMAL, *adj.* : hilmgeniyî.
- MICA, *n.* : madeyek nivûşeyî ye (bo cudakirinê).
- MICAWSER, *n.* : tembelmîrov.
- MICE, *n.* (*pl.* of mouse) : mişk.
- MICELLE, *n.* : leşikê kehrebkirî di nav madeyek nîv şîrêzî de.
- MICK, *n.* : (*sl.*, *DERG.*): Îrlendî (kirêtkirinî).
- MICK(E)Y, (*si.*) (TO TAKE THE - OUT OF) : tirane kirin.
- MICKLE, MUCKLE, *n.*, *adj.* (*arch.*) : gelek.
- MICRO, *adj.* = MICROSCOPIC.

MICRO-*pref.* : pêşgir e ko hûr e, biçûk e.
 MICROBAROGRAPH, *n.* : pestapîvê biçûk.
 MICROBE, *n.* : mîkrob, xore, dirm. MICROBIC,
ndj. : mîkrobî, dirmî.
 MICROBIAL, *ndj.* : mîkrobî, dirmî. MICROBICIDE,
 11. : mîkrobkuj. MICROBIOLOGY, 11. :
 hûrzindewerzanî,
 mîkrobiyoloji.
 MICROCLIMATE, *n.* : keş yan banima ya deverî.
 MICROCLINE, *n.* : maykroklayn : texlîtek kane.

 MICROCOPY, 11. : rûnivîsa biçûk. MICROCOSM, *n.* :
 gerdûna biçûk, mirov. MICROCRYSTALLINE, 11. :
 hûrbelûrî, MICROCYTE, *n.* : hûrtopel,
 MICROEVOLUTION, 11. : hû rguhorîn. MICROFILM,
n., oi., t. : hûrfilm (filmik),
 filmik kirin.

 MICROGAMETE, *n.* : hûrzayende. MICROGRAM, 11. :
 yek ji milyon giramê, mîkrogram.
 MICROGRAPHY, *n.* : sehkirina hûrbînî,
 derhinana wêneyî.
 MICROGROOVE, *n.* : hurkels.
 MICROMETEORITE, *n.* : hûr nêze.
 MICROMETER, *n.* : hûrpîv.
 - CALIPER : hûrstûrpîv.
 MICROMETRY, *n.* : hûrpîvî.
 MICROMICRON, *n.* : yek ji milyon mîkronî.
 MICRON, *n.* : yek ji hezar milîmetrê,
 mîkron.
 MICRONIZE, *vt.* : hûr kirin.
 MICRO-ORGANISM, *n.* : hûrzindî.
 MICROPALEONTOLOGY, *n.* : hûrkevneberdî-
 nezanî.

MICROPARASITE, *n.* : hûrmişexwer. MICROPHONE,
n. : dengkêş, dengweş, mîkrofon.

 MICROPHOTOGRAPH, *n.* : hûrwêne.
 MICROPRINT, 11. : hûrçap.
 MICROPROJECTOR, 11. : hûrarastek : bo havêtina
 wêneyê mezinkirî li ser perdeyê.
 MICROPYLE, 11. : kunik.
 MICRORADIOGRAPH, 11. : hûrwêneyê tîrêjî.
 MICROREADER, 11. : hûrxwendeyar. MICROSCOPE,
n. : hûrbîn.
 MICROSCOPIC(AL), *adj.* : hûrbînî. MICROSCOPY, 11. :
 hûrbînkarî. MICROSECOND, 11. : yek ji milyon
 çirkeyî. MICROSEISM, *n.* : lerzik yan lerzek
 (hûr-
 lerze).
 MICROSOME, *n.* : mîkrosom, libek (hûrek) ji
 protoplazme.
 MICROSPOROPHYLL, *n.* : tovbelg. MICROSTRUCTURE,
n. : hûrbinyat (yan
 avahî).
 MICROWAVE, 11. : hûrpêl,
 MICTURATE, *vi.* : mîztin, mîz kirin.
 MICTURITION, *n.* : mîzkirin, destav. MID,
ndj., prep. : nîv, navîn.
 MIDAS, *n.* ~ touch : şiyana destveîmana para.
 MIDBRAIN, *n.* : nîvê mejî.
 MIDDAY, *n.* : nîvto.
 - MEAL : firavîn.
 MIDDEN, *n.* : gûfik, gllmik, koma rîxê. MIDDLE,
 11., *adj.* : navincî, nawend, navî, nav, navîn,
 nîvanî, nîvek, nîvnîve, nîvî, navber,
 navrêz.
 • AGE : navîna jî, kalî, nîvîncayî, pîrî.

- **AGED** : reşkal, navsere, nîvîncî, nawerastî temen.
- **CLASS** : çîna navîn, çînî nawerast, pî. -
- DISTANCE** : pêşbeziya navîn (400-1500 metir),
- **EAST** : rojhelata navîn.
- **FINGER** : navçar, tîla navîn, dolî demkêş.
- **MAN** : kostek, miyankar.
- **TERM** : radeyê navîn.
- **WAVE** : pêla navîn.
- **WEIGHT** : navîkêşkulmbazi).

MIDDLE AGES, *n.* : sedên navîn (*ji sale 500 p.z. ta 1500 p.z.*),

MIDDLEBREAKER OR MIDDLE BUSTER, *II.* : gêsin, gasin, hevcar, (cot).

MIDDELBROW, *II., adj.* : rewşenbîrê navîn (çandonavîn).

MIDDLE ENGLISH, *n.* : îngliziya navîn : zimanê înglîzî yê nivîsî ji seda 12 ta seda 16.

MIDDLE FRENCH, *II.* : frensiya navîn : zimanê frensî yê nivîsî ji seda 14 ta seda 16.

MIDLING, *II., adj.* : navîncî, asayî.

MIDDORSAL, *adj.* : nîvpiştî,

MIDDY, *n.* : sedvanyarê deryayî.

MIDGE, *n.* : mêşk.

MIDGET, *adj.* : quto, rîwele.

MIDI, *n.* : kirasê dirêjê navî.

MIDIRON, *n.* : şînkê asin.

MIDLAND, *n., ndj.* : navîna welatî.

MIDMOST, *adj., ado., n.* : navîncî, nîvî.

MIDNIGHT, *n.* : nîva şevê, nîvşev.

- **SUN** : roja nîvşevê.

MIDNIGHTLY, *adv.* : nîvşevî, nîvşevîkî.

MIDNOON, *n.* : nîvro.

MIDPOINT, *II.* : xalka navîn yan nîvê. **MIDRIB**, *n.* : lanavî (belgê helezê).

MIDRIFF, *II.* : perdeya navbirê, parxan, parhan, pincik.

MIDSECTION, *II.* : beşê navîn. **MIDSHIPMAN**, *n.* : sedvanyarê deryayî. **MIDST**, *n., prep.* : nav, di nav de. **MIDSUMMER**, *n.* : nîva havînê.

- **DAY** : 24 hizêranê (roja nîva havînê).

- **MADNESS** : dîna tiya temam.

MIDWAY, *n.* : nîveka rê.

MIDWEEK, *n.*, (*ndj.* : nîv heftî.

MIDWEEKLY, *ndj.* : li nîv heftiyê, nîv hef tîkî.

MIDWEST, *n., adj.* : rojavaya navî.

MIDWIFE, *n.* : dapîr, maman, marnano.

MIDWIFERY, *II.* : da pîrî, dapirzanî, mamanî.

MIDWINTER, *n.* : nîva zivistanê.

MIDYEAR, *II.* : nîva salê.

MIEN, *n.* : rûxsar, bejnûbal.

MIFF, *n.* : bêzarî.

MIFF, *vt. i.* : bêzar kirin.

MIGHT, *n.* : hêz, zordestî, zora yî, pergal.

MIGHT, *p. OF MAY* : belko, ma çi ye. **MIGHTILY**, *adv.* : bi hêzdarî, gelek, hêzdar-kî.

MIGHTINESS, *II.* : zorbazî, hêzdarî. **MIGHTY**, *adj., ado.* : zil, zorbaz, hêzdar, koto, kote.

MIGRAINE, *n.* : şequeser, nîvserêşî.

MIGRANT, *II., adj.* : koçer.

MIGRATE, *vi.* : koçer bûn, mişext bûn.

MIGRATED, *adj.* : koçerkirî, mişextbûyî.

MIGRATING, *n.* : koçer kirin, koçerî, koç, mişextbûn.

MIGRATION, *n.* : koç, koçerî, barkirin, vekoçandin.

MIGRATOR, *n.* : koçer.

MIGRATORY, *adj.* : rewend.

MIKADO, *n.* : qiralê Japonî.

MIKE, *n., vi.* (si.) : tembel, tembelî kirin.

MIKE, *n.* (COLLOQ) = MICROPHONE.

MIKE, *n., Sl.* = MICK: FOR THE LOVE OF MIKE, FOR HEAVEN'S SAKE : bo xatra Xudê.

MILADY, *n.* : jina inglîz ya xanedan.

MILAGE, *n.* = MILEAGE.

MILCH, *ll.* : şîrde.

MILD, *adj.* : nerm, fênik, niyan, destvîlk.

MILDEN, *vt.i.* : nerm kirin (polayî). **MILDEW**,

vt.i. : jeng, jengar, genî, kufik. **MILDEWY**,

adj. : genî, kufîkbûyî,

MILDLY, *adv.* : nermîkî.

MILDNESS, *n.* : nermîfî, destvîlkî.

MILE, *n.* : mil: yekeya dirêjîyê : 5280 pê, 1760 yard. .

· **POST**: nîşaneyê milî,

· **STONE** : nîşane.

MILEAGE, *ll.* : dirêjî bi milano

MILFOIL, *n.* : hezar belg.

MILIARIA, *n.* : garisîfî : kulbûna çermî **li** gel xurîn û xwehdanê.

MILIARY, *adj.* : garisî : pêwendîdarê nesaxiya garisîtiyê ye.

MILIEU, *n.* : dorûber, jîngeh.

MELILOT, *ll.* : kinêr.

MILITANCY, *n.* : şerkarî, şerdarî, xebatkarrî, bizavkarî.

MILITANT, *adj.* : şerkar, şerdar, koşa.

MILITANTLY, *adv.* : bi serkarî, şerkarkî.

MILITARILY, *adv.* : bi leşkerî, leskerkî.

MILITARISM, *ll.* : leşkerîfî.

MILITARIST, *ll.* : leşkerîikar), serbaz.

MILITARISTIC, *ndj.* : leşkerîikarî).

MILITARIZATION, *n.* : leşkerîkirin, sûpahîkirin.

MILITARIZE, *vt.* : leşkerî kirin, sûpahî kirin.

MILITARIZE, *ndj.* : leşkerîkirî, sûpahîkirî.

MILITARIZING, *ll.* : leşkerîkirin, sûpahîkirin.

MILITARY, *ll., ndj.* : leşkerî, sûpahî, cengî, serbazî.

· **ARMOUR** : çekbend.

· **COURT** : dadgeha leşkerî.

· **SERVICE** : leşkerî, xizmeta serbazî.

MILITATE, *vi.* : xebitîn, bizav kirin, kartêkirin.

MILITATED, *adj.* : kartêkirî, bizavkirî.

MILITATING, *n.* : kartêkirin, bizav kirin.

MILITIA, *ll.* : leşkerê nerêzikî : milîs.

· **MAN**: şerkerê nerêzikî.

